

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Tahir BAŞARAN**

**SÖZLÜ ANLATILARDA BEHLÛL TİPİ**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2018**

**T.C.**  
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Tahir BAŞARAN**

**SÖZLÜ ANLATILARDA BEHLÛL TİPİ**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**

**Yrd. Doç. Dr. Nevin TURAN**

**MUŞ-2018**

**K.T.**  
**ZANÎNGEHA MUŞ ALPARSLAN**  
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Tahir BAŞARAN**

**DI VEGOTINÊN DEVKÎ DE TÎPÊ BEHLÛL**

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBERA TEZÊ**

**Alk. Doç. Dr. Nevin TURAN**

**MUŞ-2018**

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Sözlü Anlatılarda Behlül Tipi” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

Tezimin sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Tezimin 05 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, dönem projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

23.01.2018

  
Tahir BAŞARAN

**TEZ KABUL TUTANAĐI**  
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĐÜNE**

Yrd. Doç. Dr. Nevin TURAN danışmanlığında Tahir BAŞARAN tarafından hazırlanan bu çalışma 29/12/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan : Yrd. Doç. Dr. Canser KARDAŞ

İmza : .....

Jüri Üyesi : Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN

İmza : .....

Jüri Üyesi : Yrd. Doç. Dr. Nevin TURAN

İmza : .....

## NAVEROK

NAVEROK .....	I
ÖZET.....	III
ABSTRACT .....	V
KURTE .....	VII
PÊŞGOTIN .....	IX
KURTEBÊJE .....	XI
DESTPÊK .....	1
Çarçoveya Giştî .....	1
Rêbaz .....	2
Çavkanî .....	3

## BEŞA YEKEM

### PÊNASE Û ÇARÇOVE

1.1. PÊKENOK DI NAV CUREYÊN EDEBÎ DE .....	5
1.2. BERHEVKIRINA PÊKENOK Û ÇÎROKAN .....	6
1.3. TÎP .....	7
1.4. LI GORÎ ÇAVKANIYÊN NIVÎSKÎ KESEYATA BEHLÛL .....	11

## BEŞA DUYEM

### NIRXANDINA TEŞEYÎ YA VEGOTINÊN DEVKÎ

2.1. LEHENGÊN PÊKENOKÊN BEHLÛL .....	14
2.1.1. Lehengên Baş: .....	14
2.1.2. Lehengên Nebaş: .....	14
2.1.3. Lehengên Lêqewimî û Yên Din.....	15
2.2. DEMA PÊKENOKÊN BEHLÛL .....	15
2.3. MEKANÊN PÊKENOKÊN BEHLÛL .....	15

**2.4. MIJARÊN PÊKENOKÊN BEHLÛL..... 16**

**2.5. TAYBETIYÊN PÊKENOKÊN TÎPA BEHLÛL ..... 17**

**BEŞA SÊYEM**

**NIRXANDINA GIŞTÎ**

**3.1. NIRXANDINA NAVEROKA PÊKENOKÊN BEHLÛL ..... 19**

**3.2. TÊKILIYA TÎPA BEHLÛL Û ÇANDA ÎSLAMÎ ..... 23**

**3.3. LI GORÎ VEGOTINÊN DEVKÎ KESAYETA BEHLÛL..... 28**

**3.4. BEHLÛL ÇIMA XWE LI DÎNÎTIYÊ DANIYE?..... 30**

**ENCAM..... 32**

**PÊVEK 2..... 39**

**ÖZGEÇMİŞ..... 79**

**KURTEJIYAN ..... 80**

**ÖZET**  
**YÜKSEK LİSANS TEZİ**  
**SÖZLÜ ANLATILARDA BEHLÛL TİPİ**

**Tahir BAŞARAN**

**Tez Danışmanı: Yrd. Doç. Dr. Nevin TURAN**

**2018, 95 Sayfa**

Bu çalışmanın konusu “Sözlü Anlatılarda Behlûl Tipi”dir. Behlûl tipinin özelliklerini tespit etmek amacıyla Batman, Mardin, Diyarbakır, Siirt, Şırnak şehirlerinden sözlü anlatılar toplandı. Çalışmamız, Batman yöresinden derlenen bu sözlü anlatıların örnekliği ile Behlûl-i Diwane'nin bir halk tipi olduğunu göstermeye çalışmaktadır.

Kürtçe'nin Kurmanci lehçesiyle derlenen ve çoğunluğu fıkra türünde olan bu sözlü anlatıların teknolojik araçlar yoluyla ses kaydı yapıldı, ardından da yazıya geçirildi. Anlatıların yazıya geçirilmesinde herhangi bir yerin ağız standart alınmadı. Yani anlatılar, anlatıcıların ağızından duyulduğu gibi yazıya geçirildi. Dolayısıyla yerel olan ve anlamları yaygın bir şekilde bilinmeyen bazı kelimelerin anlamı ve daha iyi anlaşılması için eklediğimiz kelimeler köşeli parantez içinde verildi.

Derlediğimiz sözlü anlatıların değerlendirilmesi sonucunda, Behlûl'ün bir halk tipi olduğunu net bir şekilde gördük. Çünkü bütün anlatıların merkezinde daima Behlûl var. Onun bütün tavır ve hareketleri halkın istek ve umutları etrafında şekilleniyor. Behlûl sabit karakterlidir, şahsi menfaatlere göre tavrı değişmez. Daima toplumsal tarafla ortaya çıkmaktadır.

Behlûl tipine bağlı fıkralar her tarafta az çok bulunur. Çünkü toplum/halk; toplumsal kuralları, istekleri, umut, eleştiri ve itirazlarını Behlûl tipi üzerinden göstermektedir. Halk doğrudan söyleyemediği/söylemeye korktuğu şeyleri de Behlûl tipi üzerinden söylemekte ve onu bir kahraman gibi güç sahiplerinin karşısına çıkarmaktadır. Behlûl de etrafındakilerin ihtiyaçlarına cevap verip, imkânları doğrultusunda sorunlara çözüm bulmaktadır.



Behlûl tipi, toplumun umut ve ihtiyaçlarının gösterilmesidir. Toplum veya topluluk kendi yaşam şartlarından bir halk tipini ortaya çıkarır ve bununla kendini ifade eder. Toplum/halk “Divane Behlûl”ün ağızından üyelerini uyarıyor, onların sorunlarını çözüyor, idareci ve iktidarlara karşı onları koruyor. Bu bakımdan sözlü anlatılar, toplumun kendini koruma isteğinin birer ürünüdür.

**Aanahtar Kelimeler:** Sözlü anlatılar, Behlûl, Tip

**ABSTRACT**  
**MASTER'S THESIS**  
**BEHLÛL TYPE IN ORAL STATEMENTS**

**Tahir BAŞARAN**

**Advisor: Assoc. Prof. Dr. Nevin TURAN**

**2018, Page: 95**

The subject of this study is "Behlûl Type in Verbal Expressions". In order to determine the characteristics of the Behlûl type, Verbal Explanations were collected from Batman, Mardin, Diyarbakir, Siirt and Sirnak. This study has tried to show that Behlul-i Diwane is a public type by sampling of oral statements.

Voice recordings were made of these verbal explanations, most of which having been compiled with Kurmanci dialect of Kurdish and most of which were in the form of jokes thanks to technological devices and then were written down. Accents from any place were not taken as a standart when they were written. In other words, then arrators were put into writing as they were heard in the mouth of the narrators. Therefore, the meanings of certain words that are local and whose meaning is not widely known are given in square brackets to be understood better.

As a result of the evaluation of the verbal accounts we have comprehended, we have compiled, we have dearly seen that Behlûl is a public type. Because there is always Behlul in the center of all the accounts. All his attitudes and actions are shaped around the wishes and hopes of the people. Behlul is a fixed character and his attitude does not change according to personal interests. He always comes out on the socialside.

As a result, we have found that Behlûl jokes are found more or less on all sides. Again we see that society/people show social rules, desires, hopes, criticisms and objections via Behlûl type. People are telling things that they are afraid to say/not to say directly through the type of Behlûl, and bring it into the hands of power-holders like a hero. Behlul responds to the needs of those around him and finds solutions to the problems in his possibilities.

Behlul type that the hope and needs of society are being shown. Society or community reveals a type of people from their living conditions and expresses itself with it. Society/people warn their members from the mouth of "Divane Behlûl", solve their problems, protect them against administrators and rules. In this respect, verbal explanations are product of society's desire to protect itself.

**Key Words:** Verbal explanations, Behlul, Type

**KURTE**  
**TEZA MASTIRÊ**  
**TÎPA BEHLÛL DI VEGOTINÊN DEVKÎ DE**  
**BAŞARAN, Tahir**  
**Şêwirmend: Alk. Doç. Dr. Nevin TURAN**  
**2018, 95 Rûpel**

Mijara vê xebatê “Di Vegotinên Devkî de Tîpa Behlûl” e. Bi mebesta tespîtkirina taybetiyên tîpa Behlûl ji bajarên Batman, Mêrdîn, Diyarbekir, Sêrt û Şîrnexê vegotinên devkî hatine tomarkirin. Ev xebat hewl dide ku bi mînaktiya vegotinên devkî yê ji dora Batmanê piştrast bike ku Behlûlê Dîwane tîpeke gelêrî ye.

Ev vegotinên ku bi kurdiya kurmancî hatine tomarkirin, pirraniya wan pêkenok in. Ev pêkenok wek deng bi riya amûrên teknolojîk hatine qeyd kirin û paşî hatine nivîsandin. Di nivîsandina vegotinan de devoka deverekê wek standart nehatiye girtin. Ango vegotin, ji devê bêjeran çawa hatibin gotin, bi wî awayî hatine nivîsandin. Lewma wateya hinek peyvên ku deverî ne, zêde nayêne zanîn û gotinên ku ji bo metin baş were fahmkirin me li metnê zêdekirine di nava kevaneka çargoşe de hatine dayîn.

Di encama nirxandina vegotinên devkî ku me tomar kirine de, bi awayekî zelal me dît ku Behlûl tîpekî gelêrî ye. Lewra di nîvenda hemû vegotinan de Behlûl heye, hemû helwest û tevgerên wî li dora hêvî û daxwazên xelkê teşe digrin. Xisleta Behlûl sabît e, helwesta wî li gorî menfeata şexsî naguhere. Her car bi aliyê xwe yê civakî derdikeve holê.

Pêkenokên girêdayî tîpa Behlûl kêr zêde li hemû deveran peyda dibin. Lewra gel (xelk); qaîdeyên civakî, daxwaz, hêvî, rexne û nerazîbûnên xwe bi riya tîpa Behlûl dinimîne. Tiştên ku gel nikare/newêre rasterast bibêje jî li ser navê Behlûl vedibêje û Behlûl weke lehengekî derdixe pêşberî kesên xwedîhêz. Behlûl jî bersiva hewcehiyên derûdorên xwe dide û li gorî derfetên xwe pirsgirêkan çareser dike.

Tîpa Behlûl nimandina hêvî û hewcehiyên civakê ye. Civak an jî civat ji nav şert û mercên xwe yê civakî tîpekî gelêrî diafirîne û bi vê riyê xwe îfade dike. Civak/gel, ji devê Behlûlê Dîwane, endamên xwe hişyar dike, pirsgirêkên endamên xwe çareser dike,

li dijî birêveber û îqtîdaran endamên xwe diparêze. Di vê çarçoveyê de vegotinên devkî berhemên daxwaza xweparastina civakê ne.

**Peyvên Sereke:** Vegotinên Devkî, Tîp, Behlûl

## PÊŞGOTIN

Bi gelemperî çand û edebiyata kurdiya kurmancî qadeke “bakîr” e, ango li serê têra xwe xebatên akademîk çênebûne. Li Tirkiyê dîroka xebat û lêkolînên kurdî yên akademîk nû ye û hejmara wan pir kêr e. Lewma ji bo pênasê û çarçoveya têgehên weke “tîp” û “pêkenok” me berê xwe daye xebatên bi zimanê tirkî. Pêkenokên li ser tîpa Behlûl ji hêla gelek kesan ve hatine tomarkirin, lêbelê xebateke ku bi riya pêkenokan bi awayekî berfireh tîpa Behlûl dinirxîne nehatiye kirin. Armanca vê xebatê ev e ku têgeha “tîp”ê û “Tîpa Behlûl” bide nasîn û ji bo xebatên li ser edebiyata kurdî rêçikekê veke.

Me di tomarkirina vegotinan de ji pêşketina amûr û derfetên teknolojîk îstîfade kir. Lê daxwaza qeydkirina deng, carinan ji alî bêjeran ve bû sedema fikaran. Hinek kesan jî digot “Min çîrokên li ser Behlûl bihîstine lê êdî nayêne bîra min”. Çend pêkenokên ku tenê beşek jê dihata bîra bêjeran an jî tê de tevahiyeke biwate tune bû, me nivîsandin. Wisa xuya ye ku pêkenokên li ser Behlûl jî ji ber ku di wext de nehatina tomarkirin/nivîsandin hatine jibîrkirin.

Bêjerên vegotinan gava ku diaxifn, carinan navê “Behlûl” bi awayekî kurt weke “Bahlûl, Balûl” bi lêv dikirin. Di hinek vegotinan de me tespît kir ku heman vebêjerî/ê carinan digot “Behlûl” carinan jî digot “Balûl”. Vebêjêr bi çî awayî vegotibe me jî wisa nivîsand. Me heman vegotin carinan li gelek ciyan peyde kir, lê heke cudahiyeke hêjayî di navbera wan de tune be; me yek ji wan nivîsand. Vegotinên ku binyada wan yek bû û cudahî di navbera wan de hebûn, me ew li pey hev rêz kirin. Vegotinên ku ji alî mijar û naverokê ve dişibiyane hevdu, me li pey hev nivîsandin. Li ser jêpîrsîna me tevahiya vebêjerên diyar dikir ku wan ev pêkenok ji pêşiyên xwe, li sohbet û civatan bihîstine.

Ji ber ku xebata me li ser tomarkirina vegotinên devkî bû, me bi gelek kesan re têkilî danî. Ji bo amadekirina vê xebatê di serî de ji şewirmenda vê xebatê Alk. Doç. Dr. Nevin Turan re, ji bo alîkariya wî ya di warê diyarkirina mijara vê tezê de ji Alk. Doç. Dr. Canser Kardaş re, ji bo alîkariya wî ya di warê rastnivîsê de ji Semih Gezer re, ji bo peydekirina vegotinên devkî hevalên min ji İslam Başaran, M. Emin Dayan, Şükrü Özen, Servet Mağrur, İlhan Acun, Kerem Kartal, Nihat Önür, Veysi Başaran û Kasım Şimşek re spas dikim. Bêjerên vegotinan Medine Yiğiter, İsmet Başaran, Muhittin Demirtaş, Şerif Hamarat, Halil Dayan, M. Şakir Demir, Hasan Koyun, Habip Sevim, Veysi Başaran, Salih Gültekin, Musa Güneş, Nezir Kılınç, Cüneyt Boğadır, Halil

Doyar, Engin Kavak, Davut Bařaran, Emin Demir, Reřat Bayat, Mahfuz Nazar, Nusret Doęan re jî her spasdar im.

**MÛŞ-2018**

**Tahir BAŞARAN**

## **KURTEBÊJE**

bnr.	:	Binêrin
C.	:	Cild
hwd.	:	Herwihayên din
jmr.	:	Jimar
m.	:	Mirin
r.	:	Rûpel
s.	:	Sayfa (rûpel)
tr.	:	Tirkî
vd.	:	Ve diğêrleri (û yêr din)
vgz	:	Veguhêzer



## DESTPÊK

### Çarçoveya Giştî

Behlûlê Dîwane/Dana ku ji çanda rojhilat tîpekî gelêrî ye, têra xwe berbelav e. Ji xebatên nivîskî ku ji tomarkirina pêkenokên tîpa Behlûl pêk tên, tê fêhmkirin ku henek û pêkenokên Behlûl li nav kurd, ereb, faris û tirkan têne gotin û têra xwe jî berbelav in.

Di nivenda metnên ku li ser bûyerekê ava dibin de leheng hene ku bi aliyê xwe yê civakî ve derdikivin pêş. Ev kesên ku xisleta van sabît e û helwesta wan li gorî merc û menfaetan naguhere wek “tîp” têne binavkirin. Tîp heke yeke/î qenc be, her car qenc e; heke neqenc be jî her car neqenc e. Helwesta tîpan li gorî şert û mercan naguhere. Di çanda rojhilat de lehengên bi vî awayî ne kêr in. Behlûlê Dîwane, Xoce Nesredîn, Cuha û Bektaşî çend kes ji van tîpên gelêrî ne.

Di esasê xwe de berhemên folklorê, ji dîroka miletan gelek tiştan dihewînin. Lewra di berhemên folklorê de hêvî, rexne, kêfxweşî, hişyarî û nerazîbûnên xelkê têne dîtîn. Yek ji van berhemên/rêbazan jî “tîpên gelêrî” ne. Di pêkenokên girêdayî tîpa Behlûl de jî heman rewş derbasdar e. Civaka/civata afirîner a vegotinên tîpa Behlûl; fikar, rexne, hişyarî û kêfxweşiyên xwe bi Behlûl dide gotin.

Li gorî vegotinên devkî Behlûl, kekê Harûnê Reşîd e, lê ji ber sebebên cuda xwe li dîniyê daniye. Ango di eslê xwe de Behlûl ne dîn e, ji zanayan zanatir e. Lewra gelek kes tên bi wî dişewirin, ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwe alîkariyê ji wî dixwazin.

Tîpa Behlûl mirovekî alîxweda ye. Her dem alîkariya kesên lêqewimî (mexdûr) dike û di çarçoveya derfetên xwe de nahêle ku neheqî bidome. Ew sembola kesên lêqewimî û hêza manewî ye. Li dijî hêza maddî (padîşah, wezîr, qazî) her dem serkeftî ye. Heskirina malê dinyayê di dilê wî de tune; lewra li gorî fikra tîpa Behlûl, jiyana dinyayê demkî ye.

Gelek tiştên ku dikarin di jiyana rojane de bêne dîtîn, bûne mijara pêkenokên tîpa Behlûl. Ji edakirina îbadetan heta bi têkiliyên navbera jin û mêran, ji parastina mafên kêmaran (tr. azınlık) heta qelsî û kêmasiyên mirovî gelek tişt wek mijarên vegotinên tîpa Behlûl derdikevin pêşberî me.

Ji ber ku hinek pêkenokên tîpa Behlûl, li ser tîpên weke Xoce Nesredîn û Bektaşî jî têne gotin; (her çiqas ku rasterast ne mijara xebata me ye jî) me ew vegotinên devkî ên xebata xwe û pêkenokên Xoce Nesredîn an jî Bektaşî berawirdî kirin. Me dît ku hin vegotinên hevpar hene. Ango pêkenokeke ku me tomar kiriye, di çavkaniyên nivîskî de ji bo Xoce Nesredîn an Bektaşî jî derbas dibe. Vê xalê bala lêkolînerên din jî kişandiye: “Li vê derê tişteki tenê bi awayê zelal dikare bête gotin, Behlûl kesayetek e” (Karataş, 1999b: 15). Di dewama nivîsê de Karataş, diyar dike ku ji bo polemîkên li ser karakterên dîrokî ji holê rabin; divê ev karakter ne wek kes (şexs), wek kesayet (şexsiyet) bêne fahmkirin (Karataş, 1999b: 15).

### **Rêbaz**

Binyad û esasê vê xebatê tomarkirin û nirxandina vegotinên devkî ye. Lewma me bi kurdiya kurmancî ji bajarên Batman, Mêrdîn, Sêrt, Diyarbekir û Şîrnexê vegotinên girêdayî tîpa Behlûl dane hev. Vegotinên ku me piraniya wan ji dora Batmanê bi dest xistin; pêşî wek deng qeyd kirin, paşî ji ber dangan nivîsandin.

Di nivîsandina agahiyên di heqê vebêjeran de, me cihê jidayikbûnê “welat” qebûl kir. Wek mînak Halil Dayan bi eslê xwe ji Sêrtê (Erûh) ye, lê bi salan li Şîrnexê dije; Muhittin Demirtaş bi eslê xwe ji Misircê (Kurtalan) ye, lê bi salan li Batmanê dije. Carinan me heman vegotin li çend ciyan peyda kir. Heke di navbera varyantên vegotinekê de ferqeke hêjayî tune be, me yek ji wan nivîsand. Wek mînak vegotina bi sernavê “Mala me ya heqîqî” ji bilî Veysi Başaran, me ji M. Şakir Demir û Medine Yiğiter jî guhdarî kir; lê ji ber ku ferq di navbera her sê vegotinan de tune bu me yek ji wan nivîsand.

Di hinek vegotinan de peyvên tirkî derbas dibûn: Boş, gerçekten, en îyîsî, balta, abê/î, rahatsız, devlet erkanî û hwd. Me ev peyv, weke ku ji devê vebêjeran bihîstine nivîsandin û wateya wan a kurmancî di nav kevaneka çargoşe de nivîsand.

Temenê pirraniya kesên ku me ji devê wan vegotin qeyd kirin di ser pêncî (50) re ye. Dîsa pirraniya van kesan di nav çanda medreseyan de mane û çend kes ji wan jî mela ne. Vegotinên bi vî awayî gelek caran, di sohbet û civatan de, ji aliyê melayan ve wek şîret têne bikaranîn. Ji ber ku di piraniya pêkenokan de fikareke îslamî heye, ev pêkenok bêhtir li bal seyda û melayan peyde dibin.

Ji bo çarçoveya têgehî jî me berê xwe da xebatên edebiyata tirkî. Agahiyên li ser kesayeta Behlûlê Dîwane û têgehên weke “tîp” û “pêkenok” ji xebatên nivîskî hatine girtin. Ji ber nezanîna zimanên erebî û farsî me ji çavkaniyên bi farsî û bi erebî sûd wernegirt.

Me agahiyên di heqê bêjeran de di tabloyê de destnîşan kirin. Di vê tabloyê de ji bo bêjeran nav û paşnav, sala jidayikbûnê, kar, welat, dema hevpeyvînê û cihê hevpeyvînê hate dayin. Lîsteya bêjerên vegotinan di tabloyê de li gorî sala jidayikbûnê hatiye rêz kirin. Heta ji destê me hat, me ji deverên cuda vegotinên devkî berhev kirin.

Vegotinên ku mijara wan yek e yan jî nêzîkî hev in, me li pey hev nivîsandin. Di nirxandina wan de me jimara vegotinê di nav kevanekê de nivîsand. Digel ku du lib bi kurdî, du lib jî bi tirkî çar pirtûk li ser pêkenokên tîpa Behlûl hene jî me, ji bo nirxandina tîpa Behlûl, ji xebatan nivîskî pêkenok bikar neanîn. Me-bi heman helwestê-jî gotarên Cemal Şingâr û Avdo Karataş jî vegotin negirtin.

Serenavên vegotinan li gorî mesaja xwe, ji aliyê me ve hatine diyarkirin û nivîsandin. Di diyarkirina sernavan de awayê pêşkeşkirina bêjeran jî me li ber çav girt. Hevokên ku ji xebatên kurmancî hatine wergirtin, me bi awayê îtalîk nivîsandin da ku were zanîn ev beş nehatine wergerandin.

### **Çavkanî**

Ji bilî bêjerên vegotinan ji bo kesayeta Behlûl û hinek têgehên me ji çavkaniyên nivîskî sûd wergirt.

Ronî War, vegotinên ku tomar kirine li gorî xwe nivîsandine<sup>1</sup> û bi navê “*Behlûlê Dîwane*” çap kirine. Ji vê xebatê me fahm kir ku hinek pêkenokên me tomar kirine Ronî War jî li dora Mêrdînê tomar kirine. Abdullah Niyazmend ku nivîskarekî Îranî ye vegotinên ku tomar kirine bi navê “*Henek û Çîrokên Şîrîn ên Behlûlê Dîwane*” çap kiriye. Ev pirtûk ji hêla Îzzet Çixsî ve bi bal kurmancî ve hatiye wergerandin. Niyazmend, bi şîroveya xwe ya di pêşgotina vê pirtûkê de nêrîna mezhebê şîayê ya di

---

<sup>1</sup> Me ev zanîn, bi riya medyaya civakî, wek peyamek ji Ronî War wergirt.

heqê Behlûl de nîşan dide. Ji bo diyarkirina nêrîna mezhebê şîa ya li ser Behlûlê Dana, me ji xebata Niyazmend sûd wergirt.

Di pirtûka Hayrettin İvgin a bi navê “*Deli Görünüşlü Akıllı Behlül Danende*” û ya Ebubekir Aytekin a bi navê “*Bilgin Divane Behlül Dana*” de li ser kesayeta Behlûl agahî hene. Di heqê kesayeta Behlûl de me, bi piranî ji van her du xebatan sûd wergirt.

Ji bo têgeha “tîp”ê me ji pirtûka Mehmet Kaplan a bi navê “*Türk Edebiyatı Üzerinde Araştırmalar-3/Tip Tahlilleri*”, ji bo têgeha pêkenokê jî ji pirtûka Dursun Yıldırım a bi navê “*Türk Edebiyatında Bektaşî Fıkraları*” û Pirtûka Xalid Sadinî ya bi navê “*Ji Kelepora Kurdi Pêkenok*” îstîfade kir.

Di xala şîbîn û wekhevîyên tîpên gelêrî ên li rojhilat de me ji gotara Hasan Çiftci, “*Klâsik İslam Edebiyatında Hiciv ve Mizah*”, ji ya Metin Akkuş “*Doğu Kültüründe Nasreddin Hoca Tipinin Benzerleri*” û ji ya Hilâl Kalkandelen “*Fars Edebiyatında Behlül Hikâyeleri*” îstîfade kir.

Ji bo tespîtîkirina şîbîn û wekhewîyên pêkenokên Tîpa Behlûl, Bektaşî û Xoce Nesredîn me ji pirtûka Fikret Türkmen “*Nasreddin Hoca Lâtifeleri -Seyyid Burhaneddin Çelebi Burhaniye Tercümesi-*”, ji ya M. Fuad Köprülü, “*Nasrettin Hoca*” û ji ya Dursun Yıldırım a bi navê “*Türk Edebiyatında Bektaşî Fıkraları*” îstîfade kir.

Avdo Karataş, du gotar bi navê “*İdil Folklorunda Behlül 1-2*” nivîsandine. Karataş, ji herêma Hezexê (tr. İdil) bi qasî bîst (20) lib vegotin li ser Behlûl tomar kirine û nirxandine. Ji ber ku xebata Karataş li nav kurdan hatibû çêkirin bêhtir bala me kişand<sup>2</sup>. Ji vê xebatê me fahm kir ku hinek vegotinên ku me ji dora Batman, Mêrdîn, Şirnex û Sêrtê tomar kirine li Hezexê jî peyda dibin. Cemal Şingâr jî bi navê “*Çîrokên Behlül Ji Herêma Botan (1)*” çend heb vegotin tomar kirine û di kovara Nûpeldayê de weşandine. Ji bo nirxandina tîpa Behlûl me ji van xebatan jî pêkenok negirtin.

---

<sup>2</sup> Avdo Karataş, diyar dike ku wî vegotin ji devê vebêjêran bi kurdî tomar kirine û paşî wergerandine tirkî (Karataş, 1999b: 14, 15).

## BEŞA YEKEM

### PÊNASE Û ÇARÇOVE

#### 1.1. PÊKENOK DI NAV CUREYÊN EDEBÎ DE

Lêkolînên li ser edebiyata kurdî jî nîşanî me didin ku navlêkirina cureyên edebî jî astekê pêş ketiye (bnr. Sadînî, 2012: 13,14). Di folklorê kurdî de yek ji peyvên ku herî zêde hatine bikaranîn jî bê gûman “çîrok” e. Gelek vegotinên devkî ku îro em wan weke “çîrok, pêkenok, çîvanok, destan, efsane” bi nav dikin, di çanda devkî de bi peyva “çîrok” ê belav bûne.

Pêkenok jî yek ji wan cureyan e ku bi navlêkirina çîrokê tê vegotin. Weke mînak: Çîrokên Behlûl (bnr. Şingâr, 2014; Niyazmend, 2012). Di lîteratura nûjen de ferqa çîrok û pêkenokê bi awayekî zelal hatiye destnîşankirin. Pirraniya vegotinên devkî ku me li ser Tîpa Behlûl tomar kirine di kategoriya pêkenokan de ne. Lewma jî hewcehî pê heye ku çarçoveya peyva “pêkenok” ê were destnîşan kirin.

Li ser navlêkirina û pênaseya pêkenokê lihevkirineke giştî tune ye. Ev cureya edebî weke “Pêkenî, pêkenok, pêkenîn, meselok, metelok, henek, qerf, gelte, letîfe, serpêhatî, nukte, anekdot, qisse û hwd.” hatiye binavkirin (Sadînî, 2012: 13). Yanî kesên ku pêkenok berhevkirine û di pirtûk û kovaran de veşandina, bi van navan veşandine. Ji ber ku van kesan heman perwerde nedîtine û saziyeke ziman a fermî jî tune ye ku li ser kurmancî xebatên zimanê standart bimeşîne, lêkoleran heman peyv bikar neaniye. Ligel ku di navlêkirinê vê cureya edebî de lihevkirineke giştî tune ye jî, “pêkenok, ji yê din pirtir bi kar hatiye” (Sadînî, 2012: 14).

Pêkenok, ew cureyê edebiyata gelêrî ye ku ji têkiliyên civakî pêk tê û bi awayê mîzahî dersekê dide xwîner û guhdaran. Bi taybetî di pêkenokên kevneşopî (Traditional anecdote) de, ligel peyama/dersa xwe, unsura pêkeniyê jî heye; lê armanca sereke ne kenandina e. Pêkenok bi gelemperî ji sê beşan pêk tê: Destpêk, geşedan û encam. Di beşa destpêkê de şayesandina mijar, dorhêl û lehengan têkirin. Di beşa geşedanê de lihevketinek (tr. çatışma) diqewime. Wek mînak lihevketina zilmê û edaletê, lihevketina başî û nebaşiyê. Di beşa dawî de jî ev lihevketin çareser dibe û xwîner/guhdar dersekê, peyamekê ji pêkenokê digre.

Afirandina pêkenokan bi destê civakê her dem didome. Saim Sakaoğlu ku pêkenokên kevneşopî (Traditional anecdote) û pêkenokên hemdem (Modern anecdote) ji hev cuda dike, diyar dike ku berê pêkenok ji bûyerên pêkhatî çêdibûn; lê îro civak, bêyî pêkhatina bûyerekê, pêkenokan lihev tîne (Sakaoğlu, 2013: 70).

Mijara pêkenokan; têkiliya mirovan a bi hev re û bi civakê re ye. Ti sinor li ber mijarên pêkenokan tune ye. Birêveberî, terbiyeya civakî, siyaset, bawerî, edalat û hwd. hemû tişt dikare bibe mijara pêkenokan. Di vê babetê de Xalid Sadinî wiha dibêje: *Pêkenok di kelepura Kurdî de li ser gelek babetên jiyane hatine gotin. Li ser rêveberan, şêxan, mamosteyan, dêûbavan, zarokan, jinan, mêran, eşîretan, serokeşîran, axa[ya]n, xulaman, şivanan, gavanan, karkeran, gundiyan, bajariyan, deveran û hwd. (2012: 15).* “Ev berhemên çandî ku encamên jiyana civakî ya miletan in, him kêfxweşker in him jî beralîker in” (Yücel, 1990: 14). Yanî civak, ji aliyekî ve kêfa endamên xwe tîne, ji aliyekî ve jî berê endamên xwe dide fikrekê, rexneyekê, peyamekê.

## **1.2. BERHEVKIRINA PÊKENOK û ÇÎROKAN**

Ji ber ku hin kes li şûna peyva “pêkenok (tr. Fıkra)” ê peyva “çîrok (tr. Masal)” ê bi kar tînin, hewcehî pê heye ku ferqa navbera wan were destnîşankirin. Şibîn û wekhevîyên çîrok û pêkenokan hene, lêbelê cudahiyên navbera wan jî gelek in. Ji alî şêwe (teşe), naverok û armancê ve dişibine hevdu. Him di pêkenokan de him jî di çîrokan de di kategoriyên zeman, mekân û lehengan (şexs) de nediyarî hene. Ji alî armancê ve jî pêkenok û çîrok dişibine hevdu. Di binyada wan de mîzaha gelêrî û rexne heye (Yıldırım, 2016: 50). Lê ev têrî nake ku em wan çîrok û pêkenokê yek cure bihesibînin.

Çîrok bi gelemperî li ser çend meseleyan ava dibe. Bûyer û şayesandin tê de zêde cih digrin. Hemû tişt bi dûr û dirêjî tê vegotin. Lewma jî kompozîsyona çîrokê mezin û berfirh e. Lê di pêkenokan de xwerûtî û kurtî esas e. Bi gotinên hindik gelek tişt têne gotin (Yıldırım, 2016: 48). Bi vê taybetiya xwe pêkenok dişibe gotinên pêşiyên jî.

Di çîrokan de tevlî şayesandin û şibandinan gotinên kilîşe<sup>3</sup> jî hene. Ev gotinên klîşe (formel) bi gelemperî di destpêk û dawiya çîrokan de têne bikaranîn. Lê ev yek ji bo pêkenokan ne derbasdar e (Yıldırım, 2016: 48).

Di çîrokan de hêmanên (unsur) xeyalî û fantastîk cihekî girîng digrin. Lê pêkenok bi taybetiyên xwe yên esasî ve rastbîn (realîst) in. Her pêkenokek li ser bûyer, helwest û fikrên ji jiyana civakê ava bûye. Bi vê taybetiyê pêkenok ji efsaneyan jî cihê dibe. Lewra di efsaneyan de jî hêmanên xeyalî zêde ne (Yıldırım, 2016: 49-50).

Di pêkenokan de axaftin cihekî girîng digre. Ji ber vê yekê em dikarin pêkenokê bişibînin berhemêke biçûk a şanoyê. Pêkenok, dişibe komediyeke gelêrî. Lê di çîrokan de ev taybetî tune ye (Yıldırım, 2016: 49). Li ser mijar û fikrên dînî û millî çîrok nayêne gotin. Mesaja çîrokan gerdûnî (cîhanşûmûl) ye. Lê ev qaîde ji pêkenokan ne derbasdar e.

Pêkenok bêhtir di civatên zilaman (mêr) de hatine gotin. Lê çîrok bêhtir ji alî pîrekan (jin) ve hatine gotin (Yıldırım, 2016: 73). Ev yek girêdayî rola jinê ye jî. Lewra di perwerdekirina zarokan de bêhtir çîrok têne bikaranîn û ev yek bi destê jinan tê pêkanîn<sup>4</sup>.

### 1.3. TÎP

Kesên ku di berhemên edebî de weke berdevkê komekê, civakekê têne dîtin û xisleta wan naguhere “tîp” têne binavkirin. Yanî heke tîp yeke/î qenc be, di hemû vegotinan de qenc e; heke neqenc be jî, di hemû vegotinan de neqenc e. Heke di vegotinekê de hişyar û çavvekirî be, di hemû vegotinan de bi vê taybetiyê ve derdikeve pêş. “Bi gotineke din tîp ew kes e ku di vegotinan de bi taybetiyên xwe yên neguher ve cih digre” (Sever, 2007: 29).

Taybetiya hevpar a pênaseyên tîpê, ev e ku xisleta tîpan naguhere. Mehmet Kaplan jî di heqê têgeha tîpê de wiha dibêje:

---

<sup>3</sup> Wek mînak: Hebû tune bû, ji Xwedê meztir (kes) tune bû.

<sup>4</sup> Yek jê ne tê de kesên ku me pêkenokên Behlûl ji devê wan qeyd kirin hemû zilam in.

“Di berhemên edebî yên weke destan, mesnewî, roman, kurteçîrok û şano de, ku binyada wan bûyer e, lehengekî sereke heye. Ev leheng bûyerê pêk tîne û bingeha berhemê teşkîl dike. Di destan û mesnewiyên berê de, bi gelemperî şexsên ku xisletên wan naguherin têne dîtin. Ev kesên ku em dikarin wan weke ‘tîp’ bi nav bikin, kesên hêsa û xisletsabît in” (Kaplan, 2016: 9).

Her medeniyet ji bo domandina xwe tîpên mirovan bi awayekî taybet çêdike. Ji bo vê yekê jî dezgehên edebî ava dike. Wek mînak di civaka koçerî de ev peywîr bi urf û adetan tê pêkanîn (Kaplan, 2016: 53). Ango em di urf adetan de nixrên civakê civakê dibînin. Jixwe tîp jî “Ji hêla nivîskar/vebêjer ve, ji bo ku awayê jiyana civakê, urf, adet û armançên civakê bêne fahmkirin, weke amûrekê tê pêşkeşkirin” (Sever, 2007: 29). Ji tîpan em fahm dikin ku civak ji çi helwestê hes dike, ji çi tevgeran aciz dibe.

Him di edebiyatê de him jî di jiyandê de ji bo ku tîpeke diyar karibe bidome, dive ji aliyê civakê ve hatibe îdealîzekirin. Tîp îfadekirina bêrîkirinekê ye. Lê ev bêrîkirin girêdayî şert û mercên civakê ye. Gava ku şert û merc diguherin, girêdayî vê yekê, tîpa reel û îdeal jî diguhere (Kaplan, 2016: 66). Her civak li gorî pêdiviyên xwe tîpên gelêrî diafirîne. Lewra “Tiştên ku tîpan diafirîne şert û mercên rastî (reel) ên civakê ne” (Kaplan, 2016: 55).

Çi di vegotinên devkî yên weke çîrok û pêkenokan de, çi jî di metnen edebiyata nûjen de tîpek, bi taybetiyên xwe ve çiqasî cuda be ewqasî navdar û berbelav in. Lewra “Di vegotinan de tîp çiqasî xwediyê taybetiyên xweser bin, çiqasî geş bin; ewqasî bandorê li xwîneran [û guhdaran] dikin” (Karataş, 2007: 485).

“Civak an jî takekes ku ji alî hêza maddî ve lewaz dibe, hêviya alîkariyê ji hêza manewî dike. Yên ku ji aliyê civakî ve di rewşa aciz de ne, bêhtir berê xwe didin hêzên manewî” (Kaplan, 2016: 62).

Hinek tîpên pêkenokan deverî ne, girêdayî herêmekê ne. Mesela li Tirkîyê “Tîpa Kayserîyî” yek ji wan e. Her çiqas li hemû deverên Tirkîyê belav bûbe jî “Tîpa Temel” jî, ji herêma Behra Reş e. Yanî tîpeke deverî ye. Lêbelê tîpên weke Behlûl ne bi wî awayî ne. Li çend dewletan, welatan belavbûyî ne.

Çiqas coxrafya fireh bibe, bi bandora taybetiyên herêmî, tîpa pêkenokê jî diguhere. Ev tê vê wateyê ku tîpên pêkenokan, di encama tîkiliyên çandî de, diguhere û



belav dibe. Lewma pêkenokên Ezop, Dîyojen û Arîsto ku pêkenokên serdema Roma-Bîzansê ne di nav pêkenokên Xoce Nesredîn de têne dîtin. Dîsa encama vê yekê ye ku pêkenokên Xoce Nesredîn dişibine tîpên pêkenokên frensîz û almanan (Akkuş, 2003: 57).

Di çanda rojhilat de taybetiyên tîpên pêkenokan gelekî dişibine hev. Ev tîp bi taybetiyên xwe ve meczub, mecnûn û dîwane ne; ji kesên aqilmend bi aqiltir in û xwediyê dînîtiyeke felsefî ne. Dirûvê wan dînik e lê kesên zîrek in. Piraniya van kesan ne xwediyê nasnameyeke diyar in, evsanewî ne. Di çanda îslamî de ev kes; Behlûl, Ebleh, Cuha/Cuhî, Bîrbal, Talhak, Ayaz, Xoce Nesredîn, Bektaşî û herwiha yên din in (Çiftci, 1998: 150).

Tîpên pêkenokan, ji gelek aliyan ve dişibine hevdu. Di navbera Behlûl, Cuha û Xoce Nesredîn de şibîn hene. Her sê tîp jî di vegotinên rojhilat de têne dîtin. Her sê tîp jî di heman coğrafyayê de bi têkiliyên hevşib hatine pêşkeşkirin. Cuha û Behlûl di heman demê (dema Ebasiyan) de bi heman cihî (Kûfe) ve têkildar in (Akkuş, 2003: 61).

Carinan pêkenokeke ku li ser Xoce Nesredîn tê gotin; li ser Behlûl jî, li ser Bektaşî jî tê gotin. Wek mînak pêkenoka “Bixwe kurkê min bixwe” (jmr. 44 ) li ser Xoce Nesredîn jî tê gotin. Dîsa pêkenoka “Tu zanî ku ez mirime, tu tê kerê min dixwî” (jmr. 42) li ser Xoce Nesredîn jî tê gotin (bnr. Türkmen, 2013: 101). Pêkenoka “Xwe li hêstirên kerwaniyan nekin reş” (jmr. 61) bi navê “Hêstirên Fincanciyan” li ser Xoce Nesredîn jî tê gotin (bnr. Köprülü, 2004: 29-31). Pêkenoka “Ez xwarziyê Xwedê me” (jmr. 52) dişibe pêkenoka Bektaşî ku bi sernavê “Mêvanê Xwedê” tê gotin (bnr. Yıldırım, 2016: 226). Ev yek tê vê wateyê ku pêkenokek, di nav salan de li herêmên cuda di nav millet û gelên cuda de belav bûye; li welatên cuda li ser navê kesên cuda hatiye vegotin. Ji ber ku di pêkenokan de tiştê girîng ders û peyam e, navê lehengan zêde dernakeve pêş. Pêkenok çî li ser Behlûl çî li ser Xoce Nesredîn hatiye gotin, qîmeta wê namîne.

Bi rastî rewşeke balkêş e ku pêkenokên weke “Bixwe kurkê min bixwe” û “Tu zanî ku ez mirime, tu tê kerê min dixwî” ku di çanda tirkî de li ser Xoce Nesredîn têne gotin, li nav kurdan bi navê Behlûlê Dîwane belav bûne. Yanî çima heman vegotin li nava tirkî bi tîpa Xoce Nesredîn, li nava kurdan bi tîpa Behlûl belav bûye? Xuyaye ku ereb û farisan, ji tirkî bêhtir bandor li çanda kurdan kiriye. Em vê bandorê di ziman de

jî dibînin. Avdo Karataş jî ev yek tespît kiriye: “Bi qasî ku me dîtiye kurdî, zêdetirê tirkî di bin bandora farsî û erebî de maye. Ev bandorlêkirin di vegotinên gelêrî yên kurdî de jî bi awayekî sext xwe nîşan dide (Karataş, 1999b: 15).

“Mîrov daîma ji nav tiştên derdora xwe, tenê tiştên ku pêwendîya xwe bi wan re heye û bi awayekî geş girêdayî xwe ne, dibîne” (Kaplan, 2016: 98). Bi awayekî din em dikarin wiha bibêjin: Hewcehiya mirov bi çî hebe, mirov wî tiştî dibîne. Di vê çarçoveyê de em dikarin bibêjin ku berhemên gelêrî, binhişê civakê nîşan didin.

Em dikarin di vê mijarê de li gorî pêkenokan têkiliya Tîmurê Lêng û Xoce Nesredîn jî bi bîr bînin. Lewra digel ku ne hemdemê hev in, Tîmur piştî mirina Xoce Nesredîn bi 117 salan hatiye Anadolê, di gelek pêkenokan de Tîmur û Xoce Nesredîn weke lehengên heman pêkenokê tê dîtin. Weke ku tê zanîn di sala 1400’î de Tîmurê Leng êrişî herêma Anadolê dike:

“Di wî heyamî de hêzeke ku li dijî leşkerên Tîmur û xedariya wan bisekine tune bû. Can û malê xelkê di wan êriş û talankirinan de ji dest çûbû. Ev zulim di dîrokê de nehatin jibîrkirin û di nav salan xelkê, bi riya tîpa/lehengê pêkenokan ku em bi navê Xoce Nesredîn nas dikin heyfa xwe ji Tîmur sitend. Gava ku gel (xelk) ev pêkenok digotin an jî li wan guhdarî dikir, heyfa xwe ji vî hukumdarê xwînxwer ê dîrokê distend, ji aliyekî ve aram dibû” (Duman, 2012: 61 ). Mustafa Duman diyar dike ku divê ev rewş ne li gorî kesayeta Xoce Nesredîn a dîrokî, li gorî kesayeta wî ya folklorîk were nirxandin. Lewra “hişê civakî” wan hemdem dihesibîne û ji bo ku parastina xwe, Xoce Nesredîn derdixê pêşiya Tîmur (2012: 60).

Tîp ji aliyê civakê ve bi wate ne. Ew di dewreke diyar de, nirxên sereke yên civakê temsîl dikin (Kaplan, 2016: 9). Ango em ji vegotinên deverekê fêhm dikin ku xelkên wê deverê qîmetê didin kîjan nirx û xisletan û li dijî çî tevger û helwestan derdikevin.

Yek ji wan tîpên ku herî zêde têne dîtin jî “tîpa welî” ye. Ev tîp, di nêrîna civakê de kesên alixweda ne. “Tîpa welî” bi gelemperî xwe ji xwediyên îqtîdara maddî mezintir/bilindtir dibînin (Kaplan, 2016: 119). Di çend vegotinên devkî ku me tomarkirine de Behlûlê Dana/Dîwane weliyê Xwedê tê qebûl kirin. Behlûl jî xwe ji xwediyên îqtîdara maddî bilindtir dibîne. Lewma berê xwe nade qesr û qonaxan. Di

nêrîna Behlûl de jiyana li sikak û xirbeyan, li nav zarokên Bexdayê, ji jiyana li qesr û serayên Harûnê Reşîd bi qîmettir e. Bi vê taybetiya xwe Behlûl dişibe “tîpa welî”. Avdo Karataş jî diyar dike ku -li dora Hezexê- hemû kesên ku wî ji devê wan vegotin tomar kirine, bi çavê “welîtiyê” li Behlûl dinêrin (1999a: 80).

#### **1.4. LI GORÎ ÇAVKANIYÊN NIVÎSKÎ KESEYATA BEHLÛL**

Zanînên me yên di heqê Behlûl de behtir ji çîrok û pêkenokan hatine girtin. Ev kesê ku ne bi kesayeta xwe ya heqîqî bêhtir bi ders û peyamên xwe ve tê nasîn, bi lihevkirina çavkaniyên nivîskî li Kûfeyê ji dayik bûye û li Bexdayê jiyaye. Lê dîroka jidayikbûna wî ne diyar e. Behlûl, bi navê xwe yê rasteqînî Ebû Wehb kurê Emerê Seyrefî, di sala koçî 190?î (miladi 805 an 806) de li Bexdayê miriye (Îvgin, 2005: 11; Aytakin, 2015: 15). Serdema ku Behlûl lê jiyaye rastî hikimraniya (788-809) xelîfeyê Ebbasiyan Harûnê Reşîd (763-809) tê. Jixwe pêkenokên ku em ê li ser wan hûr bibin, gelek caran di navbera Harûnê Reşîd û Behlûl de derbas dibin.

Kesayetên ku piştî mirina xwe ji aliyê gel ve gelekî têne heskirin û ecibandin bi awayekî efsanewî navdar dibin. Li ser qencî, wêrekî û mêraniya wan gelek tişt têne gotin. Ji ber ku xelk dixwazin hebûn û bihevrebûna bi wan re ji xwe re bikin sedema şanazyê, carinan gora mirovekî li çend ciyan tê dîtin. Li gorî Hayrettin Îvgin gora Behlûl li Bexdayê li “Goristana Şanuzziye”yê ye; lê li gorî îdfiayeke, ku piştî mirina wî bi sê salan belav bûye, gora Behlûl li “Goristana Kerh” ê ye (Îvgin, 2005: 11). Mînyatura gora Behlûl ji aliyê Matrakçi Nasuh ve hatiye çêkirin (Aytakin, 2015: 24).

Behlûl ku di çanda rojhilat de cihekî girîng digre, li gorî hin lêkoleran ji çanda farisan e (Yücel, 1990: 15); li gorî hin lêkoleran jî ji folklorê ereban tîpeke “ukalau’l-mecanîn” e (Îvgin, 2005: 13). Ev tîpa ku em dikarin weke “zanayê dînik” bi nav bikin, bi van navan hatiye nasîn: Behlûlê/Balûlê Dîwane, Behlûlê Dana (zana), Behlûlê Danende, Behlûl er-Reşîd.

Li gorî xebatên nivîskî di pêkenokan de Behlûl, ji bo Harûnê Reşîd weke bira, kek, pismam, şewirmend, qeşmer, heval derdikeve pêşberî me (Îvgin, 2005: 10). Lê em dikarin bi rihetî bêjin ku tu eqrabatiya Behlûl û Harûnê Reşîd tune ye. Lewra bavê Harûnê Reşîd Muhammed el-Mehdî bin Abdullâh Mansûr (746-785) jî xelîfeyê Ebbasiyan bû. Ji ber vê yekê jî di çavkaniyên dîrokî de di heqê malbata Harûnê Reşîd de

hemû hûrgilî hene. Jixwe navê bavê wan û jî hevdû nagire, lewra em dizanin ku navê bavê Behlûl “Emerê Seyrefî” ye. Di vê xalê de rastiya pêkenokan û rastiya dîrokî hevdû nagirin. Ango biratiyeke wan a bîyolojîk tune ye, belkî em dikarin bibêjin “destbirakê” hev in.

Bi lihevkirina çavkaniyên nivîskî em dizanin ku Behlûl ne dîwaneyekî (dînik) ji rêzê ye. Behlûl mirovekî ji zanayan zanatir e, lê xwe li dînîtiyê daniye. Li ser sebeba vê yekê çend tişt hatine gotin. Li gorî fikrekê Behlûl tuşî cezbeya îlahî bûye û ketiye halê dîwanetiye. Careke din jî venegeriyaye ser rewşa xwe ya berê (Aytekin, 2015: 18).

Li gorî çavkaniyên şîfyan Behlûl xwendekarê Caferê Sadiq (m. 765) bûye. Behlûl, ji bo ku zext û zordariyan nebîne xwe wek sunnî nîşan daye, bi ser de jî ji bo ku bi awayekî azad fikrên xwe bibêje xwe li dînîtiyê daniye (Îvgin, 2005: 11; Aytekin, 2015: 21). Abdullah Nîyazmend ku nivîskarekî Îranî ye û “henek û çîrokên” li ser Behlûl danehev û çapkirine, îddîa dike ku xelîfeyê Ebbasiyan Harûnê Reşîd piştî şêwra bi derdora xwe re pêşniyaza qadîtiya Bexdayê li Behlûl kiriye; lê wî ev yek qebûl nekiriye û xwe li dînîtiyê daniye: *Hinek nivîskar û dîroknasan gotine ku: Behlûl ji bo ku xelas bibe ji hevkarîya zilm û sîtema xalîfeyê Ebbasiyan Harûnê Reşîd, bi destûra rêberê xwe Caferê Sadiq, xwe li dînîtiyê datîne* (Nîyazmend, 201: 16). Li gorî vê nerîne îqtîdara Harûnê Reşîd zilimkar e. Ji ber ku Behlûl jî nexwestiye bibe şîrkê vê zilmê, erkdayina Harûnê Reşîd qebûl nekiriye. Nîyazmend îddîaya xwe asteke din jî bilind dike û dibêje ku *rîwayet û serpehatiyên wî pir hindik îro di destê me de ne, pirên wan serpehatî û hikayetan bi destê dijminên ehlê beytê hatine windakirin* (2012: 16).

Tesîra nêrîna şîfyan an jî ya Nîyazmend, ne di pêşgotina pirtûkê tenê de, di “henek û çîrok” ên tomarkirî de jî tê dîtîn. Li gorî pêkenoka bi navê “*Mamikên Harûnê Reşîd*” xelîfe Harûnê Reşîd mamikekê dipirse û dibêje ku kî tê derxe wê hezar dînarê zêr bide wan. Behlûl qebûl dike û bersiva mamikê jî rast dibêje lê li şûna hezar dînarî azadkirina sed dostên xwe dixwaze:

*Behlûl navê sed mehkumên ku alîgirên Hz. Elî ne, da Harûnê Reşîd ku wan azad bike. Harûnê Reşîd li navnîşa (lîste) nawan nihêrî, tev nas kirin û ji soza xwe poşman bû. Lê li ser cad û îsrara Behlûl deh girtî azad kirin* (Nîyazmend, 2012: 35). Ji vê metnê bi awayekî zelal tê fahm kirin ku dijberiyeye xurt li dijî Harûnê Reşîd heye. Lewra wî him alîgirên Hz. Elî dane girtin him jî li ser soza xwe nesekiniye.

Pêkenokên Behlûl di edebiyata faris, ereb û tirkan de jî cihê girîng digrin. Di edebiyata farisî de nivîskar û helbestkarên weke Mewlana Celaleddînê Rûmî (m. 604/1207), Sadîyê Şîrazî (m. 692/1292) û Ferîduddînê Attar (553-627) di berhemên xwe de behsa Behlûl kirine (Kalkandelen, 2012: 49-52).

“Behlûlî” weke sîfetekê (taybetiyekê) jî tê dîtin. Li gorî fahma tesewufê kesên behlûlî tuşî cezbeya îlahî hatine, hiş û aqilê xwe avêtine. Ev kes dixwin, vedixwin, pêdiviyên xwe yên zarûrî pêk tînin -lê ji ber ku hiş û aqilê wan ne li cî ye -bi karên dinyayî ve mijûl nabin (Uludağ, 1989: 351).

Behlûlên ku xwediyê hal û tevgerên xweser (xususî) in, agahiyên balkêş ên xeybî didin. Behlûl bêyî hebûna sebebeke xuyayî dikenin. Ji ber ku bi rastiyên ku ji xelkê re veşartî ne, dizanin û di heqê paşerojê (îstîqbal) de xwedî-zanîn in. Lewma Behlûl, bi helwest û tevgerên mirovên nezan û xafil dikenin da ku muxatabên xwe hişyar bikin û rastiyê nîşanî wan bidin (Uludağ, 1989: 351).

## BEŞA DUYEM

### NIRXANDINA TEŞEYÎ YA VEGOTINÊN DEVKÎ

#### 2.1. LEHENGÊN PÊKENOKÊN BEHLÛL

Di pekenokên li ser Behlûl de hejmara “kesên nasname-diyar” ne gelek in. Di çîrok û pêkenokên ku me tomar kirine de du “kesên nasname-diyar” hene: Behlûl û Harûnê Reşîd. Ji bilî herduyan kesên weke qazî, wezîr, xizmetkarên Harûnê Reşîd, jina Harûnê Reşîd (Sitî Zubeyde), jina Behlûl, bazirgan, gundî û gelek kesên din ji nav jiyana rojane têne dîtin. Lêbele navê van kesan bi awayekî diyar derbas nabe. Gelek kesên wek “zilamek, yekî gundî, tacirek, wezîrê Harûnê Reşîd, qazî, mêvanê Behlûl, qesab” derbas dibin lê navê wan derbas nabe. Ji ber ku di pêkenokan de tişta girîng ne “rastiya dîrokî” ye; tişta girîng peyama, ders bi xwe ye. Jixwe kesên weke Harûnê Reşîd, Tîmûrê Leng ne tê de “Di pêkenokan de tespîtkirina nasnameya rastî ya lehengekî bi gelemperî ne pêkan e” (Yıldırım, 2016: 43).

Kadroya lehengên pêkenokan ji sê koman pêk tê: Tîpa erênî, tîpa neyînî û tîpa guhdar-temaşavan. Du komên ku nîqaşê, berberiyê yan jî sohbetê dikin, ji tîpên erênî û tîpên neyînî pêk tên. Bi gelemperî tîpa pêkenokê, tîpa erênî temsîl dike (Kaya, 2010: 315). Di çarçoveya şîroveya Kaya (2010: 315) de em dikarin bibêjin ku Behlûl, tîpa sereke û erênî ye. Bi awayekî teqez polînkirina lehengan belkî zahmet e lê em dikarin lehengên pêkenokên tîpa Behlûl bi serkî bikin sê kom:

##### 2.1.1. Lehengên Baş:

Behlûl, jina Harûnê Reşîd û Harûnê Reşîd (carinan) wek lehengên baş cih digrin.

Bûyera vegotinê gelek caran li ser fikir, tevger û helwesta lehengê baş (Behlûl) ava dibe. Navê jina Harûnê Reşîd, di çavkaniyên tarîxî de “Sitî Zubeyde” derbas dibe (Aka vd., c.3: 149), lê di vegotinên devkî yên ku me tomar kirine de ev nav derbas nabe. Sitî Zubeyde, bi hêz û otorîteya xelîfe Harûnê Reşîd dernakeve pêş. Sitî Zubeyde bi tevgerên xwe yên baş û bi merhemeta xwe ve derdikeve pêş (jmr. 58).

##### 2.1.2. Lehengên Nebaş:

Harûnê Reşîd (carinan), wezîr, qazî, eskerên Harûnê Reşîd û hwd. wek kesên nebaş di pêkenokan de cih digrin. Di nav lehengên nebaş de cihê Harûnê Reşîd ne

misoger e. Ew carinan bi tevger, fikir û helwestên xwe dibe sebeba zilm û neqenciye, lê li ser hişyariya Behlûl, xwe rast dike û nebaşiyê ji holê radike.

### **2.1.3. Lehengên Lêqewimî û Yên Din**

Gundî, tacir (bazirgan), zilamê ermenî, mirovên cihû, mêvanê Behlûl, qesab û hwd. kesên lêqewimî û lehengên alîkar in. Di pêkenokan de lehengên ermenî û cihû jî têne dîtin. Ev lehengên ermenî û cihû ne bi nasnameyeke neteweyî (ethnic), bi nasnameyeke/fikareke dînî derdikevin pêşberî me. Sebeba lêqewimîbûna (mexdûr) wan filetî û cihûtî ye, ne ermenîtî ye (jmr. 30,31, 32). Kesên ku mexdûr dibin, ji bo çareser kirina pirsgerêkên xwe tim tîn bi Behlûl dişêwirin.

## **2.2. DEMA PÊKENOKÊN BEHLÛL**

Em dikarin bi rehetî bibêjin ku dema bûyerên pekenokan ne diyar e. Carinan rojek ji zivistanê, carinan rojek ji biharê, carinan jî rojek ji havînê ye; lê sal û meh ne diyar in. Ev yek, ji bo hemû pêkenokan taybetiyeke giştî ye. Lewra “Di pêkenokan de kategoriya zeman ne diyar e” (Yıldırım, 2016: 43).

Ji ber ku gelek caran pêkenok li ser Behlûl û Harûnê Reşîd hatine gotin, em dikarin bibêjin ku Behlûl hemdemê Harûnê Reşîd e û di sedsala 8’an de jiyaye. Lê em nikarin behsa saleke diyar bikin. Diyarbûna nasnameya Harûnê Reşîd, qaîdeya me ya li ser “dema pêkenokan” pûç dernaxe. Di hemû pêkenokan de zeman rojek ji rojan e.

Dema navbera destpêk û dawiya pêkenokan bi piranî ne dirêj e. Pêkenok carinan di çend deqe û saetan, carinan di çend rojan de derbas dibe. Lê çîroka ku behsa -bi destê filehekî-kuştina zilamekî misilman dike, di navbera çend salan de derbas dibe (jmr. 10). Heman taybetî ji bo pêkenoka “Sedeq Behlûl” jî derbasdar e (jmr. 40, 41).

## **2.3. MEKANÊN PÊKENOKÊN BEHLÛL**

Di pêkenokan de bi gelemperî navê gund û bajaran derbas nabe. Îstîsnaya vê yekê “Bexda” ye. Di hinek vegotinên Behlûl li Bexdayê tê dîtin (jmr. 54).

Hinek mekanên vegotinên xebata me, girêdayî peyama xwe ne. Di eslê xwe de mekan beşek ji haziriya peyamê ye. Di navbera mekan û peyamê de têkiliyeke xurt heye. Dema ku peyam rexnekirina otorîte û birêveberan an jî daxwaza edaletê be

pêkenok li qesra Harûnê Reşîd, li edlîyê an jî li qesra wezîr derbas dibe (jmr. 38). Gava ku peyam li ser fanîbûna dinyayê be, “goristan” dibe mekanê pêkenokê (jmr. 3, 5). Dema ku mijar awayê pêkanîna îbadetan an jî samîmiyeta misilmanan be mizgeft sibe mekanê vegotinan (jmr. 21, 22, 23).

Pêkenokên li ser Behlûl di coxrafyayeke mezin û fireh de derbas dibin. Gelek derên weke bajar, gund, meydan, mizgeft, zewî, goristan, birk (quleteyn) û çem bi mekanî derdikevin pêşberî me. Em dikarin bibêjin ku her cihekî di jiyana rojane de tê dîtîn, dikare bibe mekanê vegotinên girêdayî Tîpa Behlûl.

#### **2.4. MIJARÊN PÊKENOKÊN BEHLÛL**

Pekenok olana têkiliya navbera mirovan û têkiliya wan a bi civakê re ye. Lewma jî “Di pêkenokan de cihê hêmanên (unsûr) xeyalî û fantastîk zêde nîne” (Yıldırım, 2016: 44). Pêkenokên li ser Behlûl jî bi gelemperî wisa ne. Tiştên dûrî-aqil kêr in. Di çîroka “Sedeq Behlûl” de Harûnê Reşîd, di navbera çend deqeyan de bi awayekî fantastîk/mucîzewî dibe keçik. Çend sal derbas dibin, sê heb zarok jê re çêdibin. Rojekê xwe li avê dixê û weke Harûnê Reşîd ji avê dertê. Bi vê taybetiya xwe ve ev pêkenok/çîrok, di nav xebata me de cihekî taybet digre. Lê ev pêkenoka fantastîk jî ji bo peyama Behlûl navgînek e ku digot “Xweda dikare saniyê bike sal” (jmr. 40, 41).

Hemû mijar û bûyerên ku dikarin di jiyana rojane ya civakî de bêne dîtîn, di vegotinên girêdayî tîpa Behlûl de hene. Ji şîreta li xortên azîb bigre heta bi awayê dirust/rast pêkanîna îbadetan, ji têkiliyên navbera jin û mêran bigre heta qelsî û kêmasiyên mirovî, ji rexnekirina birêveber û peywirdaran bigre heta daxwaza mafên filehan gelek tişt bûne mijara vegotinên girêdayî tîpa Behlûl. Ev yek jî nîşanî me dide ku Behlûl ne berdevkê komekê, fikrekê, bîrûbaweriyekê ye, wijdanê civakê bi xwe ye. Her tiştê ku civak jê ne razî ye, bûye hedefa rexneyên Behlûl.

Civak ku afirînera pêkenokên Behlûl e, nahêle/naxwaze zilm bidome. Lewma ji devê Behlûl tê gotin: “Xweda heqiyê heq dike” (jmr. 8). Yanî heke zilmeke, neheqiyek hebe, kengî be wê rastî derkeve holê. Giya di bin kevîran de namîne. Di vegotinan de em dibînin ku kesên ku qencyê dikin, rastî qencyê tên; yên ku neqencyê dikin, rastî neqencyê tên (jmr. 25). Civak bi vî awayî qencyê xelat dike, neqencyê jî ceza dike. Vegotinên devkî, bi vî awayî xwîner û guhdaran (civakê) perwerde dikin.



Tiştên ku bûne mijara pêkenokên tîpa Behlûl nîşanî me didin ku civak ji alî çî ve lawaz bûye û hewcehiya civakê bi çî heye. Ji vegotinên devkî em fêhm dikin ku di civaka afirîner a tîpa Behlûl de birêveber ne durist in û heqê mirovan dixwin (jmr. 53, 54), kesên ne misilman ji birêveberiya misilmanan bi gazin in (jmr. 30, 31, 32), esnafên ku heqê mişteriyên dixwin hene (jmr. 24, 25), misilman di pêknanîna îbatedan de bi qisûr in (jmr. 21, 22), heskirina malê dinyayê bi xelkê re zedê bûye û wan fanîbûna dinyayê ji bîr kiriye (jmr. 4, 5).

## 2.5. TAYBETIYÊN PÊKENOKÊN TÎPA BEHLÛL

Vegotinên devkî ku me tomar kirine, bi tevahî ne di kategoriya pêkenokan de ne, lê gelek ji wan pêkenok in. Taybetiyeke ku were tespît kirin dibe ku him ji bo yek-du heban him jî ji bo gelek derbasdar be. Bi nirxandineke giştî em dikarin taybetiyên girêdayî tîpa Behlûl wiha rêz bikin.

1. Pêkenok bi gelemperî kurt in û di nava demeke kurt de derbas dibin.
2. Binyada pêkenokan li ser diyalogan ava bûye. Diyalog ne dirêj in.
3. Lehengên sereke yê pêkenokan Behlûl û Harûnê Reşîd in.
4. Ji her çînê (padîşah, qazî, cotyar), ji her pîşeyî (qesab, nanpêj, bazirgan û hwd.), ji dîn û milletên cuda (ereb, ermenî, cihû) mirov wek lehengên pêkenokan têne dîtin.
5. Di pêkenokên tîpa Behlûl de ders an jî peyama vegotinê carinan raterast nayê gotin. Lê gava ku tiştê hatî gotin ji alî muxetab ve neyê fahmkirin, Behlûl bi awayekî zelaltir meselê vedibêje. Dema ku zîlamê ciwan tê bal Behlûl û dixwaze ku li ser zewacê şîretan lê bike, Behlûl dibêje: “Ku tu yeke qîz bînî, weke te ye; ku tu yeke jinebî bînî, weke wê ye; ku tu yeke jinberdayî bînî, ji ber hespê min rabe, ez ê te perçêxim”. Lê piştî ku xort, ji van gotinên Behlûl fêhm nake; vê carê Behlûl gotinên xwe yek bi yek şîrove dike (jmr. 35).
6. Di pêkenokan de şayesandinên dûr û dirêj tune ne.
7. Carinan heman rabêj di pêkenokên peyam-cuda de hatiye bikar anîn. Di pêkenoka “Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe” de li gorî guhertoyekê Behlûl dibê mirov ji hevdû berpirsyar in, lewra Behlûl li dijî vê rabêja xelkê derdikeve (jmr. 11). Lê li gorî guhertoyekê din Behlûl li qesabxanê dibîne ku mî bi piyê xwe ve, bizin bi piyê xwe ve daleqandî ye. Piştî dîtina vê rewşê kêfa wî tê, lewra Behlûl ditirse ku ji ber gunehên Harûnê Reşîd li axretê were ceza kirin (jmr. 12, 13).

8. Di guhertoyên heman pêkenokan de cudahiyên teşeyî hene, lê mesaja wan yek e. Wek mînak, di pêkenoka “Elhemdulillahî rebbîl muslimîn” de li gorî guhertoyekê Behlûl li pêşiya civatê nimêj dike û Harûnê Reşîd îtiraza xwendina wî dike (jmr. 31); lê li gorî guhertoyeke din Harûnê Reşîd li pêşiya civatê ye û Behlûl îtiraza xwendina wî dike (jmr. 30). Lêbelê peyama her du guhertoyan jî yek e. Ji bo guhertoyên “De îcar mala xwe xera bike” (jmr. 45, 46, 47) heman taybetî derbasdar e.
9. Di vegotinên ku me tomar kirine de du kesayetên dîrokî derdikevin pêşberî me: Behlûlê Dîwane û Harûnê Reşîd. Ev her du kes di heman demê de, du kesên sereke ne di pêkenokên girêdayî tîpa Behlûl de.
10. Dema pêkenokan ne diyar e, rojek ji rojan e. Ango navê sal û mehan derbas nabe.
11. Hinek pêkenok/vegotin gelekî berbelav in. Vegotinên weke “Sedeq Behlûl, Mî bi Piyê Xwe Bizin bi Piyê Xwe, Mala me ya Heqîqî, Elhemdulillahî Rebbîl Muslimîn, Ne Hêjaye Tir û Fisekê” li bajarên Batman, Mêrdîn, Sêrtê hatin peydakirin.

## BEŞA SÊYEM

### NIRXANDINA GIŞTÎ

#### 3.1. NIRXANDINA NAVEROKA PÊKENOKÊN BEHLÛL

Dikare bête gotin ku lêgerîna awayên vegotinê bûye destpêka hunerên edebî. Mirov li şûna ku tişteki raterast bibêjin, gelek caran berê xwe didin mecaz û şibandinan. *Bi taybetî li rojhilat dema yek bixwaze dersekê bide, şiretekê bike berê xwe dide pêkenok û çirokan* (Başaran, 2017: 16). Ev rêbaza qedîm îro jî derbasdar e. Weke ku me berê jî destnîşan kir civak; nerazîbûn, rexne, hedef û armancên xwe bi riya tîpên gelêrî tîne ziman. Lewra M. Kaplan jî diyar dike ku “tîp” ji şert û mercên civakê, ji hewcehiyên civakê derdikevin (2016: 55). Mesela kêmasî û qelsiyên mirovî bi riya vegotinên girêdayî tîpa Behlûl hatine nimandin. Qîmeta mirov li gorî helwest, kirin û tevgerên xwe ye. Mirovê ku qenciye bike hêjayî mecîdî û zêran e, lê mirovê ku neqenciye bêje û bike weke “komikeke xweliyê” bêqîmet e (jmr. 39).

Li gorî nêrîna tîpa Behlûl, mirov çî bike bi xwe dike û ji xwe re dike. Kesê ku malê îbadan (evdan) bixwe, têrxwarin jê re tune. Lê kesê ku çavê wî têr be, bêhtir malê wî zêde dibe. Lewra Xweda mukafata başî û nebaşîya mirovan li dinyayê jî dide wan (jmr. 24, 25).

Di fitreta însên de meyla zêdekirin/mezinkirinê heye ku pêşîyan gotiye: Filan kes ji libek tirî mehserekê çê dike. Dema ku Behlûl behsa vê yekê ji Harûnê Reşîd re dike, Harûnê Reşîd bawer nake ku ev kêmasî di nav peywirdarên wî de jî hebe. Lê paşî bi xwe dibe şahidê vê rastiyê (jmr. 27).

Yek ji kêmasiyên mirov jî nefis û çavbirçîtî ye. Di pêkenoka “Ez jî li wê mame heyirî” de Behlûl serê pêşî bêdil e ku here (bê destur) bikeve nav werzê xeyaran. Lê piştî ku nefsa wî zora wî dibe û dikeve nava bexçeyê xeyaran, him têr xeyar dixwe him jî ji bo zarokan re bibe dawa xwe tije xeyar dike (jmr. 60). Rewşeke kêmdîtî ye ku Behlûl weke lehengekî nebaş tê dîtîn. Dêmekî carinan civak, ji bo vegotina rastiyekê, tecrûbeyekê lehengên weke Behlûl (lehengekî baş) ji xwe re wek “amûrekê” bi kar tîne. Di vê vegotinê (jmr. 60) de Behlûl di bin siya peyama pêkenokê de dimîne. Em dikarin pêkenoka “Şirîkatiya Behlûl” jî bi rengî bixwînin (jmr. 59).

Mirov kêmasiyên xwe nabîne, lê kêmasiyên kesên dora xwe, hevalên xwe dibîne. Behlûl dixwaze vê yekê bi serê xelkê xe, lê yên li dora wî fêhm nakin. Ew jî radibe vê yekê bi mînakên dinimîne (jmr.28, 29). Mela Halil Dayan ku yek ji vebêjerên xebata me ye, bi wateya şîrovekirina vê yekê wiha digot: “Mirov gîsinê di çavê xwe de nabîne, şûjina di çavê hevalê xwe de dibîne”. Ev yek di heman demê de yek ji gotinên peşiyane.

Di nav tevahiya vegotinan de, “pêkenokên li ser gel û zumreya birêveberan” cihekî girîng digrin. Di van pêkenokan de gelek caran neheqî, bêdaletî, bertîl û alîgirtin heye. Di vê xalê de gel rexne û nerazîbûna xwe rasterast nabêje. Ji bo vê yekê tîpeke gelêrî derdixe pêşberî zumreya birêveberan. *Di van salên dawiyê de jî gelek pêkenokên li ser serdestan û peywirdarên wan hatine gotin rewacdar in* (Sadinî, 2012: 15). Zahfûna pêkenokên di navbera Behlûl û kesên weke Harûnê Reşîd, wezîr û qazî de vê yekê dipeyitîne.

Tîpa Behlûl, mirovên neqenc û neheq mecbûr dike ku dest ji tevgerên xwe berdin û heqê heqdarên teslîmî wan bikin. Ango Behlûl, rasterast daxwaza kesên lêqewimî nake. Bi pîlanekê, bi mîsalekê, bi şibandinekê heqê kesên lêqewimî ji zordestan distîne (jmr. 53, 30, 14). Ev zîrektî û wêrekiya Behlûl, ji aliyê gel ve jî hatiye pejirandin. Lewra gava neheqiyek tê serê yekî xelk dibêjin, here bal Behlûl wê çarekê ji te re bibîne (jmr. 54).

Armanca tîpa Behlûl aramiya civakê ye. Ji bo vê yekê jî çî kar û xizmet ji destê wî bê, teksîr nake. Lewra dema ku weke zabitayekî erka venêrîna sûk û bazarê didine wî û vê yekê weke “xizmeta xelkê” pêşkêşî wî dikin, wiha dibêje: “Ê ku xizmeta xelkê be ser seran ser çavan” (jmr. 25).

Ew kesên ku menfaeta xwe di ser ya gel re digrin û ji bo vê yekê derfetên dewletê bikar tînin, rastî “edaleta Behlûl” tînin. Behlûl qet tehemûla wan kesan nake û rê nade wan ku bi tu awayî xelkê bixapînin, mexdûr bikin (jmr. 54).

Ligel nerazîbûn û rexneyan civak, bi riya tîpa Behlûl, nîrx û hêviyên xwe jî dide der. Rabêj û tevgerên Behlûl di heman demê de nîmandîna nîrxên civakê ne. Nêrîna kesên ku li gorî dewlemendiyê qîmetê didin mirovan di pêkenoka “Bixwe kurkê min

bixwe” de hatiye rexnekirin (jmr. 44). Hêviya civaka afirîner a vê pêkenokê ew e ku malê dinyayê nebe pîvana qîmetdayîna mirovan.

Kesên ku zêde dipeyivin, xwe dixin nava her tiştî, ji aş û bajar diştexilin di nêrîna civakê de ne meqbûl in. Lewra Behlûl ji mêvanê xwe re dibê “nexwestî nede”. Mêvanê Behlûl şîreta Behlûl nagire û weke encama vê yekê jî serê xwe dixwe belayê (jmr. 14). Di eslê xwe de ev hişyarî yan jî geflêxwarina civakê ye li dijî xwediyên tevgerên nemeqbûl.

Tîpa Behlûl, xwediyê hêzeke manewî ye, hêzeke wî ya maddî tune ye. Her çiqas di hinek pêkenokan weke birayê Harûnê Reşîd were dîtin jî, Behlûl hêza hikimraniya Harûnê Reşîd bi kar nayîne û piştî xwe bi vê yekê girê nade. Bi ser de jî Behlûl gelek caran dijberiya hêza maddî dike. Di pêkenoka “Ne hêjaye tir û fisekê” de Harûnê Reşîd tevî hêza xwe ya maddî li hember hêza manewî (Behlûl) têk diçe (jmr. 1).

Lixwekirina cilên (kinc) nû û rengîn carinan weke dewlemendî û quretiyê derdikeve holê. Lewma jî cilên sofî û derwêşan bêqîmet in. Di vê çarçoveyê de cilên Behlûl jî gelek caran kevin û qetiyayî ne (jmr. 62). Behlûl bi cil û kincên xwe mirovekî ji çîna jêrdest e.

Behlûl kesên dilpak û yên şiyar/çavvekirî weke hev nanirxîne. Pêkenoka “Qesra Bêderî” de jina Harûnê Reşîd bê menfaet rehmê/qencyê li Behlûl dike lê Harûnê Reşîd, piştî ku jina wî di xewnê de qesra xwe li cennetê dibîne, tê bal Behlûl, dibê talebkarê qesra ji heriyê çêkirî; lê Behlûl vê yekê qebûl nake (jmr. 58).

Tîpa Behlûl gelek caran ne xwediyê mal û milk e. Lê tê dîtin ku carinan kerekî wî heye. Behlûl ne xwediyê hêştir û hespan e. Lewra hesp û hêştir bêhtir li cem dewlemendan peyde dibin. Digel vê yekê ker, him ji bo barkişandinê him ji bo siwarbûnê tim li ber destê hejar û xizanan tê dîtin. Ker ne heywanekî wisa ye ku siwarê wî qure û dewlemend be. Di berhemên edebî de mirovên malmezînan li ser hespan xuya dibin lê tîpên weke Behlûl û Xoce Nesredîn li ser kerekî tene dîtin.

Behlûl ne yekûser tîpekî bajarî ye, ne jî gundî ye. Carinan li bajarekî carinan li gundekî derdikeve pêşberî me. Pêkenokên ku di wan de Harûnê Reşîd weke lehengekî tê dîtin bêhtir girêdayî çanda bajêr in. Ev pêkenok li cihên weke qesr, sûk, qesabxane, mizgeft, edliye û hwd. derbas dibin. Pêkenokên ku Harûnê Reşîd weke lehengekî nayê

dîtin, bêhtir girêdayî çanda gundewar in. Di van pêkenokan gundî û cotkar û jiyana wan a rojane tê dîtin.

Peyam û dersa pêkenokên girêdayî tîpa Behlûl bi pirranî di beşa dawî de ye. Di beşa dawî de ya rexneyek tê dîtin ya nerazîbûnek tê gotin yan jî dersek tê dayîn. Tiştên ku di beşên pêşî de hatine gotin, ji bo beşa dawî hazirî ne. Di pêkenoka “mala me ya heqîqî” de Harûnê Reşîd goşt dikire û Behlûl re dişîne malê, dema şîvê dibîne ku goşt nehatiye malê. Dawiyê de Behlûl dibê, mala me ya heqîqî gor/istan e (jmr. 5).

Di pêkenokên Behlûl de ravekirin û şayesandinên dût û dirêj tune ne. Jixwe yek ji taybetiyên pêkenokan ew e ku bi gotinên hindik, gelek tiştan dibêjin (Yıldırım 2016, 41). Şayesandin bi pirranî di beşa pêşî (destpêk) de tê dîtin.

Yek ji rêbazên vegotina tecrûbeyên civakî gotina pêşiyane. Di mijarên cur bi cur de tecrûbeya sedsalan di gotinên pêşiyane de tê dîtin. Di navbera pêkenokên Behlûl û gotinên pêşiyane de têkiliyeke xurt heye. Di pêkenokên weke “Guyê hişk bi kesî ve nazeliqe” (jmr. 10), “Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe” (jmr. 11, 12, 13), “Mirov uzrê xelkê dibîne yê xwe nabîne” (jmr. 28, 29) de gotinên pêşiyane hatine bikaranîn û pêkenok li ser ders û peyama gotina pêşiya ava bûye. Di eslê xwe de gelek caran tecrûbeya gel, wek encama vegotinên girêdayî tîpa Behlûl derdikeve hole. Weke ku di gotinên pêşiyane de jî tê gotin “Giya di bin kevir de namîne”. Ango çî zû çî dereng kengî be wê heqî/rastî derkeve holê (jmr. 8, 9). Behlûl gûman nake ku wê heqî derkeve holê lê carinan eşkerebûna heqiyê dereng dikeve. Behlûl vê yekê bi rengekî mîzahî vedibêje: “Jixwe wê heq bike, lê heta heq bike kef ê bi ser devê me keve” (jmr. 8). Mesela civakê tecrûbeya xwe ya li ser tesîra barana nîsan û gulanê di pêkenoka “Fiyeta nîrê zêr” de nîşan daye (jmr. 62).

Behlûl di mijara zewacê de jî şîretan li ciwanan dike ku bi “keçeke qîz (nezewicî)” re bizewicin. Lewra qîz li gorî destûr û terbiyeya mêrê xwe tevdigere. Pîreka jinebî jî, li bal mêrê xwe yê berê çî dîtibe wê dewam dike. Lê pîreka berdayî bikêr nayê, lewra heke pîrek baş bûna wê li bal mêrê xwe yê berê bimane û nedihate berdane (jmr. 35). Ev yek nerîna bavkanî (pederşahî) ya civakê jî dide der. Li gorî vê nerînê di cihêbûna jin û mêr de qisûr a jinê ye. Ev pêkenok di heman demê de berhem û encama vê fahma civakê ye.

Di nirxandîna vegotinan de bala me kişand ku çend heb vebêjer peyva “paşa” li şûna peyva “padîşah” bikar tînin. Dema ku Behlûl, cilên Harûnê Reşîd li xwe dike û di palkursiyê wî de rûdinê; wiha dibêje: “Vêga îca ez bûme paşa” (jmr. 33). Halbukî Harûnê Reşîd, ne paşa ye padîşah e. Dîsa gava pisîka Behlûl li daristanê rastî şêr tê, ji wî re dibêje: Paşaya min (jmr. 51). Lêbelê li gorî çivanokan (tr. fabıl) şêr, padîşahê (qiral) daristanê ye, ne paşayê daristanê ye. Li gorî fikra me, ev yek encama rewşa Kurdan a siyasî ye. Di nêzdîroka Kurdan -bi taybetî di dema Osmanîyan de gelek beg, paşa û mîr ji nav Kurdan derketine. Lê em nikarin heman tiştî ji bo “padîshahekî Kurd” bibêjin.

### 3.2. TÊKILIYA TÎPA BEHLÛL Û ÇANDA ÎSLAMÎ

Dema ku em bi giştî li peyama vegotinên tîpa Behlûl dinêrin, em dibînin ku tÊkiliyeke xurt di navbera tîpa Behlûl û baweriya îslamê de heye. Behlûl bi hinek taybetiyên xwe ve prototîpekî civaka îslamî ye. Behlûl bi fikir, helwest û tevgerên xwe ve vê yekê dide der. Heke em di bîra xwe bînin ku pêkenok bi gelemperî ne xwediyê rastiya dîrokî ne û ji hêla civakê ve tene çêkirin, wê çêtir were fêhmkirin ku tîpa Behlûl -di hinek vegotinan de- nêrîna civaka Îslamî ye. Tê dîtin ku gotinên (hedîs) Hz. Muhammed jî di nav vegotinan de hatine bikaranîn (jmr. 2). Em hinek hedîsên din jî ji devê Behlûlê Dîwane dibhîzin. Dema ku Harûnê Reşîd ji nexweşiyê sax dibe û qurbanekê dide, Behlûl dibê bila însan nexweşên xwe bi sedeqeyan tedawî bikin (jmr. 19). Ev gotina pêxember e ku gotiye “Nexweşên xwe bi sedeqê tedawî bikin” (vgz. Karakaş, 2013:143).

Li gorî baweriya îslamê dinya zeviyê axretê ye. Mirov li dinyayê çî bike, vê li axretê encama wê bibîne: *Kî ku bi qasî giraniya zereyekê qencî kiribewê bibîne. Kî jî bi qasî giraniya zereyekê neqencî kiribe wê bibîne* (Quran, 99/7-8).<sup>5</sup> Ji ber vê yekê jiyana mirovê misilman, ne jiyaneke serberdayî ye. Ew xwediyê wê hişmendiyê ye ku *Ev jiyana cîhanê tenê kêf û lîstik e. Herçî ku mala axretê ye, ew jiyana rasteqîn e.* (Quran,

---

<sup>5</sup> Wergera ayetên Quranê ji vê xebatê hatiye girtin: Qur’ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî, Werger: Hüseyin Gündüz (Êsî), Ankara, Weşanên Serokatîya Karûbarên Diyanetê, 2015

29/64). Lewma Behlûl dibêje “Resulê Xweda (sallalahû aleyhî wesellem) gotiye rehetî li dinyayê tune” (jmr. 2).

Ji ber ku dinya cihê haziriya axretê ye û mirov encama tevgerên xwe yê li dinyayê paşî li axretê dibîne, divê mirov hay ji xwe hebe. Lewma Behlûl dibêje: Li cehnemê agir tune, her kes agirê xwe ji dinyayê bi xwe re tîne (jmr. 6).

Gava Behlûl pê dihise ku diz ketiye mala wî, diçe li ber devê goristanê li benda mirovê dizek disekine û dibêje “kengî be wê were vir” (jmr. 3). Behlûl bi vê yekê ji derdora/civaka xwe re dibêje ku dinya fanî/demkî ye. Mirovê neqenc/dizek kengî be wê bimre û li goristanê were binaxkirin. Wek encamekê jî wê cezayê vê yekê (neqenciye) bibîne/bikşîne.

Digel ku derfeta Behlûl heye jî ew nabe xwediyê meqam, mal û milk. Lewma gava ku, li ser daxwaza Harûnê Reşîd, diçin li nav mal û milkê xwe digerin û di ber goristanê re vedigerin malê; Behlûl dibêje “Va ye milkê me ev der e” (jmr. 4). Di pêkenoka “Mala me ya heqîqî” de jî Behlûl, bala civakê dikşîne ser mirinê û fanîbûna dinyayê (jmr. 5).

Ji ber ku jiyana rasteqîn a axretê ye, Behlûl nade pey kêf û xweşiya dinyayê. Têra xwe dilnizm e, hiskirina nav û dengê dinyayê di dilê wî de tune ye. Lewma gava ku Harûnê Reşîd ji bo xwarinê gazî Behlûl dike, dibêje ku heke ji bo qezenkirina rizaya Xwedê be ez ê werim, lê ku ji bo dengê dinyayê be ez nayêm (jmr. 19). Di nerîna tîpa Behlûl de tiştê ku ji bo pesindayinê, ji bo nav û deng li dinyayê belav bibe were kirin bê qîmet e.

Behlûl dibêje ku madem mirov ji bo qezenckirina rizaya Xwedê kar û xebatan dikin, divê nedin pey nav û dengê dinyayê. Mirov bi dev dibêjin “Em vê mizgeftê ji bo xwedê çêdikin” lê gotin û tevgerên wan hevdû nagirin. Lewra gava ku Behlûl navê mizgeftê diguherîne û rûniştîyên wê derê îtiraza wê yekê dikin; Behlûl dibêje, madem we ji bo Xwedê ev mizgeft çêkiriye çi girîngiya navê wê heye? Di vê vegotinê de Behlûl, kesên ku bi rê û rêbazên dînî pesnê xwe bidin rexne dike (jmr. 23).

Bêguman di jiyana dinyayê de amanceke sereke jî bidestxistina rehetiya/xweşiya dinyayê ye. Mirov ji bo ku debara xwe bikin û bighîjin rehetiyê digerin, dixebitin.



Behlûl jî piştrast dike ku hemû kes li rehetiyê digere lêbelê li dinyayê rehetî tune ye (jmr. 2). Lewra cihê kêfxweşî û rehetiya ebedî axret bi xwe ye.

Behlûl di mijara awayê pêkanîna îbadetan de jî pîvanên girîng datîne. Misilman dema îbadetan divê hiş û bala xwe nede tiştên din, tenê bi îbadetên xwe re mijûl bibe. Lewma jî Behlûl, nimêja zilamê ku di ser nimêjê de li hêstira xwe difikire (jmr. 22) û nimêja kesên ku nizanibûn mela kîjan sûret xwend (jmr. 21) meqbûl nabîne.

Bi awayekî zelal me tespît kir ku di nêrîna gelek vebêjêran de Behlûl, “weliyê Xwedê” ye. Di vegotina “Sedeq Behlûl” de gava ku Harûnê Reşîd, Behlûl bi virektiyê tawanbar dike vebêjer Şakir Demir, digot: Heşayî jê (jmr. 41). Yanî Behlûl, weliyekî wisa ye ku gava bi neqenciyeke were tawanbarkirin divê mirov bibêje: Heşa. Heta bi hepsiyan jî xelk dizanin ku Behlûl mirovekî “alîxwedê” ye (jmr. 10).

Di folklorê kurdî de li ser têkiliyên fileh û misilmanan çî erênî çî jî neyînî gelek tişt hatine gotin. Behlûl -ku di gelek vegotinan de meqbûlê civaka îslamî ye- mafên filehan jî diparêze. Him li dijî hinek misilmanan/nerînan him jî li dijî otorîteya seltenetê (Harûnê Reşîd) daxwaza mafên filehan dike û nahêle neheqîya li wan bûyî dewam bike (jmr. 30, 31, 32).

Hinek vegotinên ku me tomar kirine dişibine pêkenokên Bektaşî. Ev pêkenok ji alî baweriya îslamê ve li ser fahmeke heteredoks ava bûne. Lewra “Li gorî Bektaşî Xweda (tr. tanrı) ne heyînekî bitirs e. Têkiliya Bektaşî bi Xwedê re di çarçoveya ‘aşiq-meşûq’ de ye” (Yıldırım, 2016: 79). Di pêkenokên weke “De îcar mala xwe xera bike (jmr. 45, 46), Çav çavan nas dike (jmr. 48), Ez ê heyfa xwe ji te hilînim (jmr. 50)” de Behlûl weke ku bi hevaleyê, naskiriyekî re biaxive tê dîtîn. Di van vegotinan de Behlûl weke hevaleyê qazinker li hemberî Xweda xuya dibe. Gazina Behlûl -di eslê xwe de- ne ji Xwedê ye, ji fahm û nerîna gel e. Hin mirov gava ku hewcehî tişteke dibin mîna ku bi Xwedê re bazarê bikin dibêjin “Ya rebbî tu filan tiştî bidî min ez ê filan tiştî bisediqînim”. Di pêkenoka “Ez ê heyfa xwe ji te hilînim” de rexneya vê nerîne heye. Ango gazin û rexne bi bal gel ve ye, ne ji bo Xwedê ye (jmr. 50).

Tîpa Behlûl, her çiqas girêdayî çanda îslamî be û gelek caran peyam û dersên îslamî bide jî di heqê mijar û pirsgirêkên civakî de gotina xwe kêr nake. Rexne û nerazîbûnên xwe tîne ziman. Ku ji destê misilmanan an ji destê xelîfe (Harûnê Reşîd )

be jî heke neheqiyek hebe, wê neheqiyê bi derfetên xwe ji holê radike (jmr. 30, 31, 32). Ev taybetî derfetê dide ku tîpa Behlûl, li nav hemû çînen civakî berbelav be.

Nirxandina vegotinên devkî dawîya dawî şîrove ye. Ango meriv dikare vegotinekê bi çend awayan şîrove bike. Ji ber vê yekê dema berhevkirina vegotinan, me mesaja hin pêkenokên ku bala me dikşandin ji vebêjêran dipirsîn: Mesaja vê pêkenokê çi ye, li ser çi tê gotin? Di pêkenoka “Xwedê jî wilo kiriye” de Harûnê Reşîd, malekî/ pereyekî dide Behlûl da ku bibe li xelkê belav bike. Behlûl, dibê “Ez weke xwe bikim, weke Xwedê bikim”? Piştî Harûnê Reşîd dibê “Weke Xwedê bike”, Behlûl diçe wî pereyî (diravî) li zengînan belav dike. Paşî jî dibê “Xwedê dabû wan, min jî da wan” (jmr. 36). Vebêjêrê vê pêkenokê Cüneyt Boğadır, digot ev yek li ser razîbûna ji qismetê xwe, li ser tewekulê tê gotin. Pêkenoka “Xwedê jî wilo kiriye” jî şîroveya C. Boğadır dipeyitîne (jmr. 37). Lê divê were gotin ku li vê derê îtirazeke nêzîkî şewaza pêkenokên Bektaşî jî heye. Weke yek bibêje, ya rebbî çima tu mal û pere tevî dide zengînan?

Di vê mijarê de wek encam em dikarin bibêjin ku di gelek vegotinan de mesaj û fikareke dînî heye (jmr. 5, 6, 7, 20, 22, 23). Lêbelê hinek vegotin jî bi hemû taybetiyên xwe ve pêkenok in û di van pêkenokan de “hêmana pêkenî” berbiçav e (jmr. 26, 34, 45, 48, 52).

Di vegotinên li ser tîpa Behlûl de weke taybetiyeke giştî Behlûl, birayê/kekê Harûnê Reşîd e; lê durî hêza desthilata wî ye. Bi ser de jî di hinek vegotinan de dijberê Harûnê Reşîd e. Ev yek li ser têkiliya Behlûl û Harûnê Reşîd îdîayên çavkaniyên şîyan tîne bîra mirov (bnr. Nîyazmend, 201: 16). Ji çavkaniyên nivîskî li gorî pêkenokeke Harûnê Reşîd xwarineke xweş -bi zilamekî xwe re ji Behlûl re dişîne, lê Behlûl wê xwarinê naxwe û datîne ber kûçikan. Zilamê xelîfe Harûnê Reşîd, ji Behlûl re wiha dibêje:

- Tu çi dikî? Ma tu nizanî ku ev xwarin ji yên ku Harûnê Reşîd dixwe ne. Digel ku herkes nikare van xwarinan bixwe çima tu van xwarinan dide kûçikan?
- Bêdeng be. Bila kûçik nebihîzin. Heke bibîzin ew jî naxwin (Aytekin, 2015: 44-45). Li gorî fahma vê pêkenokê Harûnê Reşîd, mirovekî ewqasî neqenc e ku kûçik jî nanê wî naxwin.

Ligel vê yekê jî di vegotinên ku me tomar kirine de li dijî kesayeta Harûnê Reşîd û malbata wî tu siqêf (çêr) û heqaret tune ne. Lêbelê divê were gotin ku di binhişê civakê de dijberiya birêveberiya Harûnê Reşîd jî heye. Lewra di pêkenokê de Behlûl, ji Harûnê Reşîd re dibê: “Welleh ez ewqasî difikirîm, ji ber ewqas zilm û zoriya ku te li xelkê dikir, min digot mutlaq ez ê li axretê ceza bikîşînim” (jmr. 12). Ev nerîn ne tenê ji bo Harûnê Reşîd ji bo bavê wî jî derbasdar e. Li gorî vegotinekê Bavê Behlûl û Harûnê Reşîd, rojekê li xwe mikur tê ku carekê du zilam hatine hizûra wî û neheqî li yê fileh kiriye: “Rojekê du zilam hatin hizura min. Yek misilman, yek jî file bû. Ez li ber siyê bûm û her du zilam li ber tavê bûn. Min çavî yê misilman kir da ku were ber siyê” (jmr. 15). Behlûl, dema mirina bavê xwe, dinêre ku çavê bavê wî rijiyaye û li ser şîreta bavê xwe ji bo ku nebe xelîfe xwe li dînîtiyê datîne. Li vir bi awayekî zelal tê dîtin ku civak jî -bi riya vegotinên devkî- neqencî û neheqiyê ceza dike.

Weke ku Mustafa Duman jî (bi mînaktiya Xoce Nesredîn) destnîşan kiriye dema ku gel rastî neheqiyekê/zordariyekê tê, ji bo parastina mafên xwe tîpekî/qehremanekî derdixe pêşberî kesên zalim û neheq (2012: 60). Em dikarin helwesta tîpa Behlûl a li dijî kesên weke Harûnê Reşîd, wezîr, qazî di vê çarçoveyê de binirxînin. Tu hêz û quweta zilamê fileh tune ku li dijî fermana Xelîfe Harûnê Reşîd rabe lewma ji bo bidesxistina mafê xwe berê xwe dide Behlûl (jmr. 30). Îhtîmal e ku pêkenokên weke “Elhemdulillahî rebbil muslimîn” ji hêla civatên filehan ve hatibin hilberîn.

Behlûl rê nade kesên ku diwxazin bi hêza seltenetê zilm û zordariyê bikin. Gava ku wezîrê Harûnê Reşîd dest datîne ser hesinê bazirgan (tacir) û heqê wî nadê; Behlûl vê yekê derdixe holê û heqê hesinê zilamê tacir ji wezîr distîne (jmr. 54).

Di pêkenoka “Ma tu ji bo xewnekê digrî” de Behlûl di mîhraba mizgeftê de razaye, eskerên Harûnê Reşîd tîna wî şiyar dikin. Esker bi potîna xwe li lingê Behlûl dixê, wî şiyar dike (jmr. 7). Digel ku ev vegotin li nav mirovên dîndar belav bûye, çawa çêdibe ku di pêkenokê de eskerên xelîfe (Harûnê Reşîd) bi potîna xwe dikevin nava mizgeftê? Di vê xalê de divê were gotin ku “esker/potîn” sembola hêz û serdestiyê ye. Lê Behlûl sembola kesên jêrdest, hejar û bêqewet e. Li vê derê helwesta li dijî desthilata Harûnê Reşîd jî heye, lewma leşkerên wî tevî potînan ketine nava mizgeftê. Her çiqas ders û peyama sereke ya vegotinê, tiştêkî din be jî meriv dikare bibêje ku di binhişê civaka afirîner a vê vegotinê de dijatiya desthilata Harûnê Reşîd jî heye.

Behlûl, li hemberî hêza îqtîdarê û kesên zilimkar, li kesên lêqewimî xwedî derdikeve. Kesê lêqewimî carinan bazirganek e, carinan gundiyeke e, carinan kesekî ermenî/file ye, carinan jî cihû ye. Kî dibe ferq nake, lewra Behlûl ne alîkarê misilmanan tenê ye. Ew, rasterast li dijî neheqî û bêdaletiyê ye (jmr. 30).

Behlûl baş dizane ku karê birêveberiyê barekî giran e<sup>6</sup>. Kesê birêveber divê di warê edaletê gelekî hişyar be. Heke di nav mirovên di bin birêveberiya xwe de edaletê pêk neîne wê li axretê cezayê vê yekê bibîne. Behlûl ku çend deqeyan di palkursiyê Harûnê Reşîd de rûdinê û ji ber vê yekê têra xwe derban (lêdan) dixwe, bala Harûnê Reşîd dikşîne ser rûniştina di palkursiyê xalîfetiye û encama wî karî (jmr. 38).

Di gelek vegotinan de Behlûlê Dîwane, ji bo Harûnê Reşîd hişyarkerekî jêhatî ye. Bi mînakekê ji Harûnê Reşîd re dide zanîn ku mal, meqam û derfetên dinyayê demkî ne. Xweda van derfetan ji hinekan distîne dide hinekan. Yanî bi gotina Behlûl, Xweda bi dan û stendinê meşxul e (jmr. 33).

Behlûl, bi awayekî “nerm” kirin û tevgerên Harûnê Reşîd rexne dike, şaşî û kêmasiyên wî tîne zimên. Nêrîna Harûnê Reşîd jî bi heman awayî ye. Fikir û pêşniyazên Behlûl, li bal Harûnê Reşîd bi qîmet in. Çi di vegotinên devkî de çi jî di çavkaniyên nivîskî de me nedît ku Behlûl, ji hêla Harûnê Reşîd ve hatiye ceza kirin.

### **3.3. LI GORÎ VEGOTINÊN DEVKÎ KESAYETA BEHLÛL**

Vegotinên devkî ku girêdayî tîpa Behlûl in pirranî di kategoriya pêkenokan de ne. Agahiyên ku ji van vegotinan bêne girtin her çiqas ku nêzîkî aqil bin jî, ji aliyê rastiya dîrokî ve xeyalî ne. Lewra pêkenok, ji aliyê civakê ve têne çêkirin.

Li gorî vegotinên devkî ku me tomar kirine Behlûl, birayê/kekê Harûnê Reşîd e. Ji ber sebebên cuda, xwe li dînîtiyê daniye (bnr. Ev xebat, Behlûl çima xwe li dînîtiyê daniye, r. 30). Behlûl çawa ku xwe li dînîtiyê daniye weke encama vê yekê xwe ji qesr û serayên Harûnê Reşîd jî dûr kiriye û nebûye talibê kêfxweşiya dinyayê (jmr. 19). Darik di nav piyê wî de ye (weke ku li hespê swar bibe) bi zarokan re li sikakan digere (jmr.

---

<sup>6</sup> Jixwe yek ji sebebên xwe li dînîti danîna wî jî ev yek e.

18). Heke di hinek pêkenokan de xwedî mal (xanî), jin û zarok be jî (jmr. 48), li gorî pîrraniya vegotinan Behlûl mirovekî bêkes û bêxwedî ye. Li sikak û xirbeyan dije (jmr. 22), di mîhrabên mizgeftan de radizê (jmr. 7). Ji ber ku bêkes û dîn (!) e gelek caran zarok, carinan jî mezin henekên xwe pê dikin (jmr. 54, 55).

Behlûlê Dîwanê ku bi taybetiyê xwe ve berdevkê çîna jêrdest û hejaran e, daîm bêmal e. Di gel ku birayê wî padîşah (Harûnê Reşîd) e jî, civakê nexwestiyê ku Behlûl bibe maldar û xwedî pere. Behlûl li hemberî malê dinyayê weke mirovekî kor hatiye şayesandin (jmr. 17).

Tîpa Behlûl nabe talebkarê navûdengê dinyayê (jmr. 19). Ne hesp û kerwanên hêştirên wî hene, ne jî qesr û serayên wî. Tenê kerekî wî heye ku debara xwe pê dike (Jmr. 51, 56). Di nêrîna wî de malê dinyayê ne hêjaye tir û fisekê (jmr. 1). Bêkesî, hejarî û belengaziya Behlûl di cilên wî de jî xuyaye (jmr. 62).

Behlûl ne tenê sembola rexnekirin û nerazîbûnê ye, di heman demê de lehengê çareseriyê ye jî. Carinan hazir-cewab e, di cih de meseleyê çarsêr dike; carinan jî bi mînakekê, şibandinekê pîrsgirêkan çareser dike (jmr. 57).

Her çi qas ku Behlûlê Dîwane bi nav “dînik” be jî di nêrîna civakê de, ne dînekî ji rêzê ye. Ji zanayan zanatir e. Lewra em dibînin ku gelek pîrsgirêk bi destê wî têne çareserkirin (jmr. 30, 57), yên derdora wî pê dişêwirin (jmr. 35), bi helwest û tevgerên xwe neheqiyên ji holê radike (jmr. 30, 53, 54), kesên weke Harûnê Reşîd hişyar dike (jmr. 38). Di pêşbirkên zehmet de, ku kes newêre beşdar bibe, pirsan dibersivîne. Heke di encama bersivdayina pirsan de tiştêkî maddî bi destê wî keve, wî malî jî li feqîran belav dike (jmr. 33).

Behlûl, lehengekî bi serê xwe ye. Ne şêwirmendekî wî, ne jî alîkarekî wî heye. Her çiqas carinan ji tiştên nedîtî (jmr.40, 41) haydar be jî ne xwediyê sehr û tilsimê ye. Mucîze û kerametên wî nînin.

Li gorî hinek vegotinan haveynê dînîtiyê li dora tîpa Behlûl tune ye, mirovekî têra xwe zana ye. Yên li dora wî, ji bo çareserkirina pîrsgirêkên xwe pê dişêwirin. Di pêkenoka “Wê çawa xwarin li ser kulekê çê bibe” de zilam têne bal Behlûl da ku şerîeta wan bibire, hikum bide (jmr. 57). Dîsa di vegotina “Li dinyayê rehetî tune” de zilam ji

Behlûl dipirse: “Xoce, te ji vê alemê çi fahm kir?” Ango li gorî vê yekê Behlûl mirovekî wisa ye ku yên li dora wî, bi çavê xocetiyê lê dinêrin ûtiştan jê dipirsin (jmr. 2).

Têkiliya tîpa Behlûl bi Harûnê Reşîd re balkêş e. Behlûl, ji bo çareserkirina pirsgirêkan carinan ji Harûnê Reşîd alîkariyê dixwaze (jmr. 24, 30, 53). Lê ev daxwaz demkî ye û ne ji bo şexsê xwe ye. Di heqê hin xetereyan de wî hişyar dike, bi awayekî nerm şaşiyên wî nîşan dide û rexne dike. Tim di bîra wî tîne ku dinya fanî ye û divê piştî xwe bi mal û meqamên dinyayê girê nede (jmr. 7). Gava ku em li tevahiya vegotinên devkî dinêrin Behlûl weke dostê/destbirakê Harûnê Reşîd derdikeve pêşberî me. Dema ku çend rojan hevdû nebînin Harûnê Reşîd bêriya wî dike û ji xizmetkar û peywirdarên xwe dixwaze ku Behlûl bînin hizûra wî (jmr. 7, 62). Li gorî vegotinan Harûnê Reşîd, ji rewşa birayê xwe Behlûl ne memnûn e. Dixwaze ku Behlûl jî ji kêf û derfetên dinyayê îstîfade bike (jmr. 17, 54), wî li bajarekî bike walî yan jî wazîfeyêke din bide wî (jmr. 53, 54). Lêbelê Behlûl vê yekê qebûl nake.

Carinan Behlûl dixwaze fikrekê bi serê xelkê bixe lê civak wê fikrê fahm/qebûl nake. Lêbelê Behlûl ji ser ya xwe nayê xwar û bi rê û rêbazên xweser (orjînal), bi mînakên şênber fikra xwe bi xelkê dide fahmkirin (jmr. 11, 27, 29).

Taybetiyeke Behlûl a din jî “kenê wî” ye. Behlûl, bi nezanî û xafilîya mirovan dikene. Harûnê Reşîd jî di nav de kesên li dora Behlûl bi vê taybetiyê dizanin. Kêm kesan dîtiye ku Behlûl keniyaye. Lewma gava Behlûl dikene; yên dora wî, sebaba kenê wî dipirsin (jmr. 9, 12).

### **3.4. BEHLÛL ÇIMA XWE LI DÎNÎTIYÊ DANIYE?**

Sedema dîwanetiya/dînîtiya Behlûl, bi qasî ku di xebatên nivîskî de cih girtiye di vegotinên gelêrî de jî hatiye gotin. Hinek ji materyalên ku me ji dora Batmanê bi dest xistine rasterast sedema dîwanetiya Behlûl vedibêjin (jmr. 15, 16). Hinek ji wan jî ne bi vê armancê hatine vegotin lê di nava xwe de bersiva vê yekê dihewînin: “Behlûl, weliyê Xwedê ye. Bo vê qasê xwe li dînatî daniye, li nav zarûkan e. Wek zarûkan xwe daye pêş, lê welî ye, kes nezane” (jmr. 58). Taybetiya giştî ya van vegotinên ev e ku Behlûl bi zanatî, ji bo armancekê xwe li vî halî daniye û ew ne dînekî ji rêzê ye. Li ser vê xalê di vegotinên cuda de sebebên cuda hatine gotin. Em dikarin van sebebên bi vî awayî rêz bikin:

1. Behlûl li ser wesiyeta/şîreta bavê xwe fêhm kiriye ku karê xalîfetiye, barekî giran e û ji bo ku -piştî mirina bavê xwe- nebe xelîfe xwe li dînîtiye daniye (jmr. 15).
2. Zarok sembola bê gunehiyê ne. Ji ber ku Behlûl dixwest heşra wî bi zarokan re be, xwe li dînîtiye datanî û diçû di nav zarokan de dileyîst (jmr. 35).
3. Behlûl weliye Xwedê bûye. Ji ber vê yekê xwe li dînîtiye daniye û ketiye nav zarokan da ku xelk bi vê taybetiya wî nizanibin (jmr. 58).
4. Behlûl weliye Xwedê ye û ji bo welîtî jê neçe; kibra (qurtî) xwe şikandiye, nefsa xwe piçûk kiriye. Di vê çarçoveyê de xwe li dînîtiye daniye, tim li nav zarokan geriyaye û bi wan re leyîstiye (jmr. 16).

## ENCAM

Ji çend çavkaniyên nivîskî û ji vegotinên devkî ku me berhev kirine em gihîştin hinek encaman. Encamên ku me bi dest xistine ev in:

1. Behlûlê Dîwane/Dana (zana) ku ji edebîyata rojhilat tîpeke gelêrî ye û têra xwe berbelav e. Li nav ereb, faris, tirk û kurdan pêkenokên Behlûl hatine tomarkirin û nivîsandin.
2. Dema berhevkirina pêkenokan me tesbît kir ku pêkenokên li ser tîpa Behlûl jî ji ber ku di wext de nehatina tomarkirin/nivîsandin hatine jibîrkin.
3. Çend gotar li ser Behlûl û tîpên dişibine Behlûl (Xoce Nesredîn, Cuha, Bektaşî) hatine nivîsandin, lêbelê weke ku me -bi kurdiya kurmancî -bi riya vegotinên devkî tîpa Behlûl bi dûrûdirêjî nixand, tu xebat nehatine çêkirin.
4. Li gorî nêrîna giştî ya vegotinên devkî ku me tomar kirine, Behlûl birayê/kekê Xelîfeyê Ebbasiyan Harûnê Reşîd e, lê ev ne rastiyeke dîrokî ye. Lewra ji çavkaniyên nivîskî em dizanin ku ew ne birayê hev in.
5. Behlûl ji ber sedemên cuda xwe li dînîtiyê daniye û destê xwe ji karûbarên dinyayê kişandiyê. Lewma jî navê wî weke “Behlûlê Dîwane” belav bûye. Li gorî gelek vebêjêran Behlûl, “weliyê Xwedê” ye.
6. Behlûl ne dînekî/dîwaneyekî ji rêzê ye. Di eslê xwe ew “Behlûlê Dana/Zana” ye. Ji zanayan zanatir e, yê derdorê tên pê dişewirin û ji bo çareserkirina pirsgerêkên xwe alîkariyê ji wî dixwazin.
7. Tîpa Behlûl di hemû pêkenokan de aktîf e. Vegotin li gorî tevger û helwesta Behlûl didomin.
8. Wekî ku tê zanîn civak; nêrîn, hêvî, pêşniyaz, rexne û nerazîbûnên xwe bi riya folklorê dide der. Wek mînak civak, bi riya çîrokan başî û nebaşiyê bi zarokan dide zanîn û wan perwerde dike. Heman qaîde ji bo pêkenokên girêdayî tîpa Behlûl jî derbasdar e.
9. Jimara pêkenokên li ser tîpa Behlûl û çîna rêvebaran cihekî girîng digrin. Gel dema ku bixwaze neheqiyekê bêje, rexneyekê li birêveberan bike û qeweta wî tunebe/ nikaribe vê yekê bike tîpeke gelêrî derdixe pêşberî kesên neheq û zalim. Bi wî awayî heqê xwe distîne, heyfa xwe hiltîne. Têkiliya Behlûlê Dîwane û Harûnê Reşîd gelek caran di vê çarçoveyê de ye.



10. Di encama nirxandina vegotinên devkî ku me tomar kirine de, bi awayekî zelal me dît ku Behlûl tîpekî gelêrî ye. Lewra di nîvenda hemû vegotinan de Behlûl heye, hemû helwest û tevgerên wî li dora hêvî û daxwazên xelkê teşe digrin. Xisleta Behlûl sabît e, helwesta wî li gorî menfeata şexsî naguhere. Tim bi aliyê xwe yê civakî ve dedikeve pêş.
11. Li ser çavkaniyên nivîskî me tespît kir ku pêkenoka me li ser navê Behlûl tomar kiriye, di çavkaniyên nivîskî de, ji bo Xoce Nesredîn an ji bo Bektaşî jî derbas dibe. Dêmek hêvî, rexne û nerazîbûnên civakan ên hevpar hene û her civak ji bo nimandina van tiştan ji nav xwe tîpekî derdixe.
12. Behlûl sembola hêza manewî û kesên lêqewimî (mexdûr) ye. Li dijî hêza maddî (padîşah, wezîr, qazî) her dem serkeftî ye.
13. Di vegotinan de Behlûl -bi destê civakê- hejar û bê mal hatiye şayesandin. Di gel ku, li gorî pêkenokan, birayê wî (Harûnê Reşîd ) xwedî mal û seltene e jî, ji maldariya dinyayê re çavgirtî ye.
14. Behlûl, bi awayekî “nerm” kirin û tevgerên Harûnê Reşîd rexne dike, şaşî û kêmasiyên wî tînê zimên. Nêrîna Harûnê Reşîd jî bi heman awayî ye. Fikir û pêşniyazên Behlûl, li bal Harûnê Reşîd bi qîmet in. Çi di vegotinên devkî de çi jî di çavkaniyên nivîskî de me nedît ku Behlûl, ji hêla Harûnê Reşîd ve hatiye ceza kirin.
15. Civakê nêrîn û tecrûbeyên xwe yê sedsalan bi riya vegotinên devkî nimandine. Bi heman armancê, di nava pêkenokan de, gotinên pêşiyar jî hatine bikaranîn.
16. Behlûlê Dîwane ku di eslê xwe de mirovekî zana û şareza ye, beşdarî pêşbirk û bersivandina mamikan jî dibe. Tiştê ku ji van pêşbirkan bi destê wî dikeve jî dide feqîran.
17. Ji pêkenokan tê fahmkirin ku civak, ji devê Behlûlê Dîwane, endamên xwe hişyar dike, pirsgirêkên endamên xwe çareser dike, li dijî birêveber û îqtîdaran endamên xwe diparêze. Di vê çarçoveyê de vegotinên devkî berhemên daxwaza xweparastina civakê ne.
18. Ji vegotinên devkî tê fahmkirin ku divê Behlûl weke “kesayeteke dîrokî” neyê nirxandin. Behlûlê Dîwane, tîpeke gelêrî ye û li gorî vegotinên gelêrî teşe girtiye.
19. Têkiliyeke xurt di navbera çanda îslamî û tîpa Behlûl de heye. Di gelek pêkenokan de li ser awayê pêkanîna îbadetan, li ser fanîbûna dinyayê, li ser heqî û

neheqiyê tîpa Behlûl meqbûlê civakê ye. Şaşî û kêmasiyên misilmanan vedibêje. Bi riya hedîsên Hz. Muhammed şîretan li misilmanan dike. Ne tenê mafên misilmanan, mafên kesên nêmisilmanan jî diparêze.

20. Ji xebatên nivîskî me tespît kir pêkenokên tîpa Behlûl; li nav kurd, ereb, faris û tirkên tene vegotin. Dibe ku sedema vê yekê çanda îslamî be. Lewra taybetiya hevpar a van miletan baweriya îslamê ye. Ji bo van miletan çanda îslamî çavkaniyeke sereke ye û ev millet cîranên hev in.
21. Bêhtirê pêkenokên girêdayî tîpa Behlûl, pêkenokên kevneşopî (Traditional anecdote) ne. Di van pêkenokan de mîna pêkenokên nûjên (Modern anecdote) unsura pêkeniyê ne li pêş e. Armanca vegotinên tîpa Behlûl; dayîna dersekê, fikrekê, hişyariyekê, rexnekirina neqenciyekekê, nîşandana kêmasiyekekê ye.

## ÇAVKANÎ

- Acun, İ. (Öğretmen), 31 Ekim 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Kızıltepe.
- Aka, İ., H. Dursun Yıldız, vd. (1986) *Doğuştan Günümüze Büyük İslam Tarihi (DGBİT)*. C. 3. İstanbul: Çağ yayınları
- Akdeniz, S. (2007). “Temel Fıkralarında Yardımcı Erkek Oyuncu Dursun’nun İşlevi”. *Milli Folklor Dergisi*, 75, 66-71.
- Akkuş, M. (2003). “Doğu Kültüründe Nasreddin Hoca Tipinin Benzerler”. *Kırgızistan-Türkiye Manas Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 7, 57-62.
- Ağırman, S. (İşçi), 02 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Nusaybin.
- Aslan A. (İmam), 15 Aralık 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Aytekin, E. (2015). *Bilgin Divane Behlül Dana*. İstanbul: Kayıhan Yayınları
- Basutçu, A. S. (İmam), 08 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Kozluk.
- Başaran, D. (Grafiker), 03 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Başaran, İ. (Emekli), 30 Ekim 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Gercüş.
- Başaran, T. (2017). “Şîretkerê Serdemekê: Behlülê Zana/Dîwane”. *Afrazde Dergisi*, 6, 16-17.
- Başaran, V. (Memur), 30 Ekim 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Gercüş.
- Bayat, R. (Tüccar), 13 Mart 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Şırnak.
- Becırmani, A. (Mela), 28 Ekim 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Boğadır, C.(Tüccar), 04 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Canan Karakaş, A. (2013). “Paylaşma Tutumlarının Sınav Kaygısı-Gelecek Kaygısı ile İlişkisi (Sakarya İli Örneği)”. *İnsan ve Toplum Bilimleri Araştırma Dergisi*, C. 2, 1, 135-157.
- Çelik, A.(İşçi), 01 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Çiftçi, H. (1998). “Klâsik İslam Edebiyatında Hiciv ve Mizah”. *Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, 10, 139-162.

- Dayan, H. (İmam), 09 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Demir, E. (Emekli), 11 Nisan 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Şırnak.
- Demir, M.Ş. (Emekli), 27 Ocak 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Demirtaş, M. (İmam), 05 Şubat 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Doğan, N. (İmam), 24 Nisan 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Sason.
- Doyar, H. (Öğretmen), 31, Ekim 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Kozluk.
- Duman, M. (2012). “Halkın Kahramanı Nasreddin Hoca Timur’a Karşı”. *Folklor/Edebiyat Dergisi*, 69, 59-70.
- Gültekin, S.(İmam), 30 Ekim 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Gercüş.
- Güneş, M.(Tüccar), 30 Ekim 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Gercüş.
- Hamarat, Ş.(Çiftçi), 07 Kasım 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Kozluk.
- İvgin, H. (2005). *Deli Görünümlü Akıllı Behlül Danende*. Ankara: Yurt Kitap Yayın
- Kalkandelen, H. (2012). “Fars Edebiyatında Behlül Hikâyeleri”. *Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 37, 47-64.
- Kanar, M. (2013). *Farsça Türkçe Sözlük*. İstanbul: Say yayınları
- Kaplan, M. (2016). *Türk Edebiyatı Üzerinde Araştırmalar-3/Tip Tahlilleri*. İstanbul: Dergâh Yayınları
- Karataş, A. (1999a). “İdil Folklorunda Behlül-1”. *ODTÜ-THBT Halk Bilimi Dergisi*, 11, 80-87.
- Karataş, A. (1999b). “İdil Folklorunda Behlül-2”. *ODTÜ-THBT Halk Bilimi Dergisi*, 12, 13-15.
- Karataş, T. (2007). *Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Akçağ Yayınları
- Kavak, E. (İşçi), 31 Ekim, 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Kozluk.
- Kaya, D. (2010). *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Akçağ Yayınları
- Kılınç, N. (Tüccar), 22 Ocak 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.

- Koyun, H. (İmam), 11 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Köprülü, M. F. (2004). *Nasrettin Hoca*. Ankara: Akçağ Yayınları
- Nazar, M. (Tüccar), 13 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Niyazmend, A. (2012). *Henek û Çîrokên Şîrîn ên Behlûlê Dîwane*. (Werger ji farisî: M. İzzet Çixsî). İstanbul: Weşanên Nûbihar
- Sadinî, X. (2012). *Ji Kelepora Kurdi Pêkenok*. İstanbul: Weşanên Nûbihar
- Sakaoğlu, S. (2013). “Geleneksel Fıkra-Modern Fıkra”. *Milli Folklor Dergisi*, 97, 70-75.
- Sever, M. (2007). “Ziya Gökalp’in Masallarında Tipler”. *Milli Folklor Dergisi*, 74, 29-33.
- Önür, N. (Doktor), 10 Kasım 2016, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Sevim, H. (Tüccar), 30 Ocak 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Batman.
- Şingâr, C. (2014). “Çîrokên Behlül Ji Herêma Botan (1)”. *Kovara Nûpelda*, Jimar:17-18
- Türkmen, F. (2013). *Nasreddin Hoca Lâtifeleri -Seyyid Burhaneddin Çelebi Burhaniye Tercümesi-*. İstanbul: Büyüyenay Yayınları
- Uludağ, S. (1992). “Behlül-i Dâna”. *Diyanet İslam Ansiklopedisi (DİA)*. C.5, 352-353. İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları
- Qur’ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî* (Werger: Hüseyin Gündüz (Êsî)) Ankara: Weşanên Serokatiya Karûbarên Diyanetê. 2015
- War, R. (2013). *Behlülê Dîwane*. İstanbul: Weşanên Ava
- Yıldırım, D. (2016). *Türk Edebiyatında Bektaşî Fıkraları*. Ankara: Akçağ Yayınları
- Yiğiter, M. (Emekli), 16 Kasım 2017, “*Behlül Fıkraları*” Konulu Görüşme, Kozluk.
- Yücel, A. (1990). “Mehmet Tevfik ve Hazine-i Letaif”. *Milli Folklor Dergisi*, 7, 14-17.

## PÊVEKÊN XEBATÊ

### PÊVEK 1

#### Vebêjerên Vegotinên Devkî

NAV Û PAŞNAV	SALA JIDAYIKBÛNÊ	WELAT	KAR	DEMA HEVPEYVÎNÊ	CIHÊ HEVPEYVÎ NÊ
Halil Dayan	1938	Sêrt/ Erûh	Mela	09.11.2016	Batman
Emin Demir	1940	Şirnex/ Hezex	Teqawit	11.04.2017	Şirnex
A. Samet Basutçu	1940	Batman/ Hezo	Mela	08.11.20016	Kozluk
Muhittin Demirtaş	1947	Sêrt / Kurtalan	Mela	05.02.2017	Batman
Medine Yiğiter	1948	Batman/ Hezo	Teqawit	16.11.2016	Kozluk
M. Şakir Demir	1951	Batman/ Qubîn	Teqawit	27.01.2017	Batman
Şerif Hamarat	1952	Batman/ Hezo	Cotkar	07.11.2016	Kozluk
Ahmedê Bêcirmanî	1953	Batman/ Kercews	Mela	28.10.2016	Batman
Hasan Koyun	1953	Batman/ Kercews	Mela	11.11.2016	Batman
Musa Güneş	1958	Batman/ Kercews	Tacir	30.10.2016	Kercews
Nezir Kılınç	1962	Batman/ Kercews	Tacir	22.01.2017	Batman
Reşat Bayat	1962	Şirnex	Tacir	13.03.2017	Şirnex
İsmet Başaran	1965	Batman/ Kercews	Teqawit	30.10.2016	Kercews
Mahfuz Nazar	1966	Batman/ Hezo	Tacir	13.11. 0216	Batman
Cüneyt Boğadır	1969	Diyarbakir/ Farqîn	Tacir	04.11.2016	Batman
Salih Gültekin	1969	Batman/ Kercews	Mela	30.10.2016	Kercews
Seyfettin Ağırman	1970	Mêrdîn/ Nisêbîn	Karker	02.11.2016	Nisêbîn
Adnan Aslan	1976	Batman/ Kercews	Mela	15.12.2016	Batman
Veysi Başaran	1976	Batman/ Kercews	Karmend	30.10.2016	Kercews
Habip Sevim	1977	Batman/ Kercews	Tacir	30.01.2017	Batman
Nusret Doğan	1977	Batman/ Sason	Mela	28.04.2017	Sason
Davut Başaran	1978	Batman/ Kercews	Grafiker	03.11.2016	Batman
Engin Kavak	1979	Batman/ Hezo	Karker	31.10.2016	Kozluk
Halil Doyar	1980	Batman/ Hezo	Mamoste	31.10.2016	Kozluk
İlhan Acun	1986	Mêrdîn/ Rişmil	Mamoste	31.10.2016	Mêrdîn/ Qoser
Abdurrezak Çelik	1989	Batman/ Kercews	Karker	01.11.2016	Batman
Nihat Önür	1990	Batman/ Qubîn	Doktor	10.11.2017	Batman

## PÊVEK 2

### METNÊN VEGOTINÊN DEVKÎ

#### 1. Ne hêjaye tir û fisekê

Dibê Harûn Reşîd qesreke gelekî xweşik çêkir. Heta bi derî û çeşmeyên qesrê jî, ji zîv û zêr çêkirin. Harûn Reşîd ji Behlûl re go:

- Ev qesr hejaye çiqasî?
- Ne hêjaye tir û fisekê.

Ji ber vê gotina Behlûl, Harûn Reşîd xwe xeyîdand. Behlûl go: “Ya Rebî tu bike go ba ji ber birayê min neçe”! Du sê rojan ji ber ku destava Harûn Reşîd nedihat û ba ji ber nedîçû zik lê bû heban. Harûn Reşîd, dikir ji vî derdî bimre. Harûn Reşîd go “Bakine birayê min [Behlûl], ez ê li ber destê wî tobe bikim”. Piştî ku li ber destê wî tobe kir, Behlûl jî jê re dua kir û Xweda li Harûn Reşîd hate rahmê. Li ser vê yekê Harûn Reşîd go: “Birayê min gerçekten [bi rastî jî] ev qesir ne hêjaye tir û fisekê”.

**Vebêjer: İsmet Başaran**

#### 2. Rehetî li dinyayê tune

Rojekê Behlûl diçe şehrekî li serê goşeyekî disekine [li xelkê temaşe dike]. Dinêre ku hinek bi milê rastê ve, hinek bi milê çepê ve, hinek bi jor ve, hinek bi jêr ve diçin. Yek tê, ji Behlûl re dibê:

- Xoce tu li çi dinêrî?
- Welleh ez ji xwe re li vê alemê dinêrim.
- Xoce, ji vê alemê te çi fahm kir?
- Welleh lawê min tu dibînî, ev alema ha, her yekî bi derekê ve diçin. Hemî jî li yek tiştî digerin.
- Ê xoce ez xulamê te, ew tişt çi ye?
- Welleh ew tişt jî tune.
- Xoce çawa ev alem li tiştêkî digere û ew tişt jî tune? Ew tişt çi ye?
- Resulê Xweda (sallalahû aleyhî wesellem) gotiye “La rehetê fî dunya (Rehetî li dinyayê tune)”. Ev tev jî li rihetiyê digerin lê rehetî li dinyayê tune.

**Vebêjer: M. Şakir Demir**

### 3. Kengî be wê were vê derê

Rojekê diz dikeve mala Behlûl. [Piştî ku Behlûl pê dihise], diçe di gîrîşa [devê] mezal [goristanê] de disekine. Ê go di wir re derbas dibin, dinêrin ku çend saetan Behlûl li wir sekiniye. Jê dipirsin:

- Birayê Behlûl li te xêr e, ji şeveqa Xwedê ve tu li vê derê sekiniye?
- Wellehî diz ketiye mala min, ez li hêviya diz im.
- Yaw diz ketiye mala te, tu here li mehelê bigere, bîpirse ka dizê te kî ye.
- Kengî be ew diz ê were vê derê, ciyê wî ev der e.

**Vebêjer: Davut Başaran**

### 4. Milkê me mezal e

Rojekê Harûn Reşîd gote Behlûl: “Birayê min, were em ê herin li nav milk û araziye xwe bigerin”. Dilê wî tune bû li nav milk û araziya bigere, lê Harûn Reşîd, ew qanî kir. Li hespê xwe siwar bûn û çûn. Heta ber êvarê li nav milk û araziya geriyan. Gava vegeriyan malê, hatin guhe mezal, Behlûl go: “Ji sibê ve em belesebeb digerin, va ye milkê me ev der e”.

**Vebêjer: Nezir Kılınc**

### 5. Mala me ya heqîqî

Rojekê Harûn Reşîd, du kîlo goşt dikire, dibe dide Bahlûl û dibê:

- Here vî goştî bibe malê, bere ji me re çêkin.
- Ez bibim mala me heqîqî yan bibim mala me ya derewîn?
- Bibe mala me ya heqîqî, ma tê bibe kur?

Ew [Behlûl] jî diçe du kîlo goşt dibe nav mezal [goristanê]. Êvarî tîn şîvê dixwin, goşt tune. Harûn Reşîd dibê:

- Ma ne min bi te re goşt şandibû malê, qey te çikir jê?
- Ma te go bibe mala me ya heqîqî? Mala me ya heqîqî ne ew der e. Mala me ya heqîqî mezal e.

**Vebêjer: Veysi Başaran**



## 6. Her kes agirê xwe bi xwe re tîne

Rojekê Harûn Reşîd û dewlet erkanî [pêşberên dewletê] şeveqê zû li nav bajêr digirin. Dinêrin ku Behlûl ji cihkî ve tê. dîqetê wan dikşîne, dibêjin ka em jê pirs kin. Harûn Reşîd dibê:

- Ya Behlûl, xêr e; tu vê saetê ji kur tê?
- Ez ji cahnemê têm. (Dibêjin “Behlûl e, dîsa dînatîyê wî girtiye”)
- Ê xêr e, tu çûyî cahnemê çi bikî?
- Welle li malê agir lazim bû. Min jî go agir li cahnemê zahf e, ez ê herîm ji cahnemê agirnî bînim.
- Ê te agir dît, ji malê re agir anî?
- Na welleh, ez çûm; lê ji min re gotin: “Agir tune ye. Her kes agirê xwe ji dinyayê tîne”.

**Vebêjer: Halil Doyar**

## 7. Ma tu ji bo xewnekê digirî?

Rokê Harûn Reşîd dibê: “Herin Behlûl bînin, bila were em ê ji xwe re henekan bikin, bêhna xwe berdin. Mi bêriya wî kiriye”. Du heb esker diçin ku Behlûl bînin, digerin nagerin wî nabînin. Harûn Reşîd dibê: “Herin bigerin, mitleqa di camiyekê de, di mîhrabekê de raza ye”.

Dîsa diçin digerin, dinêrin ku wa ye Behlûl, di mîhraba camiyekê de raza ye. Her du esker, diçin bi potînên xwe li bin lingên wî dixin û dibêjin: “Behlûl, rabe rab”!

Wextê go Behlûl şiyar dibe dinêre ku du esker ser serê wî re sekinî ne, digirî. Bi wî halî Behlûl tînin. Harûn Reşîd, dibê:

- Behlûl, çima wilo bê hal î, madê (mikûsê) te kiriye û tu digirî?
- Erê birako, di xew de min dît ez siltan bûm, tac û textê min hebûn, eskerên min hebûn, xezîneya min hebû... Eskerên te hatin ez ji xewê rakirim, tev ji destê min çûn.
- Behlûl, malnexerab. Navê wê xewn e. Ma tu ji bo xewnekê digirî?
- Erê erê, ya min xewn bû. Ma çi ferq di navbera selteneta min û te de heye?

**Vebêjer: Seyfettin Ağırman**

## 8. Xweda heqiyê heq dike

Behlûl her roj radibe dikeve sûkê û bi dengê bilind dibê “Xwedê heqiyê heq dike” û her dîçe û tê. Dîsa rojekê eynî welê digere. Li kolanê zelamek, yekî dîkuje û kerikê dixê destê Behlûl û direve. Milet kom dibe, dibê “Behlûl te çi kir” ? Behlûl di cihê xwe de wisa dimîne, nizane wê çi bêjî. Hema radibin wî dibin, mahkeme dikin. Dibêjin: “Te qetil kiriye em ê te bixeniqînin”.

Dihilawîsîn, kindir davêjin stûyê wî. Kef bi ser devê Behlûl dikeve. Ew zelumê ku yek li sûkê kuştiye jî li wê derê ye. Dilê wî pê dişewite, dibê: “Ka wî bînin xwar, welleh ne wî kiriye, min kuştiye”.

Behlûl, datînin erdê heta heşê wî tê serê wî. Dibêjin:

- Behlûl te dîgo “Xweda heqiyê heq dike”, lê hema [hindik mabû] me tu dixeniqand.
- Jixwe wê heq bike, lê heta heq bike kef ê bi ser devê me keve.

**Vebêjer: Reşat Bayat**

## 9. Xweda bi heqî dike yan nake

Dibê Behlûl bi rêkê de çû, nert ku waye cenazeyek li erdê ye. Behlûl kêra xwe derxist û ser serê cenaze re sekinî. Dibê kerwanek di wir re hat, ji nav kerwan yekî go “Behlûl te çima ev însan kuştiye, ma ji Xwedê ne guneh e” ? Behlûl jî kêra xwe dihejîne û li cenaze dinêre. Werhasil kerwan diçe, xeberê dide hakim [qadî]. Radibin wî dibin mahkemê, jê re dibêjin “Behlûl te çima ev însan kuştiye” ? Behlûl dîsa radije kêra xwe û xeber nade. Mahkeme qerara berdana Behlûl dide. Li ser vê qerarê Behlûl dikene. Yên li mahkemê jê dipirsin:

- Te çima heta vêga deng nedikir, xeber nedida lê tu niha dikenî?
- Min go ka bê Xweda bi heqî dike yan nake.

**Vebêjer: Musa Güneş**

## 10. Guyê hişk bi kesî ve nazeliqe

Yekî misilman û yekî xeyrîmislim cîranên hev in, rojekê radibine hevdi. Ê file radibe yê misilman dîkuje. Zaman tê derbas dibe, rokê kurê wî [yê misilman] dibê:

- Dayê, bavê min çi bû jê?

- Kurê min, bavê terehma Xwedê kir çû.
- Na yadê na, ka ji min re bêje; bavê min çawa mir?
- Welleh kurê min hal û mesele wiha ye: Bavê te û yekî file rabûne hev. Kevirek avîte bavê te, li kafê [serê] wî ket. Bavê te [bi wî kevirî] rehma Xwedê kir.

Piştî diya wî vê kilîmê [gotinê] jê re dibêje radibe diçe malê, ji pîreka xwe re dibê “Ez ê îro herim heyfa bavê xwe hilînim” û diçe peşîya yê file. Xencera wî di ber de ye, ba dike yê file:

- Filan kes, îro bêminetî ye; ez hatime te, ez ê te bikujim.
- Waa, tu dîn bûyî lawo, ma tu har bûyî?
- Ê ma tu har bûbû ku te bavê min kuşt!

Ê file hey çiqas dibê “Min bavê te nekuştîye” jî qebûl nake, dibê “Bi Xwedê te bavê min kuştîye”. Dikeve ser dilê yê file, wî dikeve. Dinêre ku Bahlûl ji wir de tê. Bahlûl dibê: “Kuro kuro...” Hema xencera xwe di laşê yê fileh de dihêle û direve, baz dide. Bahlûl diçe li ser cenazê wî disekine, dinêre go xencer di laşê wî de ye. Xencerê jê dikşîne, piyekî xwe davêje vî alî, piyekî xwe davêje wî alî û ser serê cenaze disekine. [Behlûl], dinêre ku çend heb esker ji wê ve tên. Esker dibê:

- Kê ev kuşt? Behlûl dibê:
- Min kuştîye.
- Te kuştîye?
- A [Erê]

Bi qirika Behlûl digirin, wî davêjin hepsê. Yê misilman jî tê malê, weke pelê çilo direale [dilerize]. Pîreka wî dibe:

- Kuro li te xêr e, çima tu wilo direale?
- Bi Xwedê min heyfa bavê xwe hilanî. Kesekî jî min nedî, lê Bahlûlê dîn min dî; ez ditirsim ku li min mikur bê.

Lê dixin bi qirika Bahlûl digrin, Bahlûl dixin hepsê. Go Bahlûl dixine hepsê, roja din delêlî [tella] bi nav şêher dikeve: “Hêêê, Behlûl duh yekî file kuştîye û ketîye hepsê”. Pîreka yê misilman dibê:

- Filan kes te go min yê file kuştiye, min heyfa bavê xwe hilaniye. Wa ye Behlûl girtine, xistine hepsê.
- Hermet welle mi kuştiye.
- Naxwe wekê te kuştiye, rabe here bêje eskeriyê “Heyra min kuştiye, çima win vî însanî digirin”. Radibe lê dixê diçe mehkemê, dibê “Heyra welleh min vînê file kuştiye û Behlûl xistiye stûwê xwe”. Radibin Behlûl derdixine mehkemê û jê dipirsin:
  - Bahlûl, çima te digo mi kuştiye?
  - Heyra gava win hatin ez li ser cenaze bûm, ez ê bêjim kê kuştiye? Ez bêjim, mi nekuştiye jî boş [bêfêde] e. (Piştî ku Behlûl ji hepsê dertê, hepsî badikinê)
  - Bahlûl, Xwedê ji te razî be. Tu însanekî alîxwedê ye, ji me re dia bike; em bê sunc û bê sebeb ketine vê derê.
  - (Destê xwe dihejîne) Tew tew... Guyê hişk bi kesî ve nazeliqe.

**Vebêjer: Nezir Kılınç**

### **11. Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe (I)**

Rojekê Behlûl ji xwe re digirî. Hevalê wî go:

- Te xêr e Behlûl, çima tu digirî?
- Ez ditirsim ku bi agirê Harûn Reşîd bişewitim. Vê tadê, zilmê, neheqiyê li ser serê millet dike. Ditirsim ku ez jî bi agirê wî bişewitim.
- Na na, negirî. Ka here qesabxanê binêrê.

Behlûl çû qesabxanê. Dît ku mî bi piyê hilawestiye, bizin bi piyê xwe hilawestiye. Kêfa wî hat, ji xwe re go: Dêmek her kes ji gunehên xwe mesul e. Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe; her kes mêvanê amelê xwe<sup>7</sup>.

**Vebêjer: Halil Dayan**

---

<sup>7</sup> Li gorî M. Şakir Demir, Behlûl di ber di ber qesabxaneyekê re derbas dibe. Dinêre ku mî bi piyê xwe bizin bi piyê xwe ve daleqandîye, ji xwe re dikene. Zilamê qesab dibê “Behlûl çima tu dikenî”? Behlûl dibê “Ez ditirsiyam ku bikevim agirê Harûn Reşîd; lê halbukî mî bi piyê xwe bizin bi piyê xwe, herkes li gorî emelê xwe”.

## 12. Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe (II)

Harûn Reşîd rokî go “Ê ku bibîne Balûlê Dîwane bikine, çi ji min bixwaze ez ê bidimê”. Îcar xelkê taqîba Balûl dikirin, merak dikirin, ka wê Balûlê dîwane çawa bikene. Rojekê yek hate bal Harûn Reşîd, go “Ya Harûn Reşîd! Welleh min dît, îro Balûl keniya”. Harûn Reşîd go “Herin Balûl bigirin bînin cem min”. Çûn Balûl girtin anîn cem wî. Harûn Reşîd go:

- Balûl tu îro çima keniyayî?
- Dev ji min berde.
- Ne welleh tu wê bêjî çima tu keniyayî.
- Welleh min ewqasî duşunce fikir [difikirîm], ji ewqas zilm û zoriya ku te li xelqê fikir, min dîgo mutlaq ez ê li axretê ceza bikşînim. Lê îro ez di ber qesab re derbas bûm. Min dî ku bizin bi piyê xwe daleqandî ye, mî bi piyê xwe daleqandî ye, conga bi piyê xwe daleqandî ye. Lewma kena min hat. Min ji xwe re go, “Ya Rebbî çok [gelekî] şikir ku ez ji zilma Harûn Reşîd ne sorimlî [berpirsyar] me. Dêmekî li dinya kî çi bike, wê hesaba xwe bide”.

**Vebêjer: Nusret Doğan**

## 13. Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe (III)

Li nav millet tê gotin ku her kesek ji xwe berpirsyar e. Lewma jî millet dibê “Kes nakeve qebra kesî, mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe, her kes li gorî emelê xwe”. Behlûl, li qarşî [dijî] vê fikrê derdikeve; lê bi serê milletê nakeve. Behlûl radibe rokê pezekê serjê dike, lê nava wê vala nake û di nîvê şehre de dialiqîne. Havîn e, dinya germ e. Saetek du saet çiqas roj derbas dibe, bêhn dikeve pezê. Herkes rahatsız [aciz] dibe. Millet jî tê ba Harûn Reşîd (Behlûl jî abê Harûn Reşîd e). Millet dibê “yaw abê [kekê] te, pezek serjêkiriye û li nav bajêr daleqandiye. Behna genî ketiye hemû derê, mirov nikare di ber re derbas bibe”. Harûn Reşîd, radibe gazî Behlûl dike, dibê:

- Çima te tişteki wisa kiriye, millet gazina ji tê dike.
- Millet dibê “Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe, her kes li gorî emelê xwe”. Madem wisa ye, millet çima rahatsız dibe?

**Vebêjer: Engin Kavak**

#### 14. Nexwestî nede

Zilamek bû misafirê Behlûl. Behlûl, kêra mêvan dît ku kêrekê gelekî bi qîmet e. Mêvan go:

- Behlûl, ma em neçin ba civata Harûn Reşîd?
- Belê, em ê herin lê kuro nexwestî tişteki nede. Dema ku te da bikêrî xwe were.

Behlûl û mêvanê xwe çûne civatê. Lî civatê şebeş şikandin, gotin “Kêr, bi kê re heye”? zilamê misafirê Behlûl go “Va ye ya min heye”. Halbukî Behlûl gotibû “nexwestî nede”. Gava Harûn Reşîd kêr dît, gotiye “Welle ev kêr, kêra bavê min e, te ev kêr ji ku derê aniye”? Zîlam, ma sekinî, nezan e. Rabû gotin:

- Behlûl, em ê mêvanê te bigirin.
- Welleh hun mêvanê min nagirin
- Çima?
- Heta sibê ez ê wî ji we re bînim, îro mêvanê min e.
- Yahu tu Behlûl î, tê şîreteki lê kî. Vêca em nikarin xwe jê xelas kin.
- Ne ne, ez soz didim ku pê re xeber nedim<sup>8</sup>.

Rabû mêvanê xwe bir çû malê. Dema çû malê [kerê wî hebûye], rahiştiye dar, daniye kerê [lêxistiye]. Ji kerê re gotiye: “Kero, min negot “nexwestî nede”? Tu yê sibê herî mehkemeya Harûn Reşîd, siltanê xedar e, wê serê te jêke. Kero tu yê çî bikî? Tu yê bêjî ‘ev kêr, li ser termê bavê min bû. Haa dêmekî Harûn Reşîd, qatilê bavê min tu yî. Heke tu wê xeberê nebêjî, welleh wê serê te jêkî”.

Dema mêvan çû mehkemê go “Harûn Reşîd, ev çend sal e, ez jî li te digirim. Ev kêr li ser cenazê bavê min bû. Dêmekî te bavê min kuştiye”! Rabû li ser vê yeke [xwîna bavê xwe] xezîneya Harûn Reşîd jê sitend.

**Vebêjer: Ahmedê Bêcirmanî**

---

<sup>8</sup> Li gorî Şakir Demir Behlûl dibê: “Heyra sozê Xwedê ez şîreta li şexsê wî nakim”. Behlûl kumê xwe datîne ser çoka xwe û pê re diştexile, şîretan li kum dike: “Gava sibê tu çûyî Harûn Reşîd tu mehkeme kirî kumo! Bêje welle rast e, ev kêra hanê (bavê min kuştiye) min li ser cenazê bavê hilaniye”.

### 15. Behlûl, çima xwe li dînîtiyê daniye? (I)

Berî here rehmetê, bavê Harûn Reşîd û Behlûl, dibê “Behlûl lawo, xelîfetî karekî zor e; tu nikarî bikî. Rojekê du zilam hatin hizura min. Yek misilman, yek jî file bû. Ez li ber siyê bûm û her du zilam li ber tavê bûn. Min çavî yê misilman kir da ku were ber siyê. Yanê di dewra xwe de heke min neheqî kiribe, ev e neheqîya min e. Îca Behlûl lawo, dema ku ez mirim, heke çavê min ê rastê rijîya be dêmekî xelîfetî tişteki pir zor e. Tu li xelîfetiyê nebe xwedî”. Îca dema ku bavê wan dere [diçe] rehmetê dinêre ku heqeten çavê wî yê rastê rijiyaye. Îca Behlûl dibê “Welleh dêmekî xelîfetî karekî zor e”. Behlûl, radibe ji bo ku nebe xelîfe, xwe li dînati datîne. Dar dixê nav lingên xwe û li ser benderan digere.

**Vebêjer: İlhan Acun**

### 16. Behlûl, çima xwe li dînîtiyê daniye? (II)

Behlûl weliyekî Xwedê bûye. Xwe li awayî [dînîtiyê] daniye ji bo xelk nizanibe weliyê Xwedê ye û welîti jê neçe. Ji bo kes nizanibe weliyê Xweda ye, tim di nav zarûkan de geriyaye bi wan re leyîstiyê. Behlûl bi vî awayî nefsa xwe piçûk kiriye û xwe ji kubriyê mihefaza kiriye; welîtiya wî jê re maye. Hedîsa şerîf dibê “Heçî xwe kubir bikî wê bişkê, heçî xwe bişkêne wê bilind bibe”. Ji ber vî awayî Xoce<sup>9</sup> xwe şikênandiye, xwe kiriye hevalê zarûkan.

**Vebêjer: M. Şakir Demir**

### 17. Kor çawa bi rê ve diçin?

Harûn Reşîd zengîn bû, birayê wî Behlûl jî feqîr bû. Xelkê go “Harûn Reşîd ewqasî zengîn e; çima tişteki nade birayê xwe”? Harûn Reşîd go “Heyran ez çî jî bidimê jî qebûl nake, pera nabîne”. Rojekê Harûn Reşîd kîsikek tije zêr kir û bir danî ser riya ku Behlûl tê re derbas dibe.

---

<sup>9</sup> Yekem car navê Behlûl wek “Xoce” derkete pêşîya me. Dema ku em li pêkenokên Behlûl digeriyam zilamekî ji me pirsî bû: “Gelo ev Xoceyê meşûr û Behlûl eynî kes e”? M. Şakir Demir, di hemû vegotinan de ji Behlûl re digot: “Xoce”

Gava ku Behlûl hate hinda kîsikê zêra, [ji xwe re] go “Yaw ew însanên kor çawa bi rê ve diçin” ? Behlûl çavê xwe girt û bi rê ve çû. Kîsikê zêran nedît.

**Vebêjer: Habip Sevim**

### **18. Ez disekinim jî hesp nasekine**

Rojekî Behlûl tevî zaroka, her yekî darek dane nav piyên xwe, li darê xwe siwar bûne di sikakan de dibezin. Tê di ba Harûn Reşîd re derbas dibin. Behlûl dibê “Es selamûn aleykûm” û derbas dibe. Harûn Reşîd, dibê “Bisekine, bisekine”. Behlûl dibê “Ez disekinim jî hesp nasekine weyy”.

**Vebêjer: A. Samet Basutçu**

### **19. Ku ji dengê dinyayê re be, ez nayê**

Harûn Reşîd piştî ku ji nexweşiyê mezîn xelas dibe, gazî dîwane xwe dike. Ji dîwana xwe dixwaze ku qurbankê serjêkin û xwarineke mezîn bidin xelkê. Ji bo xwarinê batikine Balûl jî. Balûl dibê: “Ku ji dengê dinyayê re be, ez nayê. Lê ku sirf [tenê] ji bo Xwedê be ez ê werim”. Bahlûl dibê “Bere însan nexweşê xwe bi sedeqa tedawî bikin”<sup>10</sup>.

**Vebêjer: Nezir Kılınc**

### **20. Win di camiyê de nasekinin**

Carkê Harûn Reşîd li camiyê li pêşiya cemaetê limêj dike. Behlûl jî tê tabîê cemaetê dibe û limêj dike. Lêbelê li piştî wî poşetek meyve [fêkî] heye. Gava ku diçine rukû [yê], poşetê Behlûl dikeve û meyvê wî<sup>11</sup> tevde li camiyê belav dibin. Behlûl, diçe meyvê xwe dide hev û limêja xwe dewam dike. Heta paşiya limêjê sê çar caran fêkiyên wî belav dibin, diçe wan dide hev û limêja xwe dewam dike. Heta wilo limêja xwe xelas dikin, cemaet tev aciz dibe. Harûn Reşîd jî li pêşiya wan e, ew jî zahf aciz dibe. Zilamên

---

<sup>10</sup> Li gorî ku Ahmet Canan Karakaş vediguhêze ev jî yek ji hedîsên pêxember e. Lewra Pêxember gotiye “Nexweşên xwe bi sedeqê tedawî bikin” (bnr. Karakaş, 2013: 143).

<sup>11</sup> Li gorî varyanteke din “petêx û şebeşên wî”



ji cemaetê zahf pê de dixeyidin: “Ev çi ye, ev çi hal e! Ma xelk wilo limêj dike”? Behlûl dibê “Min çi kiriye? Min tiştê nekiriye, ez ji nava camiyê derneketime. Ê we win tev; mîsal filankes tu diçî li çarşiyê digêrî, fêkiyê xwe difroşî, filankes tu diçî kerê xwe ji çolê tînî. Win di camiyê de nesekinîne, ez dey[deng] nakim; lê ê xwe ez di nava camiyê de ez diçim û tîm win ji min re dey dikin<sup>12</sup>.

**Vebêjer: Abdurrezak Çelîk**

### **21. Haya wan ji limêjê tune bû**

Rojeke remezanê Harûn Reşîd dibêje Behlûl “Limêja muxrebê here camiyê kî hatibe nimêjê wan bîne, ez ê xwarina fitarê bidime wan”. Behlûl jî diçe, piştî limêjê tevî deh heb însan tê. Harûn Reşîd, şaş dimîne, dibê:

- Behlûl, me evqas xwarin hazir kiriye, tu çûye ev însanên ha tenê anîne?
- Heyran ez piştî limêjê li devê camiyê sekinîm. Kî derket min go “Ma mela kîjan sûret xwend?” evan her dehan tenê pê derxist. Ên ku hatibûne limêjê ev bûn. Ewên dî herê hatibûne camiyê lê haya wan ji limêjê tune bû.

**Vebêjer: Adnan Aslan**

### **22. Te jî nimêj nekiriye**

Behlûl rojekê li mizgeftê rûniştiye. Hemû kes nimêj dike, ew nimêj nake. Selama xwe didin, yek xwe li Behlûl dienirîne, dibêje:

- Te çima nimêj nekir, tu fihêt nakî?
- Na, te jî nimêj nekiriye.
- Çawa min nimêj nekiriye?
- Na welleh te nimêj nekiriye.

Dibe xirexira wan, mela dibê:

- Xêr e, çi dibe?

---

<sup>12</sup> Li gorî varyanteke din (Veysi Başaran) cemaet dibê “Behlûl, heta limêj xelas bû di nava camiyê de cih nema ku tu lê negeriya” Behlûl jî ji wan re dibê “Qe nebe ez li nava camiyê digeriya. Ê we heta go limêj xelas dibe hiş û aqilê we li temamê dinyayê digere”.

- Behlûl nimêj nekir, ji min re dibê te jî nimêj nekiriye.

Mela go:

- Behlûl xêr e, çawa çêbûye?
- Welleh min li vê derê nimêja xwe xwar [nimêj nekir]. Camêrê ha jî hêstira xwe firot, dibêje “Min nimêj kiriye”. Mela ji zilam pirsî:
- Te çawa nimêj kir?
- Wellleh min normal nimêj kir, lê heşê min li ser hêstira min a li xirbê Behlûl bû. Min digot “Ez bifroşim, ez bi perê wê ticaretê bikim, ez ê zengîn bibim”. Heşê min li ser wê qasê bû. Mela dibê: “Weleh nexwe Behlûl heqlî ye, ser nimêjê de heta ji mirov bê gerek heşê mirov ser nimêjê be”. Ew jî nîşana welîbûna Behlûl e.

**Vebêjer: Reşat Bayat**

### **23. Piştî ku ji bo Xwedê be**

Li gundekî camiyekê çêdikin. Behlûl di ber wan re derbas dibe û dipirse:

- Qewet bê ji we re, win çi dikin?
- Em camiyê çêdikin.
- Win camiyê ji bo çi/kê çêdikin?
- Ji bo Xwedê çêdikin.

Çêkirina camiyê dewam dikin. Her roj gava Behlûl di ber wan re derbas dibe, dibê:

- Qewet bê ji we re, win çi dikin?
- Em camiyê çêdikin.
- Win camiyê ji bo çi/kê çêdikin?
- Ji bo Xwedê çêdikin.

Çêkirina camiyê xelas dibe, tenê navlêkirin maye. Behlûl, êvarê diçe navê xwe li ser camiyê dinvîse: Camiya Behlûl.

Şeveqê gava ku gundî radibin dinêrin ku li ser camiyê “Camiya Behlûl” hatiye nivîsandin. Li Behlûl digerin, wî tînin, jê re dibêjin:

- Behlûl, ev çi kar e, çima te navê xwe li ser camiyê nivîsandiye?
- We ev camî ji bo kê çêkiribû?

- Ji bo Xwedê.
- Piştî go we ji bo Xwedê çêkir, ha navê wê bû camiya Behlûl ha bû navekî din çi ferq dike?

**Vebêjer: Seyfettin Ağırman**

#### **24. Xweda jixwe çawîş e**

Rojekê Behlûl, ji Harûn Reşîd re go:

- Ev çi ye tu evqas zabitayan digrî, vî malî evqas serf dikî. Bidî feqîr û fiqaran.
- Kuro ku ne welî [wisa] be karên bajêr nameşin.
- Ka ez herim li sûkê binêrim.

Behlûl çû ji yekî dewlemend pirsî:

- Tu vî malî çawa dikirî, difroşî?
- Ez vî malî bi deh qurîşan dikirim, bi deh û nîvê difroşim.

Behlûl çû vê carê ji yekî feqîr pirsî:

- Tu vî malî çawa dikirî, difroşî?
- Ez vî malî bi deh qurîşan dikirim, bi duwazdeh qurîşan difroşim.

Behlûl go “Ne hewceyî çawîş û zabita ye, Xweda jixwe çawîş e.

**Vebêjer: Halil Dayan**

#### **25. Ne hewceyî min e**

Rojekê Harûn Reşîd dibê “Ev Behlûl zahf me rahatsiz [acîz] dike. Divê em wazîfeyekê bidinê da ku sergêjîyek pê re çêbibe û neyê me rahatsiz neke. Harûn Reşîd bi şêwirmendên xwe re dişewire dibê “Em çi bikin?” Şêwirmendên wî dibêjin “Em ê wî bikin zabita, bila li ser esnafan bigere. Jixwe Bexda ye, zahf e; pê re nagihê”. Gazî wî dikin, jê re dibêjin:

- Behlûl were em ê wazîfeyekê bidin te ku wazîfeyeke baş û xweşik û pîroz e. Belkî tu pê herî cenetê jî.
- Ev çi wazîfe ye?
- Xizmeta xelkê ye.
- Ê ku xizmeta xelkê be ser seran ser çavan. Ez ê çi karî bikim?

- Em ê te bikin midurê zabita. Tu yê herî bi dizî [sivîl] li nav esnafan bigerî, yên ku neheqiyên dikin tê wan hişyar bikî, ceza bikî, hewce bike tu yê wî rast bikî.
- Tamam, baş e, ez qebûl dikim.

Piştî dest bi kar dike, berê xwe dide firinekê. Behlûl dibîne ku xwediyê firinê hevîre nan tim kêr dipêve. Behlûl dibê:

- Duruma te çawa ye?
- Behlûl te xêr e?
- Xêr e, ez li vir derbas dibûm. Min go ez ê silavekê bidim we. Ka duruma we çawa ye?
- Em dikin nakin îdara me nabe, em piştî xwe rast nakin.
- Ê de haydê bi xatirê we.

Diçe ba firinekê din. Dinêre ku xiram xiram bi edalet hevîre nan diwezinîne. Ew jî dibêjin:

- Behlûl, tu çi dikî?
- Ez ji xwe re digirim, min gotiye ka ez ê silavekê bidim we. Behlûl dibê:
- Tu bi Xwedê ke duruma we çawa ye?
- Bi Xwedê ne deyndar û ne maldar. (Behlûl, diçe ba yekî dî dibîne ku daîma ê xwe bi ser mişteriyên ve berdide. Behlûl jê dipirse)
- Tu bi Xwedê ke duruma we çawa ye?
- Şikar ji Xwedê re. Ewqas em didin, mesref dikin, evqas zarokan xwedî dikin... Em didin û nadin xelas nabe.

Behlûl di cih de vedigere, wê kaxiza ku ji bo wazîfeya wî hatibû mohr kirin, datîne ber Harûn Reşîd. Harûn Reşîd dibê:

- Xêr e, bira?
- Weleh yekî din vê wazîfê dike, ne hewceyî min e.

**Vebêjer: Mahfuz Nazar**

## **26. Lêborîna ji qebahetê mezintir**

Rokî Harûn Reşîd, di dîwana xwe da ji Behlûl re wiha dibêje:

– Gerek e tu suckî bikî û uzrê [lêborîna] xwe bixwazî ku ew uzir ji qebahetê meztir be.

– Baş e, ez birçî me. Ka rabe em herin mala te, xwarinkî bide min. Ez ê ji te re bêjim.

Radibe Harûn Reşîd dikişê serayê. Behlûl jî li pey wî ye, destê xwe li qûna wî dide. Harûn Reşîd, dadigere dibê:

– Te çi kir?

– Wî, ez lêborîna xwe ji te dixwazim. Min gotiye qey xanima te ye.

**Vebêjer: A. Samet Basutçu**

## **27. Di fitrata însên de zêdekirin heye**

Ji rojan rojekê Behlûl, ji Harûn Reşîd re dibê:

– Di fitreta însan de meyla zêdekirinê heye, însan dixwaze tiştan zêde bike.

– Ma mimkun yaw li ba yekî weke min mezin ev tişt çêbibe.

– Ê de baş e. Ez ê werim tişekî ji te re, di guhê te, bêjim û bere ew xeber bigere. Paşî binêre ka bi çi qasî tê bate.

Behlûl, di guhê Harûn Reşîd de dibê “Dîkê me hêkek kiriye”. Harûn Reşîd jî, ji wezîrekî re dibêje. Ew wezîr jî, ji wezîrekî din re dibê “Dîkê seraya me du hêk kirine”. Wezîr jî, ji pîreka xwe re dibê “Dîkê seraya me sê hêk kirine”. Pîrek jî ji hinekên din re dibêje; werhasil heta ku xeber digere carekedin tê serayê ba Harûn Reşîd [jimara hêkan] dibe çil. Îca Behlûl dibêje Harûn Reşîd:

– Binêre min gote te di fitrata însên de zêdekirin heye, te go na. Ka bêje heta gihîşte ba te bû çend?

– Bû çil.

– Ê binêre, di heqîqetê da dîk hêkan nake.

**Vebêjer: Salih Gültekin**

## **28. Mirov qenciye xwe dibîne, xerabiyên nabîne**

Behlûl çûye bajêr, ji sûkê çar fer lastîk kirîn. Rabûye benên wan lastîkan bi hev ve girêda. Sê heb avêtine pişt xwe, yek jî avêtiye pêşiya xwe, bi wan digre û bi rê de tê. Milet, gundî rastî wî hatin, jê re gotin:

- Behlûl, tu çima wiha dikî? Bira tu Behlûlê dîwane yî, tu dîn î?
- Çima ez dînim?
- Te sê fer lastîk avêtine pişt xwe, yek li pêşiya xwe girtiye. Qey ku tu diduyan bide paş, diduyan bide pêş û bi rê ve herf; ne dilebitin û ne hewce dikî tu bi wan bigrî.
- Na na ez ne dînim, hun dînin. Ev yê pêşiyê min qencî û başiyê min e, min pê girtiye. Ewê pey min xerabiyê min in, sê hebin zêde ne, ji xwe ez wan nabînim.

**Vebêjer: Şerif Hamarat**

### **29. Mirov uzrê xelkê dibîne, yê xwe nabîne**

Gelek însan hene uzrê xwe nabînin, uzrê hevalê xwe dibîne. Vêca Behlûl kir nekir ev yek [çawa mirov uzrê xelkê dibîne, yê xwe nabîne] nekete serê xelkê. Rabû Behlûl, zebeşekî mezin bi benê aşûjin girêda, avête şûn [pişt] xwe. Zebeşeke hinarik (piçûk) jî avête ber xwe û bi sûkê de çû. Yê ku Behlûl bi wî halî dît go:

- Xêr e Behlûl, tu dîn î, ev çi ye?
- Babo welleh win dîn in, ez ne dîn im. Ev uzrê min e, şûn min e; evqa mezin e, ez nabînim. Evên piçûk jî uzrên xelkê ne ez dibînim<sup>13</sup>.

**Vebêjer: Halil Dayan**

### **30. Elhemdulillehî rebbîl muslîmîn (I)**

Harûn Reşîd hakimê memleketê îslamê bû. Rabû îsqaqê misilmanan da wan, lê yê kafira neda wan. Rabû çaxê limêjê, Behlûl jî li pey, Harûn Reşîd dest bi limêjê kir: Bîsmîlahîrehmanîrrehîm el hemdûlîllahî rebbîl alemîn... Behlûl go: Çip<sup>14</sup>

Careke din go: Bîsmîlahîrehmanîrrehîm el hemdûlîllahî rebbîl alemîn... Behlûl dîsa go: Çip. Harûn Reşîd, ji xwe re, go “Sibhanallah ez rast dibêjim, çima Behlûl dibê çip” ? Rabû [limêj betal kir û] go:

---

<sup>13</sup> Halil Dayan, di dawîya pêkenokê de bi wateya şîrovekirina çîrokê wiha digot: Mirov gîsinê di çavê xwe de nabîne, şûjina di çavê hevalê xwe de dibîne.

<sup>14</sup> Yanê te çewt xwend, te şaş kir. Li gorî Halil Dayan, bi heman wateyê Behlûl gotiye “Sibhanallah”

- Behlûl, çima tu dibê çip? Eva rast dibêjim.
- Na nebêje rebbîl alemîn. Bibê rebbîl musulmîn.
- Estaxfurullah, rebbîl alemîn, rebbê hemû mexluqa ye. Rebbê temamê însanan e.
- Madem wisa ye, çima tu îsqaqê misilmanan didê wan û yê xeyrîmisliman nadî wan? Qey rebbê misilmana tenê ye. Madem rebbîl alemîn e çima tu îsqaqê [heqê] wan jî nadî wan?

**Vebêjer: Şerif Hamarat**

### **31. Elhemdulillehî rebbîl musulmîn (II)**

Rojekê Behlûl rasta yekî ermenî hat. [Jê pirsî]:

- Te xêr e, çima tu welê feqîr e?
- Vêrguya (bac) mi gelek e, Harun Reşîd baca min zêde kiriye; ez nikarim bidim.
- Çira?
- Çira ku ez ermenî me, ne misilman im.

Rabû Behlûl çû. Dema nimêjê cibe li xwe kir, bû îmam. Behlûl (Harûn Reşîd jî li pey wî) dest bi nimêjê kir: “Bîsmîlahîrehmanîrrehîm el hemdulillahî rebbîl muslimîn...”

Harûn Reşîd go: “Sibhanallah”<sup>15</sup>. Behlûl, dîsa sûretê fatîhê ji serî ve xwend: “Bîsmîlahîrehmanîrrehîm el hemdulillahî rsebbîl muslimîn...”. Harûn Reşîd dîsa go: “Sibhanallah”. Werhasil nimêja xwe betal kirin. Behlûl go: “Ê malmîrat, ma Xweda gotiyê ez rebbê misilmanan im an gotiyê ez rebbê aleman im”? Rabû vêrguya ê ermeni sivik kir.

**Vebêjer: Halil Dayan**

### **32. Elhemdulillahî rebbîl musulmîn (III)**

Cihû elimî bûn, qeymaxê gamêşan dixwarin. Misilman jî, malûm e weke cihûyan pereyê wan tune bû, nikaribûn wilo qeymax bixwin. Rabû misilmanan ji Harûn Reşîd re go “Ooyy zikê me reş bû bi vê rojiyê vê remezanê. Em ji nêza mirin û ew [cihû] qeymax dixwin”. Harûn Reşîd go “Ez ê ji we re tiştêkî [bi] kim”. Rabû Harûn Reşîd go “Hey heyy xwarina qeymax ji îro pê ve heram me, qîma min naye. Yê ku qeymax

---

<sup>15</sup> Yanî te çewt (nerast) xwend.

bixwin, ez ê wan ji serî kim”. Feqîran mane wilo, lê elimî ne, hedena wan nayê. Îdara wan nebû, rabûn go “Em çi bikin, çi nekin? Bi Xwedê ka em ê biçin bal Behlûl. Bila îlacekê [çareyekê] ji me re bike, hekena em ê ji nêza bimirin”. Cihû, çûne cem Behlûl, û hal û mesela xwe jê re gotin. Behlûl, go “Ka heta roja îne xwe bigrin, heke ez karibim ez ê çarekê ji were kim”. Behlûl rabû çû cem Harûn Reşîd go:

- Meyzênî vê neqlê roja îne ez ê xutbê bixwînim ku musadeya te hebe.
- Yaw de ka Behlûlo dîno tu yê xelet [bi] kî.
- Ê yaw heke min xelet kir, min serî ke.
- Ê ne ez zanim tu yê xelet bikî. Bi Xwedê tu yê tiştan tewlî bike.
- Na na ku min xelet kir, min serî ke. Va ye qirika min li te re helal.
- Ê de bila be.

Ku roja xutbê her kesekî çavê wan li Behlûl e, Behlûl derkete ser mamberê û dengê xwe berda: Bismîllahîrrahmanerrahîm elhemdulîllahî rebbîl muslîmîn...

Harûn Reşîd go:

- Aha va ye, min negotibû tu yê xelet [bi] kî!
- Min xelet nekiriye.
- Ne va ye telet xelet kir.
- Te gotiye “elhemdulîllahî rebbîl muslîmîn” ma min gotiye?
- Çawa min gotiye?
- Te ne gotiye bila cihû qeymax nexwin? Te gotiye bila cihû qeymax nexwin û misilman bixwin. Ma Xweda ê misilmanan tenê ye.

Îcar Harûn Reşîd nûka rabû teslîm bû, go “Welleh rast e”.

**Vebêjer: Emin Demir**

### **33. Xwedayê Teâlâ bi çi meşxul e?**

Harûn Reşîd gazî kir: “Hey hoo... Ez ê tişteki bipirsim. Kî tê derxe ez ê wî têt zêr bikim û heke tê dernexe ez ê serê wî jêkim”.

Rabû ji bo bersivandina pirsê Behlûl çû. Harûn Reşîd go:

- Behlûl tu hatî? Malmîrat ez tişteki bipirsim û tu nizanibî, ez ê serê te jêkim.



- Ma ku nizanibim serê min jêke. Ku bizanim jixwe tu yê çend zêran bidî min. Ez ê jî bidim feqîran.
- Baş e, ez ê jî pipirsim: Xwedayê Taela bi çi meşxul e?
- Ji xêra xwe ka tu rabe û cilên xwe ji xwe bike.

Harûn Reşîd, ji ser textê xwe rabû, cilên xwe ji xwe kirin. Behlûl, cilên Harûn Reşîd li xwe dike û diçe li ser textê wî rûdinê. Behlûl dibê “Harûn Reşîd, here ji min re qehwê bîne; avê bîne”. Harûn Reşîd jê re av û qehwê tîne û dibê:

- De îca ka bêje, Xwedayê Taela bi çi meşxul e?
- Xwedayê Teala, bi dan û sitendinê meşxul e. Binêre heta vêga tu li ser text bû, qatê cilan li te bû. Vêga îca ez bûme paşa[padîşah], tu bûye xizmetkar ji min re. Binêre Xwedayê Teala ji te sitend, da min. Dêmekî Xwedayê Teala, bi dan û sitendinê meşxul e.

**Vebêjer: Şerif Hamarat**

#### **34. Ciyê çar kesan li ser text tune ye**

Pîreka Behlûl rehmî dîke. Dostekî wî keça xwe dide Behlûl. Keçik jinebî ye lê li gorî Behlûl ciwan e. Vêca êvarê ku ew û pîreka xwe dikevina nav ciyên xwe de, Behlûl dixwaze ku wê ferqa navbera extiyariya xwe û cîwaniya we telafî bike, xwe pê bide razîkirin. Îcar dibê “Jina min a rehmî ewqas baş bû, ewqas qenc bû...”. Ewqas wesfên wê dibêje dibêje qena ev jî jê re baş be. Ew ê xwe xelas dike, jinik jî behsa wasfên mêrê xwe yê berê dike. Dibê “Mêrekî baş bû, simbêlsor bû, wiha bû, wiha bû...”. Axir rojek dudo sisê çiqas ew bi başî behsa pîreka xwe ya rehmî dîke, jinik jî behsa mêrê xwe yê berê dike. Vêca Behlûl adiz dibe, pihînekê lê dide wê di text wer dike. Gava ku jinik ji ser text dikeve milê wê dişkê. Eynî wê demê jî xezûrê wî tê ziyaretiya wan. Lê dinêre ku milê keça wî şikestiye, bi situwê wê ve daleqandîye. Dibê:

- Lavo ev çi bûye ji te, çima destê te şikestiye?
- Ji vî zavayê xwe yê pîr bipirse ku te ez xistim bela vîne pîr! Vî li min daye, milê min şikandiye.
- Bavê keçikê ji Behlûl re dibê:
- Behlûl, Xwedê ji te razî. Ne min qencî bi te kir, ev keçik da te ji bona xizmeta te bike. Min keça xwe kire qurban ji te re. Îcar tu yê rabî milê wê bişkînî!

- Ê heyra ne min milê wê şikandiye.
- Ê naxwe kê şikandiye?
- Ka were ez ê ji te re bêjim. Vêga tu zanî ku textê me ku em li ser radizên ê derwêşan e, ne yê paşayan e ku fireh be ciyê me çar heba li ser hebe. Encex ciyê du heba li ser heye. Gava em bûne çar heb ciyê keça te li ser text nema û tera bû kete erdê, milê wê şikest.
- Kuro çar hebên çi?
- Ê mêrê we yê berê û jina min a berê, em bûne çar heb. Ku em bûne çar heb, ciyê me her çaran tê de tûne bû; tera bû kete xwarê.

**Vebêjer: Muhittin Demirtaş**

### **35. Ku tu yeke qîz bînî, weke te ye**

Behlûlê dîwane daîm bi zarokan re ji xwe re dileyîst. Bi zarokan re dileyîst da ku Xwedayê Teale heşra wî bi zarokan re bike<sup>16</sup>. Behlûl jî weke zarokan şivê xwe<sup>17</sup> çêdike, weke hesp xwehr dike, lê swar tê û diçe li nav zarokan digere. Zilamek tê pêşiya Behlûl, jê re dibê:

- Behlûl!
- Haa.
- Welleh dilê min heye ez bizewicim. Ez çawa bikim, kê bînim, kê neynim?
- Ku tu [yeke] qîz bînî, weke te ye; ku tu [yeke] jinebî bînî, weke wê ye; ku tu [yeke] jinberdayî bînî, ji ber hespê min rabe, ez ê te perçêxim.
- Behlûl dîsa hespê xwe xwehr dike û dikeve pey zarokan. Zilam ji xwe re dibê “Sibhanallah min pirsî, tiştêk ji min re negot”. Radibe karê xwe dike dadigere dîsa diçe pêşiyê wî. Jê re dibê:
- Behlûl, Xwedê û pêxember ji te razî be. Min ji te tiştik pirsî, min got ez kê bînim, kê neynim? Te cewaba min neda, ji min re negot.

---

<sup>16</sup> Ev şîrove, di heman demê de bersivê e ji bo pirsê “Behlûl çima xwe li dînîtiyê daniye?”

<sup>17</sup> Li devera Hezoyê (Batman) qertafa ravekê (a, ê) ji bo peyvên mê jî “ê” tê bikaranîn: Şivê xwe

- Min ji te re gotiye, tu ehmeq î. Min ji te re go, ku tu [yeke] qîz bînî weke te ye. Tu çawa wê hîn bikî, terbiyê bidîyê wê li ser wê terbiyê dewam bike. Ku tu [yeke] jinebî bînî, jixwe weke wê ye. Li bal mêrê xwe yê berê çawa be, wê li ba te jî wisa hareket bike. Ku tu [yeke] berdayî bînî, jixwe rabe ji ber piyê min; ez ê te perçêxim. Ewê ku bi mêrê berê nesekiniye, bi te jî nasekine.

**Vebêjer: Şerif Hamarat**

### **36. Weke xwe bikim, weke Xwedê bikim?**

Harûnê Reşîd xewneke nexweş dibîne. Li ser vê xewnê ji tabîrçiyar [şîroveker] dipirse. Dibê “ka ez çi bikim”? Tabîrçî jê re dibêjin: “Divê tu ji xezînê malekî pir belav bikî ji ber ku bikeve ber vê belayê”. Ew jî li hev rûdinên, dibên bila kî belav bike? Paşî dibên bila Behlûl belav bike, yê herî saxlem [durist] ew e. Ji xwe re jî nahêle û wê adîl be jî. Ji wî awayî gazî Behlûl dikin. Behlûl tê dibê:

- Temam ez ê [vî malî] bela bikim lê ez weke xwe bikim, weke Xwedê bikim?
- (Ew jî li hev dinêrin, dibên) Weke Xwedê bike.

Behlûl jî radijê pereyan û diçe li zengînên wê demê belav dike. Ên feqîr jî pê dihisin û tîn bal Harûn Reşîd, dibên “Ka te pere bela dikir?”. Gazî Behlûl dikin dibên:

- Ka te çi kir ji wan pera?
- Welleh min bela kir.
- Te çawa belav kir, va ye te nedaye feqîra?
- Ê min ji we re go “ez weke xwe bikim, weke Xwedê bikim”, we go “Weke Xwedê bike”. Xwedê jî dabû wan, min jî da wan.

**Vebêjer: Cüneyt Boğadır**

### **37. Xwedê jî wilo kiriye**

Rojekê çend zilam, hinek nan tînin, ji Behlûl re dibêjin: “Ka vî nanî li me bahr veke”. Behlûl, jî radibe yê hinekan gezekê dide wan, ê hinekan perçekî dide wan, ê hinekan nanekî dide wan. Yek ji wan dibê: “Te çima wilo kir [te em tev weke hev nekirin]”? Behlûl dibê:

“ Ê heyran Xwedê jî wilo kiriye”.

**Vebêjer: Habip Sevim**

### 38. Welleh ez li ser te digirîm

Rojekê serê sibê Bahlûl diçe adliyê. Li ber derî polîs nahêlin ku Bahlûl here hundirê adliyê. Axir bi awayekî dikeve hundirê adliyê û diçe di kursiyê Harûn Reşîd de rûdine. Polîs pê dihisin, dinêrin ku di kursiyê Harûn Reşîd de rûniştiye. Wî didine ber şeqaman û davêjin derve. Bahlûl jî di kêleka derî de disekine û digirî heta ku Harûn Reşîd tê. Gava ku Harûn Reşîd tê, jê dipirse:

- Bahlûl te xêr e, çima tu digirî?
- Welleh ez li ser te digirîm.
- Çawa tu li ser min digirî?
- Ez pênc deqeyan di kursiyê te rûniştim, min çar pênc şeqam xwarin. Ê te ev çiqas zeman e tu tê de rûdinê, îcar wê Xweda çiqas ceza bide te ez nizanîm.

**Vebêjer: Hasan Koyun**

### 39. Sê komikên xweliyê

Xoce [Behlûl] diçe li ser riya alemê sê heb komikên axê (xwelî) çêdike. Yek tê dibê:

- Xoce Xwedê ji te razî tu çi dikî?
- Ez li ber komikên axê me, ez van difroşim.
- Allah Allah, tu vê xweliyê difroşî!
- Pekî [baş e]. Tu bi çiqasî difroşî, fiyeta van çi yê?
- Fiyeta viya bi zêrekî ye, ya viya bi mecîdiyekî ye, viya jî belaş e.
- Allah Allah! Xoce manaya wê çi ye?
- Manaya vê ev e: Ka guhê xwe bide ser, tu wê fahm bikî.

Zilam guhê xwe dide ser komika bi zêrekî, seh dike ku xwelî zikrê Xweda dike: Allah Allah, la îlahe îllallah, Muhammed resulullah... Guhê xwe dide ser ya bi mecîdiyekî, seh dike ku ew jî vaaz û şîretan dikî. Guhê xwe dide ser ya sisiyan ku belaş dida, seh dike ku fisq û fesadiyê dike.

**Vebêjer: M. Şakir Demir**

#### 40. Sedeq Behlûl (I)

Rojekê dîsa dar dixê nav lingên xwe û li ser benderan digere û dibê “Hooo ma hûn dizanin, dinya weke hêkekê ye; kes nikare ne wê mezin bike, ne wê piçûk bike ji Xwedayê Teala pê ve”. Harûn Reşîd jî di şaneşînê de ye, lê temaşe dike. Dibê “Sedeq ji te re Behlûl sedeq”. Yanî henekên xwe pê dike. Yek, didu, sisê... Rojekê Harûn Reşîd û xulamê xwe derin ber avê. Harûn Reşîd xwe davêje çem. Gava serê xwe derdixê, dinêre ku bûye pîrek [jin]. Werhasil şivanek wê dibîne, tê wê dibe mal û pê re dizewice. Sê zarokên wan çêdibin. Rojekê dîsa tê ber avê. Ji xwe re dibê “Ka ez dîsa xwe bavêjim avê, belkî dîsa vegerim halê xwe yê berê”. Werhasil xwe davêje avê, serê xwe ji avê derdixê, dinêre ku Harûn Reşîd e û xulamê wî jî, hê merheme di destê wî de ye. Harûn Reşîd dibê: “Ez ji kengî ve di avê de me”? Xulam dibê: “Welleh qey deh saniye çêbûye, çênebûye”. Ji xwe re dibê “Hee bi Xwedê dêmekî ev pê nizane ku tiştêkî wilo hatiye serê min. Harûn Reşîd, ew tiştê ku hatiye serê wî ji kesî re nabêje.

Werhasil rojekê dîsa Behlûl dar dixê nav lingên xwe û di ber Harûn Reşîd re derbas dibe û dibê: “Hooo ma hûn dizanin, dinya weke hêkekê ye; kes nikare ne wê mezin bike, ne wê piçûk bike ji Xwedayê Teala pê ve”. Harûn Reşîd jî dibê: “Sedeq ji te re Behlûl sedeq”. Behlûl dibê: “Erê, sedeq! Heta te neanîn sê hebên weke deq, te nego sedeq”.

Wêca Harûn Reşîd dibê “Welleh dêmekî Behlûl ne yekî dîn e”.

**Vebêjer: İlhan Acun**

#### 41. Sedeq Behlûl (II)

Behlûl rojekê bi rê de, di ber Harûn Reşîd de, diçe. Behlûl dibê “Ya rebbî! Tu çiqas mezin î. Ya rebbî tu dikarî vê dinyayê hemiyê wisa zirav bikî, di qula derziyê re derbas bikî”.

Harûn Reşîd dibê: “Oho Behlûl dîsa berda vira [derewan]”<sup>18</sup>. Behlûl seh dike, di dilê xwe de dibê “Tu yê bibînî”! Rojekê sibehê av ji Harûn Reşîd re lazim dibe (divê serê xwe bişo). Bi xulamê xwe re diçe ser quleteynê. Xulamê wî kirasê wî girtiye, wî jî

---

<sup>18</sup> Di vir de vebêjer digot: “Heşayî jê”

xwe noqutî hewz kiriye. Hew dîtiye li bajarekî derketiye, li serê koşeyekî bûye qîz. Yekî ji wan erebên reş hatiye wî [Harûnê Reşîd] biriye, mehr kiriye. Sê salan li bal maye, sê heb zarokên wê çebûne. Rojekê çûye ber avê serê zarokên xwe şuştîye; paşî xwe li avê daye, xwe bilind kiriye dîtiye ku wa ye xulamê wî ser re sekiniye. Xulam kirasê wî lê dike. Harûn Reşîd dibê:

- Yaw qey ez zahf di binê vê avê de mam?
- Na welleh padîşahê min. Te çawa xwe noqutî kiriye ewa ye tu derketî.

Harûn Reşîd dimîne heyirî, Bahlûl dikeve bîra wî ku digo “Xweda dikare di saniyekê de dinyayê zirav bike û di qula derziyê de derbas bike û dîsa dinyayê ava bike”. Rojekê Behlûl dîsa di ber Harûn Reşîd re diçe dibe, dibê “Ya rebbî! Tu çiqas rebbekî mezin î. Tu saniyê dikî meh, deqê dikî sal, salê dikî saniye”. [Li ser van gotinan Harûn Reşîd] dibê:

- Sedeq Behlûl sedeq.
- Heta te nedît li pey xwe, gunikên reş kire reqereq, te negot sedeq<sup>19</sup>.

**Vebêjer: M. Şakir Demir**

#### **42. Tu zanî ku ez mirime, tu tê kerê min dixwî**

Behlûl kerê xwe bar dike, dasa xwe dibe û diçe. Di nêviyê erd de darek heye, Behlûl diçe serê darê. Radije dasê, şaxika bin xwe dibire. [Yekî cotyar jî li wê derê ye, cot dike]. Cotyar dibe: “Ya Behlûl, tu şaxika bin xwe dibire; tu yê bikeve”. Behlûl, guh nade zilamê cotkar û gava ku şaxik tê birîn dikeve erdê. Radibe, diçe ba cotyar û dibê:

- Madem te tê derxist ez ê bikevim, tu bi wextê mirina min jî zanî. Ka bêje, ez ê kengî bimirim?
- Behlûl dev ji min berde, ez ji ku zanim tu yê kengî bimire.
- Çawa tu zanî ez ê bikevim, çawa tu nizanî ez ê kengî bimirim?
- Ku te da hevrazê, tu derketî serê hevrazê; tu yê bimirî û wê gur were kerê te bixwe.

---

<sup>19</sup> Dawiya vê vegotinê de vebêjer digot: “Behlûl welîyê xwedê bû”

Behlûl derdikeve serê hevrazê, xwe li erdê dirêj dike û gur tê kerê wî dixwe. Dibê: “Tu zanî ku ez mirime, tu tê kerê min dixwî”. Radibe gur, kerê wî dixwin; kurtanê kerê li milê xwe dike û tê malê. Ciran dibê:

- Ya Behlûl ev çiye?
- Jê bigere. Ez mirim. Gur hat kete ser kerê min, kerê min xwar û çû. Ez jî careke dî sax bûm.

**Vebêjer: Medine Yiğiter**

#### **43. Hema tu bibêjî**

Rojekê Balûl li kerê xwe siwar e, diçe sûkê. Av li kerê wî barkirî ye, badike: Av... Ha werin avê... Kerê wî zirezirê betal nake. Ji kerê xwe re dibê: Ê jixwe tu nahêlî, hema tu bêje.

**Vebêjer: Medine Yiğiter**

#### **44. Bixwe kurkê min**

Behlûl rokê çû dawetekê. Cilên wî peritî bûn. Selam li civatê kir, kesî selama wî veneda. Nîvsaetekê çû li binê civatê rûnişt, ma ma kesî merheba neda wî. Behlûl rabû çû ba dostekî xwe benîşekî (kurk) spehî li xwe kir û dîsa hat civatê. Êdî merheba danê, xwarin jê re anîn. Behlûl bi guhê kurkê xwe girt, xiste tirşikê: “Bixwe kurkê min, bixwe”.

[Yekî ji Behlûl re] go:

- Te xêr e?
- Bi Xwedê bila ev bixwe.

**Vebêjer: Halil Dayan**

#### **45. De îcar mala xwe xera bike (I)**

Behlûl, yek ji xwe re yek jî ji bo Xwedê du heb parêz danîn. Havîn hat, Behlûl nert ku di parêzê wî de tişteki hêjayî tune ye, lê ye ku ji bo Xwedê çandibû tije petex û şebeş e. Sala din dîsa her du erd [zewî] kirin parêz. Vê carê erdê ku havînê tije petex û şebeş bûbû ji xwe re danî, yê din jî ji Xwedê re. Havîn hat, rojekê çû nav parêzan nert ku dîsa di parêzê wî de tişteki tune lê yê Xwedê tije petex û şebeş e. Çavê xwe gerand,

dît ku şebeşekî mezin di parêzê Xwedê de ye. Rabû çû ew şebeş jêkir, li milê kir û berê xwe da malê. Di rê de baraneke gûj dest pê kir. Behlûl, ji xwe re go: “Ji ber jêkirina şebeş Xweda li min hate xezebê”. Bazda çû kete, nava camiyê û go: “De îcar ji bo şebeşekî mala xwe xera bike”.

**Vebêjer: Nihat Önür**

#### **46. De îcar mala xwe xera bike (II)**

Çiqas Behlûl diçû çolê baran lê dihat. Îce rojekê ji pîreka xwe re dibêje: “Hermet em ê herin cilên xwe bişon, feqet em ê bi dizî herin. Bi Xwedê bi mê bihise wê dîsa baranê li me bibarîne. En îyîsî [Ya baş ew e ku] em bi dizî herin”. Cilên xwe dixê bin çengê xwe hê negihîştîye ber avê, baran dest pê dike. Baranek, tawaneke aceb tê. Behlûl direve, bazdide dikeve mizgeftê. Teyrokeke wisa tê reqereq ji cam û derdorên mizgeftê tê. Behlûl dibê: “De ha ji te re, îcar mala xwe xera bike”.

**Vebêjer: M. Muhittin Demirtaş**

#### **47. De mala xwe xera bike (III)**

- Roke biharê Behlûl li ber baranê bû. Qesakî din baran bû reqereqa teyrokê. Behlûl go “Bi Xwedê ez ji ber xilas nabim, ka ez ê çim xwe li Xwedê [bi]girim, bikevim mala Xwedê de. Nexwe ez ê qufilim” û çû kete mizgeftê de. Kete qunca mizgeftê de û bû reqereqa teyrokê. Behlûl go: “Yaw bi Xwedê bela xwe ji min navekê. De mala xwe xera kê, ma xema min e”. Zilamekî reş jî xwe kiribû girêk di quncikê de, ji Behlûl re go:
- Kuro çima tu wilo dibêjê?
- Te çi jê ye?
- Malmîrat, çima tu dibêjî Xwedê wê mala xwe xera bike.
- Ma ez bêjim vêca tu ser Xwedê re tê?
- Erê, ez ser Xwedê re tîm.
- Xwedê weçekî xweşik (!) daye te, tu bi xwe ji dinya alemê qebîhtir î. Xwedê weçekî xweşik daye te, heta tu ser Xwedê re werî. Heqê te ew e.

**Vebêjer: Emin Demir**



#### 48. Çav çavan nas dike

Behlûl, tu îşan nake. Jina wî dibê: “De rabe, te ne dexil çandiye, zarû wê ji nêza bimirin. Tu raje kîsekî dexil, here çandiniya xwe bike”. Behlûl diçe tov li zevîyê direşîne û tê dibê “Welleh min zevî çand”. Jina wî dibê:

- Te çawa çand?
- Welleh li hêviya Xwedê me.

Heta dibe havîn, diçe dibîne ku dextê [genim] wî ji hemûçkan spehîtir e. Hemûçkê dexil hildikê, datîne wê derê. Dibê “ez ê biçim, ji melakî pirs kim ka malxwedê çiqas e”. Mela dibê “Zekata wî ji dehê yek e. Ji dehê yekê tu yê bidî feqîran ê din ê te ye”. Ew jî dipêve, dehan ji xwe re datîne; yekê ji malxwedê re datîne. Fet dike [dinêre] yê wî ji yê Xwedê [zekat] zêdetir e. Behlûl diçe dibêje melê:

- Ev ne hîle ye? Mi çi tişt nekiriye, mi [bes] tov lê reşand. Yek bigihe wî, neh bigihê mi, hîle li Xwedê dibe.
- Na na xem nake Behlûl. Welê ye, here mal, welê ye.

Dîsa dilê wî nasekine, diçe dibê “Welleh me hîle li Xwedê kiriye”. Radibe dexil dike nêvî nêvî. Nêvî ji xwe re, nêvî ji malxwedê re datîne wê derê. Bi derengî radibe diçe mal, ji xwe re dibê “Ez ê sibê werim bar bikim, bibim malê”. Sibehê tê fet dike yê wî tev belav bûye û yê malxwedê li wê derê [komkirî] ye. Ew jî dest davêje melhêba xwe, kevilê [sap] malxwedê belav dike û dibê “Niha bila welê be, ma ku tu yê min belav bikî ez nikarim yê te belav bikim”. Behlûl, diçe mal. Jina wî dibê:

- Ka dextê te?
- Welleh hal û mesele ev e.

Jina wî sibehê dibê “Here dextê xwe bîne”. Diçe fet dike ku yê wî jî, yê malxwedê jî gelek dayîhev e. Dibêje: Ha welê, çav çavan nas dike. Ku min yê te belav nekira te yê min kom nedikir.

**Vebêjer: Reşat Bayat**

#### **49. Hê min kerê xwe nedîtiye, tu elba xwe dişîni**

Rojekê Behlûl diçe ji xwe re dara, êzinga bicivîne. Ew diçe ji xwe darika dide hev û kerê wî winda dibe. Digere nagere kerê xwe nabîne. Radibe dibê: “Ya Rebbî ya Rebbî, eger tu kerê min şanî min bidî ez ê elbek genim sedeqe ji bo te bidim”. Wisa dibêje û li kerê xwe digere. Bi rê ve diçe, tu nabêjî heskeke kevin li wir hebûye, piyê wî dikeve ser doxa heskê û dişimite. Dişemite, hesk dibê tep li serê wî dikeve. Dibê: “Xwedayê min qurbano, hêja min kerê xwe nedîtiye; tu elba xwe ji min re dişîni”.

**Vebêjer: Muhittin Demirtaş**

#### **50. Ez ê heyfa xwe ji te hilînim**

Rojekê kerê wî [Behlûl] nexweş dikeve. Jixwe îdare wî tev li ser kerê wî bûye. Dibêje “Ya Rebbî ya Rebbî, eve pereyên min jî tunin; eger tiştêk bi kerê min newe, kerê min sax bibe li min nezir ku deh roj rojî bigirim. Ji qeweta rebbê alemê kerê wî hinekî baş dibe, ew jî dest bi rojiyê dike. Deh rojên xwe tamam dike û kerê wî dimire. Dibê: “Ê Xwedayê min, Xwedayê min! Welleh bazara min û te ne ev bû; lê ne va ye remezan nêzîk e, ez ê heyfa xwe ji te hilînim”.

**Vebêjer: Muhittin Demirtaş**

#### **51. Pisîka Behlûl**

Behlûl rabû serê sibê taştê xwar, kerê xwe kurtan kir ku here çiyê ji xwe darika bîne. Pisîka wî jî li pey çû. Ew ji xwe re li çiyê darika, êzinga dide hevudî, pisîk ji xwe li nava dahlê li qismetekî digere. Pisîk li nava dahlê digere, diçe rastî nala (meqer, cih) şêr tê. Lê dinêre ku wa ye şêrekî weke fitekî tê de ye. Pisîk dike ku bireve şêr dibê: “Di cihê xwe de bisekinî”. Pisîk disekine. Şêr ji pêş ve, paş ve, ji teniştan ve li pisîk dinêre û dibê:

- Heyra weke ku tu ji cinsê me yî, bîçima te weke ya me şeran e; lêbele tu piçûk î û em girin. Ev çi mesele ye?”
- Paşayê min, em di destê mexlûqên wisa de ne ku tu di destê wan de bûna, tu evqasî jî mezin nedibûyî. Çi wextê ku nan didin me dibê tep li serê me didin, nahêlin ku em çavê xwe vekin. Ji ber zilma wan em wiha piçûk mane.
- Ew li kur in?

- Wa ye xwediyê min li dera ha ye (îşaretê bal Behlûl ve dide).
- Bikeve pêşiya min, em herin.

Diçine balê, şêr dinêre ku Behlûl bivirê wî di destê wî de ye darikan ji xwe re diçine. Şêr qîrekê dide, dibê: Behlûl! Gava ku Behlûl dinêre, çav li şêr dikeve. Dinêre ku şêrekî weke fitekî ye, ji tirsan bivirê wî ji dest dikeve. Şêr ferq dike ku ev tirsîya. Jê re dibe:

- Netirse, ez ne hatime te bitirsînim; lêbelê ev pismamê min e. Binêre ji ber zilm û neheqîya we însana ewqas piçûk maye. Careke dî tu zilmekê, neheqiyekê li vî pismamê min bikî ez ê damarên pişta te biqetînim.
- Li ser seran ser çavan paşayê min, tu çi emir dikî wekî te. Fermana te qebûl.
- Behlûl radije bivirê xwe, dareke aza (zahf saxlem) li wir heye. Baltê [Bivirê] xwe li qurmê darê dide, dar ji hev pîj dibe û balte tê de asê dimîne. Behlûl, gazî şêr dike:
- Paşayê min ka were alî min, ne va ye baltê min di vir de maye asê. Hey ku em bûne yê hevdî, were alî min bikî da ku ez bivirê xwe derxim.
- Ka ez ê çawa derxim?
- Hema destê xwe bêxe binê bivir, wiha wiha ji min re weke, ez ê jî bivirê xwe derxim.

Şêr bi lepên xwe darê ji hev weke. Gava ku Behlûl baltê xwe derdixe dar li lepê şêr tê hevdû û lepê wî di dar de asê dimîne. Dike nake lepê wî dernakeve û Behlûl paş ve lê vedigere. Lê dide lê dide, heta ku ji lephilanînê dikeve. Heta lepê xwe derîne, çermê lepê wî tev ser diçe. Şêr direve diçe qederekî xwe dûr dike û gazî pisîk dike: “Pismam pismam! Aferî ji te re ku tu evqasî jî mezin bûyî”.

**Vebêjer: Muhittin Demirtaş**

## **52.Ez xwarziyê Xwedê me**

Rojekê zilamek tê mêvaniya Behlûl. Rebeno tiştekî wî tine ku bixwe ne jî bide mêvan. Mêvan jî dizane Behlûl yekî dîndar û alîxwedê ye, ji bo xwe pê bide hezkirin, gava Behlûl dibê:

- Tu çi kes î?
- Ez xwarziyê Xwedê me.
- Wey ser serê min, ser çavên min. De ka qasekî bisekine, ez ê bêm.

Behlûl diçe cilên xwe li xwe dike û dibêje mêvan: “Kerem ke were, em herin”. Ji mêvan jî were wê wî bibe odeyekê, xwarinekê bidê. Mêvan dibe mizgeftê. Deriyê mizgeftê vedikê û dibê:

- De kerem ke.
- Ev çi ye?
- Madem tu xwarziyê Xwedê ye, aha mala Xwedê ev der e. Here mala xalê xwe.

**Vebêjer: Muhittin Demirtaş**

### **53. Baca Mişkan**

Zelamek feqîr e, rênçberê xelkê ye. Her roj diçe perê xwe dide yekî zengîn. Dibê “Jixwe zengîn e, dewlemend e, ne hewceye pereyê min e. Ez ê perê xwe teslîmî bikim, heta çend salan ez ê kom ke [bikim]; heta ku ez çe [biçim] gundê xwe”. Her ro [di] çe perê xwe dide wî zilamî, bê ka çend salan wilo pereyê wî kom dibe. Rojekê dibe “Welleh ez ê biçim perê xwe bînim, bes e ez ê herim gundê/mala xwe”. Diçe silavê lê dike, dibê:

- Kerem ke, ka were te xêr e?
- Welleh ev çend sal e, ew pere li rex te ye. Wêca ez hatiye pereyê xwe bibim, ji min re lazim e.
- Wellehî rast e, jixwe te pere dane min. Lê welleh pereyê te hemî mişka xwar.
- Çawa mişka xwar?
- Bi Xwedê mişk ketin depoya me, perê te tev mişka xwar.
- Dad, meded... Radibe diçe dipirse, xelk dibêjin “Here bîje Behlûl, ê rêkê ji te re bibîne”. Radibe diçe, hal û meseleya xwe ji Behlûl re dibêje:
- Evqas perê min li rex felankes e û nade min. Dibê mişkan pereyê te xwariye.
- De baş e.

Behlûl diçe xwe li Harûn Reşîd dienirîne, dibê:

- Tu ne îşekî dide min, tu nabêjî ka ev zarû çi halî de ne.
- Te tu kar ji min nexwestiye. Ka bêje, tu çi karî dixwaze ez ê bidin te.
- Ka fermanekê binvîsî, baca mişkan têxî destê min. Ez ê baja mişkan bistînim.
- Were ez ê te bikim walî, ez ê te rêkim memleketekî dî. Tu yê çi ji baja mişkan bikî?

- Wellehî baca mişkan ez ê bistînim. Tu yê fermanekê derêxî, bêjî “Ev zelumê ha wê baca mişkan bistîne”.

Harûn Reşîd radibe fermanekê dinvîse, bîje ji îro pê ve karê Behlûl stendina baca mişkan e. Behlûl radije fermana xwe, pênc şeş îşçiyên digire û diçe ber dîwarê qesra wî zelumê ku pere xwariye û dibê mişkan pereyê te xwariye. Behlûl dibê “Ha va ye mişkek çû, bikolin ez ê baca xwe jê stînim”. Îşçî dikevin ber dîwarê qesrê dikolin. Zilam pê dihise derdikeve, dibê:

- Behlûl tu yê çî bikî?
- Welleh mişkek çûye vir, ez ê derêxim; baca xwe jê bistînim.
- Malnemîrat tu yê xaniyê min binî xwar.
- Bi Xwedê ez nizanim, va ye tu divê [fermana min jî] bixwînî. Baca mişkan ez distînim, mişk jî kete vir. Ka em çî [bi] kin?
- Zilam dike nake Behlûl dibê “Bi Xwedê [heta] ez baca wî mişkî nestînim, nikarim biçim”. Zelum dibê:
- Tu yê çawa bacê ji mişkan bistîni, ma perê mişka hene?
- Ew mişkê pere bixwe, divê bacê jî bide.

Ji nû ve aqlê wî li kevir dikeve, dibê: “Bila Behlûl, ez zanim derdê te çîye. Hema bela xwe ji xaniyê min veke ez ê pereyê wî zelumê bidim”. Diçe pereyê wî didê û herkeskî diçe mala xwe.

**Vebêjer: Reşat Bayat**

#### **54. Memûrê mişkan**

Rojekê bazirganek, ji waletekî hesin tîne Bexdayê ku bifroşe. Hesin dixine embarê û xwedî diçe otelekê/cîkî radizê û dimîne li heviya heqê xwe. Çavê wezîrê Harûn Reşîd lê ye ku heqê hesin nede xwedî. Bazirgan çend rojan diçe û tê lê wezîr heqê hasinê wî nadê. Wezîr dibê “Mişkan hesinê te xwariye”. Bazirgan diçe mizgeftê piştî nimêjê li bexçeyê mizgeftê bi xemgînî rûdinê. Mêrik pereyên xwe nestendine, şepirze bûye li Bexdayê. Zilamek dibîne bi xemgînî xortê bazirgan li bexçe rûniştîye, jê dipirse:

- Birazî li te xêr e, çima tu wisa xemgîn î?

- Min hesin aniye ji xwe re bifroşim. Wezîr hesinê min embar kiriye û pereyê min nade min.
- Here ba Behlûl. Şivika wî di nav piyê wî de ye li filan meydana Bexdayê di nav zarokan de ji xwe re dileyîze. Berdaxek şerbeta hingiv jê re bibe. Gava ku [di lîstikê da] bazda hate serê meydanê, şerbetê takdîmî bike. Çimkî tî bûye av jî li wê derê tine. Ku şerbet vexwar wê li halê te bipirse.

Mêrik [Bazirgan] diçe eynî wisa dike. Gava Behlûl bazdide tê serê meydanê, ji tîna kezeba wî şewitî ye, bazirgan şerbetê takdîmî wî dike. Behlûl şerbet vexwar û dîsa çû giha zarokan qasekî bazda û hat. Dît ku zilam li cihê xwe sekiniye. Behlûl go:

- Bira ka bêje derdê te çi ye?
- Min hesin aniye ji xwe re bifroşim. Wezîrê Harûn Reşîd hesinê min embar kiriye ne pereyê min dide ne jî hesine min. Dibê mişka hesinê te xwariye.
- Temam here cihê xwe be heta bi ser te ve vegerim.
- Behlûl, êvarî diçe bal Harûn Reşîd, jê re dibê:
- Tu dibînî ez ji sibê heta êvarê din av zarokên Bexdayê de me. Çira tu wezîfeyê nadi min da ku ez des ji vî îşî berdîm [jî ji vî halî xelas bibim].
- Xwezî xwezî bi rojê ku te des ji vî îşî berdana û te wezîfe bixwesta ku min wezîfe bidana te. Ka tu çi wezîfeyê dixwazî ez ê bidime te.
- Ez dixwazim tu min bikî memûrê mişkan.
- Kuro Behlûl, wezîfeyên dî zahf in. Ez ê te bikim walî.
- Na abê [keko] hema min bike memûrê mişkan. Kêfa min ji vî karî re tê.

Radibe [li ser daxwaza wî] Harûn Reşîd wesîqeyê jî dinvîse û mohr dike ku êdî Behlûl bûye memûrê mişkan. Behlûl diçe neh deh heb amele digire, bêr û balte û qazmê [bivirê] wan di destê wan de li mişkan digerin. Quleke mişkan li kur bibînin, Behlûl dibê: “Lêxin lêxin”! Heta ku diçin ber qesra wezîr. Behlûl li dora qesra wezîr dinêre, qulekê dibîne. Dibê “Amelena lêdin lêdin, bi qulê ve herin. Tevî bînin xwarê, hilweşînin”. Li teperepa ameleyan wezîr dinêre Behlûl û neh deh heb amele bi bêr û biviran binê qesra wî dikolin. Wezîr dibê:

- Xêr e Behlûl?
- Çi xêr û çi hal! Mişkek ketiye vê qesra te. Em li pey mişk digerin, em ê qesra te hilweşînin.

- Çi tşkiliya te bi miřkan heye, tu hatiye binê qesra min dikolî?
- Çawa çî tşkiliya min heye. Xelîfe ez kirime memûrê miřkan. Ez miřkekî li ku bibînîm ez ê lê dim.
- Wezîr fahm kir ku wê qesra bînî xwehr. Ji Behlûl re go:
- Te ji ku dîtîye ku miřk ketîye vir?
- Çawa min nedîtîye. Miřkekî mezin, hesinekî evqasî mezin di devê wî de bû, kete vê qulê. Ez li wî miřkî digirim.
- Kuro Behlûl, ne miřk hesin naxwin. Miřk wê çî bike ji hesin ku tu wisa dibêjî?
- Ê naxwe ka were ji min re îmze bike ku miřk hesin naxwe.

Radibe kaxizeke/wesîqeyekê pê dide mohr û îmzekirin ku miřk hesin naxwin. Wê wesîqeyê dibe dide Harûn Reşîd. Harûn Reşîd dibê:

- Behlûl ev çî ye?
- Ê birayê min tu pê nehisiyayî. Bazirganekî ji we re hesin aniye û vî wezîrê te hesinê wî xistiyê embarê. Ev ser çend rojan e, wezîrê te ne pereyên bazirgan didê ne jî hesinê wî dide. Dibê “Miřka hesinê te xwariye”. Îcar va ye min pê daye qebûlkin ku miřk hesin naxwe. Hasinê vî camêrî bidinê.

Radibe Harûn Reşîd gazî wezîr dike, dibê: “Hasinê vî camêrî bidinê”.

**Vebêjer: Muhittin Demirtaş**

## **55. Ku pere hat bila ji te re be**

Rojekê Behlûl ji xwe re diçe. Zilamek ji paş ve tê şîmaqekê li piştî sitûyê wî dide û diçe. Behlûl bi qirika wî digire, zeft dike dibê:

- Çima te li min da?
- Heyra welle min henek kiriye. Kêfa min ji te re hatiye, min ji kêfan li te da.
- Behlûl, wî digire dibe ba hakim [qazî]. Hakim dibê:
- Xêr e?
- Çî xêr û çî hal! Ez rêya xwe de dibuhirim; evîne hanekê, bi şîmaqek li min daye. Tu jî heyfa min jê hilîne.

Hakim piştî ku îfadeyên wan digire, dikene û ji zilam re dibê “Çima ku te lê daye tu yê bîst baqnotan bidî Behlûl. Here bîst baqnotan bîne were”. Di çavan de dibê here

bireve û newe. Mêrik diçe, Behlûl zêdeyî saetekê li benda pere dimîne, kes nayê. Îcar ferq dike ku qazî fêlek lê kiriye. Îcar hema ew jî li pişt qazî disekine, heta Xwedê dide, şimaqekê li pişt sitûyê hakim dide û dibê “Bi xatirê te qazî, ku pere hat bila ji te re be”.

**Vebêjer: Muhittin Demirtaş**

## **56. Bêdiliya diya xwe neke**

Rojekê Behlûl diçe li çarçiyê kerekî dikire. Hefsarê kerê xwe digire û diçe malê. Du heb diz jî dibînin kerekî delal e, pîlana dizîna kerê wî dikin. Yek ji yê din re dibê: “Jixwe wa ye serê wî di ber de ye, ez ê herim hefsar ji serê kerê derxim, têxim serê xwe û li pey herim; tu jî here kerê bibe xelas ke”. Ê dî jî dibê “Temam”. Yek diçe hefsarê kerê derdixe, dixê sitûwê xwe, li pey Behlûl diçe yê din jî kerê difitilîne dibe. Qederekî diçin digihîn nêzîkî malê, yê diz (hefsar di situyê wî de) disekine, piyê xwe dide erdê. Behlûl çiqas dikişkişîne nafîle ye. Li pişt xwe dinê re zilamekî weke fitekî hefsar di serê wî de ye, li pey sekiniye. Behlûl dibê:

- Kuro lawo ev çi ye?
- Seyda seyda, do êvarê diya min nifir li min kiriye ez bûme ker. Ez anîme sûkê te ez kirîme. Te ez hefsar kirime anîme malê, dilê diya min bi şewitiye ji min re dia kiriye va ye dîsa ez bûme însan.
- Ê binêre lawo çi hate serê te. Tobe bike ku tu careke din dilê diya xwe nehêle.
- Temam seyda tobe li ber Xwedê û pêxember careke dî ez bêdiliya diya xwe nakim.

Roja dî wî kerî tînin bazarê difroşin. Behlûl jî tê sûkê ku kerekî ji xwe re bikire, dinêre ku wa ye kerê wî yê doh wa ye dîsa difroşin. Dibê: “Aha welleh dîsa vî kerê hanê dilê diya xwe hiştiye”. Diçe di guhê kerê de dibê: “Kero! Min ji te re negotibû bêdiliya diya xwe neke, tu yê dîsa bibî ker. Ka binêre tu ketiye çi halî”.

**Vebêjer: Muhittin Demirtaş**



### 57. Wê xwarin çawa li ser kulekê çêbibe?

Rojekê zilamekî soz da yekî go “Wexta tu biçî ber vê avê, lingê xwe bikî avê de û heta sibehê menfaetê ji agirî seh nekî ez ê keça xwe bidim te<sup>20</sup>”. [Zilamê xort] Go “Bila be”. Çû lingê xwe kire avê de, ma heta sibehê. Tu nabêjî li qarşiyê wî de li çiyayekî bilind de agirî hebûye. Sibehê xort hat go:

- Min heta sibehê lingê xwe di avê de hişt. De ka îce keçikê li min mehr bike.
- Te qet menfaet ji agirî seh nekî?
- Na welle min agirî nedît, lê ez nikarim derewan bikim; çiyayekî di qarşiyê min de bû agirî lê dixwiya.
- Welleh te menfaet ji wî agirî seh kiriye, ez keça xwe nadim te.
- Rabû go “ Em ê herin bal Behlûl, bila qadîtiyê bike, hikum bide. Behlûl go:
- Li wê xêr e? Yê xort go:
- Welleh hal û mesele ev e: Ji min re go, lingê xwe bike avê de û heta sibehê menfaetê ji agirî seh nekî ez ê keça xwe bidim te. Heta sibehê lingên min di avê de man. Lê soza xwe nake. Dibê, te agirî ji dûr ve dîtiye sebra te pê hatiye, ez keça xwe nadim te.

Rabû Behlûl qoçxane danî ser kulekê û agirî kir. Zilam (Bavê keçikê) go:

- Behlûl, ka te çima hikum neda?
- Heta xwarin çênebe ez hikum nadim.
- Wê çawa xwarin li ser kulekê çêbibe?
- Ê malmîrat, madem wisa ye, çima tu keçikê nadî? Wê çawa menfaetê ji agirî li serê çiya bibînî.

**Vebêjer: Halil Dayan**

---

<sup>20</sup> Li gorî Şakir Demir, di şeveke pir serma de ku kesî li derve îdare nedikir, Harûnê Reşîd gotiye: “Kî karibe heta sibê li ber vê sermayê bisekine ez ê elbek zêr bidim vî”.

## 58. Qesra bêderî

Rex me van deran dibêjin “Behlûl, weliyê Xwedê ye. Bo vê qasê xwe li dînatî daniye, li nav zarûkan e. Wek zarûkan xwe daye pêş, lê welî ye, kes nezane”. Rojkê Harûn Reşîd û jina xwe di rêkê re dibuhirin, dinêrin Behlûl ji heriyê tiştan çêdike. Harûn Reşîd dibê:

- Behlûl, tu çi dikî li vê derê?
- Welleh ez qesrekê çêdikim.
- Kuro qesra çi. Dad meded, rabe ji nav va keviran.
- Bi Xwedê heta ez qesra xwe xelas nekim ez nayê.
- Harûn Reşîd dike nake, Behlûl ranabe. Jina Harûn Reşîd dibê:
- Behlûl tu qesra xwe nafroşî?
- Belê.
- Ka tu bi çi qasî difroşî?

Sê çar qurîş bê ka bi çi qasî didê. Behlûl dibê:

- Ê ka hê min derî lê nedaye.
- Ka bide hema bila bê derî be.

Jina Harûn Reşîd diçe malê, bi şev dinive. Tê xewna wê fet dike di cennetê de qesra wê heye û bê derî ye. Radibe ji mêrê xwe re bîje. Harûn Reşîd radibe diçe, dibê:

- Behlûl tu qesrekê ji min re naçêkî?
- Ew tişt tu zanî, ez jî zanim. Ez zanim derdê te çiyê.

(Ji ber wê qasê jê re naçêke. Ji ber ku jina Harûn Reşîd hermeteke baş e, alîxwedê ye jê re çêkiriye).

**Vebêjer: Reşat Bayat**

## 59. Şirikatiye Behlûl

Behlûl, ber zevîyê de buhurî fet dike [dinêre] ku cotyarek cot hildike, bîje:

- Cotyaro, ez şirikê te me?
- Belê, tu şirikê min î.

Heta dextlê (genim) xwe hildikê, Behlûl tê dibêje

- Ez hatiye dextlê xwe.
- Dextlê çi?
- Ma vê payîzê dibûrîn, mi nego “Ez şîrîkê te, te go belê”?

Rabûn çûne şerîatê. Şerîatê go “Piştî te gotiye erê, heqê Behlûl e”. Behlûl dextlê xwe bir û çû. Sala din dîsa di wir de bihûrî, fet kir ku cotyar cot hildike. Go:

- Cotyaro, ez şîrîkê te me?
- Erê erê, weke par. (ji enira ve gotiyê)

Heta havîn hat, Behlûl dîsa hat, go:

- Ez hatime dextlê xwe.
- Dextlê çi?
- Ma te negotî weke par?
- Welleh min ji enira gotiye.

Rabûn dîsa çûne şerîatê. Şerîatê [qadî] go:

- Par çava bû?
- Par hal û mesela vî îşî viha bû. Min dextl dayê.
- Welleh nexwe tu yê îsal jî bidiyê.
- Dextlê xwe dîsa bir û çû. Behlûl, sala din dîsa di wir de tê, dibê:
- Cotyaro, ez şîrîkê te me?
- Naaa na. Ca tu yê wekî par li min bikî ne!

**Vebêjer: Reşat Bayat**

## **60. Ez jî li wê mame heyirî**

Rojkê qey dilê Behlûl çûbû fêkî. Di ber werzekî de çû, dît ku çi xeyar tê de ne, hêşîn dikan. Behlûl ji xwe re go “Dilê min diçê lê Behlûlê Xwedê me, ez ê çawa bikevimê”. Dilê wî çûyê, çare ji xwe nekir; go: “De ka ez ê bikevimê lê ez bêmirovdiyê nakim”. Xwe avête nava bexçe de, xeyar jêkirin, têr xwar. Ji xwe re go: “Ka ez ê hinekan bibim ji zarokan re jî”. Jêkirin jêkirin heta ku dawa xwe tije kir. Xwedî bi ser de hat, go:

- Kuro Behlûlo, ev çiye?
- Bi serê bavê we, bahozek rabû; hema ez avêtim nav werz.

- Kuro çawa bahozê tu avête nav bexçe?
- Ez bi serê we kim, bahozekê li mi da ez avetim nava bexçe.
- Ê bila, bahozê tu avête nav de. Ewê di dawa te de çi ne?
- Ha ez li wê ma me heyirî jixwe.

**Vebêjer: Emin Demir**

### **61. Xwe li hêstirên kerwaniyan nekin reş**

Dibê rojekê Behlûl, gundî danehev. Ji wan re go “Ka werin ez ê tiştêkî ji we re bêjim”. Gundî hatin, Behlûl go:

- Yaw ka ez ê mirim.
- (Gundiyan go) Ka tu yê çawa mirê Behlûl?
- Yaw hûn ê min bixin bin erdê de û bimrim. Ez ê biçim wê dinyaya din, binêrim ka çi heye, çi nîn e.
- Yaw Behlûl, Xwedê jî te razî, ne va ye tu sax î, tu yê çawa bimrî?

Rabû gundiyan tîrbek kolan. Behlûl kete tîrbê; gundiyan qirşik û mirşik û qederê ku nemirê tozik avêtin ser û çûne malê. Bazirganek jî tevî kerwanekî hêstira ku ji wan tiştên go dişkên, sut taximî [taximên firexên camî, porselen] barkirî ye di wir de derbas dibe. Dengê zinge zinga feraxan hat, Behlûl tirsîya, go: “Bi Xwedê heşir e, va ye ez gihame heşrê”. Dibê wextê kerwan nêzîkî lê kir, bû reqereqa zingilan, şingêşinga firaxan. Behlûl go: “Bi Xwedê heşir e ka ez ê rabim”. Wexta ku Behlûl weke miriyekî, bi cilên xwe yê spî, di reşahiya şevê de rabû ser xwe; hêstir dîn bû, rabû ser du lingan, ewqas firexan wan li hev ketin, hemû ketin erdê, şikestin. Ewqas zahmetiya wan li boşê çû. Bazirgan go:

- Kuro ev tu yî, te çima wilo kir?
- Ne ez mirî me?
- Tu mirî yî?
- Erê, mirî me.
- Kuro tu sax î, te ev acêba han anî serê me!
- Welleh ez miri bûm.
- Madem tu miri bû ka em ê te taze mirînin.

Dirajin nahîtê dara, dikevin ser kelaşê wî de heta laşê wî reş û şîn dikin, wî ji kuştine berdidin. Behlûl radibe bi qûnxirkê xwe digihênê gundê xwe [Gundî jê dipirsin]:

- Behlûl ka li wê dinyaya din te çi dît, çi nedît?
- Bi Xwedê hema emaneta min li we bê, tiştê ku min dîtiye: Xwe li hêstirên kerwaniyan nekine reş. Min xwe li histirên kerwaniyan kire reş, va ye win dibînin ev ecêb bi serê min de hat.

**Vebêjer: Emin Demir**

## 62. Fiyeta nîrê zêr

Balûl wenda bûbû, Harûn Reşîd gelekî meraqê Balûl<sup>21</sup> dikir. Geriyan negeriyên Balûl nedîtin. Rabû rojekê Harûn Reşîd nîrekî cot çêkir û da çend heban. Ji wan re go “Viya li dinyayê bigerînin kî zanibe fiyeta vî nîrî çiqas e, wî bigrin bînin, ew Balûl e”. Yekî go:

- Baş e ya Harûn Reşîd, lê fiyeta vî nîrî çiqas e, em ê çawa zanibin tê derxist?
- Wektê ku go “Rojek û şeveka barana nîsan û gulanê ye” win zanibin ew Balûlê dîwane ye, wî bigrin bînin cem min.

Rabûn bi dinyayê ketin li Balûl geriyan, fiyeta nîrê zêr ji kê pirsîn; kesî ku tê dernexist. Çûn leqî yekî wisa bûn ku wisa ne lihevûdû ye, wisa cilên wî qetiyayî ne. Jê re gotin:

- Fiyeta vî nîrî hanê çiqas e?
- Wexta rojek û şevekê barana nîsan û gulanê lê ke fiyeta vî nîrê hanê dertê.

Rabûn [Bi destê] wî girtin anîn. Harûn Reşîd go “Min ji we re nego ko ne Balûl fiyeta vî nîrî zanibe, kes nizane”.

**Vebêjer: Nusret Doğan**

---

<sup>21</sup> Mîna Hezo (Kozluk), li devera Sasonê jî gertefa ravekê (a, ê) ku li gorî zayendê diguhere tevlihev bûye: “Meraqê Balûl”. Ev rewş bandora hebûna ereban e. Him li Hezo him jî li Sasonê ereb hene. Ji ber ku ereb, rêzik û qaîdeyên kurmancî baş nizanin vê yekê tevlihev dikin. Lê mixabin vê rewşê bandor li kurmancan jî kiriye: Hesaba xwe (bnr. Jmr. 12), Şivê xwe (bnr. Jmr. 35).

### 63. Qoçxaneyaya mirî

Rojkê Behlûl qoçxane teslîmî yekî kir. Deh roj ser de çûn, Behlûl go:

- Ka ematê min?
- Welle [qoçxane] miriye.
- Kuro, çawa miriye?
- Welle mir çû.

Werhasil qerabalix kir. Çûn ba qazîkî, Behlûl go:

- Tiştê sax dimre an tiştê mirî dimre?
- (Qazî go) Welle tiştê sax dimre.
- Ê ev bêbextiyê li min dike. Dibêjê “qoçxane miriye”.

Rabû qoçxana xwe jê stend.

**Vebêjer: Halil Dayan**

## ÖZGEÇMİŞ

Tahir Başaran 1987 yılında Batman'ın Gercüş ilçesine bağlı Bağlıca köyünde dünyaya geldi. 2010 yılında Yüzüncüyıl Üniversitesinde Türk Dili ve Edebiyatı bölümünü bitirdi. Aynı Üniversitede 2012 yılında pedagojik formasyon eğitimi aldı. 2012 yılında Mardin Artuklu Üniversitesi Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında tezsiz yüksek lisansa başladı. 2013 yılında Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim dalında tezli yüksek lisansa başladı. Aynı yıl Anadolu Ajansı Kürtçe Haber servisinde çalışmaya başladı. Anadolu Ajansında üç ay çalıştıktan sonra öğretmen olarak atandı. Halen öğretmenlik görevini yürüten Başaran'ın çeşitli dergilerde yayınlanmış şiir, öykü ve makaleleri vardır.

## KURTEJIYAN

Tahir Başaran di sala 1987'an de li gundê Midêlbê ku girêdayî Kercewsa Batmanê ye hate dinyayê. Di sala 2010'an de li Zanîngeha Yuzuncuyilê beşa "Ziman û Edebiyata Tirkî" xwend. Sala 2012'an li heman zanîngehê perwerdeya formasyona pedagojîk stend. Sala 2012'an li Zanîngeha Mêrdîn Artûklûyê di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de dest bi xwendina lîsansa bilind a bêtez kir. Sala 2013'an de li Zanîngeha Muş Alparslanê di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de dest bi xwendina lîsansa bilind a bitez kir. Heman salê li Ajansa Anadoluyê di beşa Kurdî de dest bi karê medyayê kir. Piştî sê mehan wek mamoste hate tayînkirin û ji wê demê vê karê mamostetiyê didomîne. Di kovarên cuda de gotar, kurteçîrok û helbestên wî weşiyane.